K.T.

ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ

ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ

ŞAXA ZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

TÊKILÎYA OBJE Û LÊKERÊN KURDÎYA KURMANCÎ

Dilan TAYÇUR GÜLER

Şêwirmend

Doç. Dr. Mehmet YONAT

Mardîn-2025

T.C.

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

KURMANCİ KÜRTÇESİNDE OBJE-FİİL İLİŞKİSİ

Dilan TAYÇUR GÜLER

Tez Danışmanı

Doç. Dr. Mehmet YONAT

Mardin-2025

T. C.

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

TEZ ONAYI

Enstitümüz Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı 22711001 numaralı Tezli Yüksek Lisans programı öğrencisi Dilan TAYÇUR GÜLER'in hazırladığı "Têkilîya Obje û Lêkerên Kurdiya Kurmancî" başlıklı YÜKSEK LİSANS tezi ile ilgili TEZ SAVUNMA SINAVI, Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliği uyarınca 30.07.2025 Çarşamba günü saat 15:00'da yapılmış, tezin onayına OY BİRLİĞİYLE karar verilmiştir.

Başkan

Doç. Dr. Mehmet YONAT

Üye

Dr. Öğr. Üyesi Şehmus KURT

Üye

Dr. Öğr. Üyesi İlyas SAYIM

ONAY

Bu tezin kabulü, Enstitü Yönetim Kurulu'nun.....tarih ve.....saylı kararı ile onaylanmıştır.

Doç. Dr. Ahmet KİRKAN

Enstitü Müdürü

ETİK BEYAN

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmasında;

- Tez içindeki bütün bilgileri etik davranış ve akademik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tez çalışmasının hazırlık, bilgi, belge, veri toplama, analiz ve bilgilerin sunumu olmak üzere tüm aşamalarda bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun davrandığımı,
- Tez çalışmasında kullanılan tüm eserlere eksiksiz atıf yaptığımı ve kullanılan tüm eserlere kaynaklar/kaynakçada yer verdiğimi,
- Tez çalışmasının özgün olduğunu,
- Tez çalışmasının hiçbir şekilde "intihal içermediğini" beyan eder, aksinin ortaya çıkması durumunda her türlü yasal sonucu kabullendiğimi,
- Tez çalışmasının son halinin MAÜ Kürt Dili ve Kültürü Bölümü resmi internet sitesinde paylaşılmasına izin verdiğimi bildiririm.

Dilan TAYÇUR GÜLER

2025

KURTE

Teza Lîsansa Bilind

Têkilîya Obje û Lêkerên Kurdiya Kurmancî

Dilan TAYÇUR GÜLER

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê

Şaxa Zanista Ziman û Çanda Kurdî

2025: 92 rûpel

Di xebatên sentaksî û semantîk ên nûjen da, obje tenê pozîsyoneke rêzimanî nîne, lê di heman demê da bi têkiliya xwe ya semantîk a ku bi lêkeran ra datînin, xwedî çarçoveyeke têgînî ye. Di vê çarçoveyê da cureyên objeyan, tevgera wan a sentaksî û rolên wan ên semantîk, mijara lêkolînên zimannasîyê yên mewcûd in. Herwiha piraniya lêkolînên zimannasîyê yên li ser zaravaya Kurmancî, li ser morfolojiyê sekinîne. Lêkolînên li ser sentaksê jî bi gelemperî li dora analîza teorîk a avaniyên ergatîf an ji bo rastnivîsînê hatine kirin. Ji ber vê yekê, hejmara lêkolînên li ser têgeha objeyê û têkiliya wê bi lêkeran ra pir kêm in. Ji bo dagirtina vê valahiyê, ev tez têgeha objeyê di Kurdîya Kurmancî da ji aliyên wê yên semantîk û sentaktîk ve vedikole û cureyên objeyan û têkiliya wan bi lêkeran ra analîz dike. Bi vî avayî ev xebat li dora têgehên obje, sentaks û semantîkê rûdide. Li gor vê obje di hevokê da hêmaneke bingehîn e ku ji hêla lêkerê ve bandorê dibîne û wateya lêkerê temam dike. Sentaks cihê objeyê ya di hevokê da û têkiliyên wê yên strukturel bi hêmanên din ra vedikole. Semantîk, rehenda maneyî ya têkiliya objeyê bi lêkerê ra - ango rolên tematîk ên ku ew temsîl dikin - analîz dike. Herwiha ev lêkolîn xwedî rêbazeke deskrîptîf e. Nimûne ji berhemên nivîskî yên wêjeyî hatin hilbijartin û lêkerên di van mînakan da li gorî wateyên xwe yên hundirîn û rolên tematîk ên ku ew digirin, hatin dabeşkirin. Analîz bi giranî li ser teoriya Avaniya Bûyerê hat damezrandin û têkiliya di navbera lêker û tîpên bûyeran da hat lêkolînkirin. Di encamê de, hat dîtin ku lêkerên ku di kakila xwe da transîtîv nînin komên semantîkî yên taybetî pêk tînin. Her wiha derket holê ku rolên objeyên ku ji hêla van lêkeran ve tên girtin bi gelemperî li gorî van komên semantîkî diguherin. Bi vê, ev lêkolîn arî me dike ku em sentaksa Kurdîya Kurmancî baştir fêm bikin, bi taybetî peyvrêzî, avaniya ergatîf û fonksiyonên cuda ên vî zimanî bikarin şîrove bikin.

Peyvên Sereke: Avaniya Bûyerê, Arguman, Obje, Rolên Semantîk, Têrker

ÖZET

Yüksek Lisans Tezi

Kurmanci Kürtçesinde Nesne–Fiil İlişkisi

Dilan TAYÇUR GÜLER

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Kültürü ve Dili Anabilim Dalı

2025: 92 sayfa

Modern sözdizim ve anlambilim çalışmalarında nesne yalnızca dilbilgisel bir pozisyon değil, aynı zamanda fiillerle olan anlamsal ilişkisi bağlamında kavramsal bir çerçeveye de sahiptir. Bu bağlamda, nesne türleri, sözdizimsel davranışları ve anlamsal rolleri, güncel dilbilimsel araştırmaların önemli konuları arasında yer almaktadır. Kürtçede yapılan dilbilimsel çalışmaların büyük bir bölümü morfolojiye odaklanmıştır. Sözdizimi alanındaki araştırmalar ise genellikle ergatif yapıların kuramsal analizi ya da doğru yazım kuralları çerçevesinde şekillenmektedir. Bu nedenle, nesne kavramı ve fiillerle olan ilişkisi üzerine yapılan çalışmalar oldukça sınırlıdır. Bu boşluğu doldurmak amacıyla, bu tezde Kürtçede nesnelerin yapısı, türleri ve fiillerle olan ilişkileri ele alınmaktadır. Çalışma, nesne, sözdizimi ve anlambilim kavramları etrafında ilerleyerek gelişmektedir. Buna göre, nesne; fiilden etkilenen ve cümlenin anlamını tamamlayan temel bir öğedir. Sözdizimi, nesnenin cümle içindeki yerini ve diğer öğelerle olan yapısal ilişkilerini inceler. Anlambilim ise nesnenin fiille kurduğu ilişkinin anlamsal çerçevesini, yani temsil ettiği tematik rolleri analiz eder. Bu çalışma deskriptif bir nitelik taşımaktadır. Örnekler yazılı edebî metinlerden seçilmiş ve bu örneklerdeki fiiller, içsel anlamları ve tematik rolleri alma biçimleri açısından sınıflandırılmıştır. Analizlerde özellikle Event Structure kuramı temel alınmış; fiillerin olay türleriyle ilişkisi ayrıntılı biçimde ele alınmıştır. Sonuç olarak, özünde geçişli olmayan fiillerin belirli anlam grupları oluşturduğu görülmüştür. Bu fiillerin aldığı nesnelerin rollerinin de genellikle bu anlam gruplarına göre değiştiği fark edilmiştir. Bu çalışma, Kürtçenin sözdizimini daha iyi anlamamıza katkı sunmakta; özellikle sözcük dizimi, ergatif yapı ve farklı dilsel yapıların işleyişi açısından önemli veriler ortaya koymaktadır.

Anahtar Kelimeler: Olay Yapısı, Arguman, Nesne, Semantik Roller, Tamamlayıcı

ABSTRACT

Master's Thesis

Object–Verb Relations in Kurmanji Kurdish

Dilan TAYÇUR GÜLER

Mardin Artuklu University

Institute of Living Languages in Turkey

Department of Kurdish Language and Culture

2025: 92 pages

In modern syntax and semantics, the object is not only a grammatical position but also a concept defined by its semantic relationship with the verb. In this respect, object types, their syntactic behaviors, and semantic roles are central topics in recent linguistic research. Most linguistic studies on Kurdish focus on morphology. The existing works on syntax usually deal with theoretical analyses of ergative structures or with correct writing conventions. Therefore, there are very few studies focusing on the concept of the object and its relationship with verbs. To address this gap, this thesis examines the structure and types of objects in Kurdish and how they relate to different verb types. The study is built around the concepts of object, syntax, and semantics. An object is defined as a central element that is affected by the verb and completes the meaning of the sentence. Syntax looks at the position of the object in the sentence and how it interacts structurally with other elements. Semantics, on the other hand, analyzes the object's role in the meaning of the sentence, especially the thematic roles it represents. This is a descriptive study. The examples are selected from written literary texts, and the verbs in these examples are classified based on their internal meanings and how they assign roles to their arguments. The Event Structure theory serves as the primary framework, and the analysis centers on how verbs are associated with various event types. As a result, it has been observed that even verbs that are not inherently transitive form distinct semantic classes. The roles of the objects taken by these verbs often vary depending on these meaning-based classes. This study contributes to a deeper understanding of Kurdish syntax, particularly in terms of word order, the structure of ergativity, and other distinctive grammatical constructions.

Keywords: Event Structure, Argument, Objects, Semantic Roles, Adjunct

SPASÎ

Ji hevjînê xwe Muhammed Îkbal ra spas dikim, bi saya wî min ev tez bê stres, bi kêfxweşî û aramî qedand. Herwiha ji şewirmendê xwe Doç. Dr Mehmet YONAT ra gelekî spas dikim ji bo ku wî bi çavkaniyên ku pêşnîyaz kirin, ev mijar bi min da nasîn û di hemû pêvajoyê da bi piştgirîya xwe ez her tim motîve kirim.

Dilan Tayçur Güler

Mardin-2025

NAVEROK

ETİK BEYAN iii

KURTE iv

ÖZET v

ABSTRACT vi

SPASÎ vii

NAVEROK viii

LÎSTEYA TABLOYAN x

DESTPÊK 1

1. OBJE 7

1.1. Cûreyên Objeyan 10

1.1.1. Objeya rasterast 10

1.1.2. Objeya nerasterast 16

1.1.3. Objeya oblîk 17

1.1.4. Objeya kuazî 19

1.2. Di Kurmancî da Cureyên Objeyan 20

1.2.1. Objeyên rasterast 21

1.2.2. Objeyên nerasterast 23

1.2.3. Objeyên oblîk 23

1.2.4. Objeyên kuazî 24

1.3. Rolên Semantîk 27

1.4. Ferqên di Navbera Arguman û Têrkeran (Adjunct) da 35

1.4.1. Krîtera yekem: mecbûrîbûn (obligatoriness) 39

1.4.2. Krîtera duyem: nependîtî (latency) 40

1.4.3. Krîtera sisêyan: bisînorbûna pevre xuyabûnê (co-occurrence restrictions) 41

1.4.4. Krîtera çaran: dubare bûn û bêhempa bûn (iterability and uniqueness) 42

1.4.5. Krîtera pêncan: têkiliyên gramatîk (grammatical relations) 42

1.4.6. Krîtera şeşan: sînordarbûna peyvrêzîyê (word order restrictions) 43

1.4.7. Krîtera feftan: îşaretkirina morfolojîk (morphological marking) 44

2. LÊKER 46

2.1. Lêkerên Xwerû 46

2.2. Lêkerên Kompleks 47

2.2.1. Navdêr + lêker 48

2.2.2. Rengdêr + lêker 51
2.2.3. Daçek + (navdêr) + lêker 52
2.2.4. Pêşgir + lêker 52
2.3. Teorîya Avanîya Bûyerê û Alîyê Semantîk ê Lêkeran 53
2.4. Têgeha Datîv a Givon 64
2.5. Di Kurmancî da Kombûna Semantîk a Lêkerên Ne Bingeh-Transîtîv 66
2.5.1. Objeyên daçekî yên oblîk 67
2.5.2. Objeyên Oblîk ên Pişt-Lêkerî 72
2.5.3. Pêveberên veqetandî -beşdarên bi îzafeyê 73
ENCAM 76
ÇAVKANÎ 78
PÊVEK 81
ÖZGEÇMİŞ 82

LÎSTEYA TABLOYAN

Tablo 1.1. Valensa Pêveberan 10
Tablo 1.3.1. Rolên Tematîk 33
Tablo 2.2.1.1. Transîtîvîte 49
Tablo 2.2.1.2. Pêveberên Kompleks 51
Tablo 2.3.1. Avaniya Lêkeran 55
Tablo 2.3.2. Avaniya Buyerân 61
Tablo 2.3.3. Mînak 62
Tablo 2.3.4. Lêker û Semantîka Wan 62
Tablo 2.3.1. Avaniya Lêkeran 55
Tablo 2.3.2. Avaniya Buyerân 61

DESTPÊK

Obje ew hêman e ku di hevokê da ji hêla lêkerê ve bandor dibe û bi gelemperî weku temamkera wê kar dike. Ji hêla semantîk ve li gor têkiliya xwe ya bi lêkerê, rolên weku muesîr, tema, tecrûbekar û hwd digire. Ji hêla sentaktîk va, bi lêkerên transîtîv ra weku argumaneke mecbûrî rûdide. Lê forma objeyê dikare li gorî taybetmendiyên morfolojîk û sentaktîk ên zimanan biguhere.

Ev lêkolîn, taybetmendiyên semantîk û sentaktîk ên objeyên di Kurdîya Kurmancî da bi berfirehî li ser bingeheke teorîk vedikole; nîqaş dike ka cureyên objeyên cuda li gor rolên xwe yên semantîk çawa tevdigerin û têkiliyên wan bi lêkeran ra çawa ye. Lêkolîn ji du beşên sereke pêk tê. Beşa yekem têgeha giştî ya objeyê, pênaseyên wan ên di lîteratûrê da, cudahîyên wan ên gelemper û ferqa arguman û têrkeran vedikole; ji bilî wê di Kurmancî da ew çawa tên senifandin û rolên wan ên semantîk tên nîqaşkirin.

Di beşa duyem da, cureyên lêkeran ên di Kurmancî da tên nasîn. Hin lêker herçend transîtîv nebin jî weku transîtîv tevdigerin. Li ser vê yekê analîza Haig (2002) ya li ser cudahiya transîtîvîteya ferhengî û ya sentaktîk tê nîşandan ku ew cudahî bi taybetmendiyên lêkerên Kurmancî ve girêdayî ye. Piştra di vê çarçoveyê da, nêzîkatiya Levin (1993) ya Avaniya Bûyerê (*Event Structure*) tê ravekirin. Ew ji bo famkirina objeyên Kurmancî û têkiliya wan a bi lêkeran ra xwedî roleke sereke ye, ku Gündoğduyê (2018) nîşan daye ku lêkerên daçekî yên Kurmancî di eslê xwe da Bingeh-Transîtîv nînin. Bi teoriya Levîn (1999) a Avaniya Bûyerê, lêker li gor avaniya bûyerê ya ku îfade dikin, dikarin bikevin nava çend heb koman, mîna aktîvîte (*meşîn*), pêkanîn (*kuştin*), rewş (*zanîn*) û pêkhatin (*hişyarbûn*). Herwiha ji van bi tenê lêkerên di koma pêkanînê da rasterast transîtîv in. Senifandinên wan ên di Kurmancî da hatin nîşandan û yên ku objeyan digirin; yên ku herçend objeyekê bigirin jî di eslê xwe da di koma pêkanînê da nînin, hatin nîşandan. Ji bilî vê têgaha rola semantîk a *datîv* (*Dative*) a Givón (2001) hat pênasekirin. Ew têgeh di Kurmancî da, bi taybetî ji bo obje û subjeyên lêkerên ne transîtîv firsendê dide me ku em wan bisenifînin. Herwiha lêkerên ku ne di koma pêkanînê da ne, taybetiya Bingeh-Transîtîv nîşan nadin û di şuna vê da xwedî beşdarên di rola semantîk a datîv in bi piranî; ev yek bi mînakên

Kurmancî hat nîşandan ku perçeyeke giring a vê lêkolînê ye, lêkerên hevşib objeyên xwe çawa bi heman rengî digirin bi avayekî gelemper hatin şayesandin.

Armanca Vê Xebatê

Armanca vê lêkolînê ew e ku avaniyên objeyan di zimanê Kurdî da di astên sentaktîk û semantîk da analîz bike û di çarçoveya cureyên lêkeran, rolên semantîk û têkiliya arguman-pêveberê da dabeşkirineke sîstematîk û ravekirinekê pêşkêş bike.

Strukturên objeyan di Kurmancî da ne tenê ji hêla morfolojî an sentaksê va, lê di heman demê da ji hêla rolên semantîkî ve jî diguherin. Ji ber vê yekê pirsa yekemîn a vê xebatê ew e ku bê dîtin ka kîjan cûre obje bi kîjan rola semantîk ve têkildar e, bê dîtin. Herwiha di Kurdî da, lêker ne tenê li gorî morfolojî an transîtîvîteyê, lê di heman demê da li gorî rolên semantîkî yên ku ew digirin jî dikarin komên watedar ava bikin. Komên lêkeran bi cureyên cûda yên bûyeran ra têkildar in, weku *tevger*, *têgihîştin*, *rewşên psîkolojîk* û *xwedîtî* û hwd. Lewra pirsa duyemîn jî lêkerên Kurdî li gor maneya xwe ya kakilî, komên çawa ava dikin û li gor vê ew objeyên xwe çawa hildigirin. Ji bilî vê, têgeheke ji teoriya Avaniya Bûyerê (*Event Structure*) a bi navê "tîpa bûyerê" a piştî maneyên lêkeran weku bingeh hat girtin û bi vê hat armanckirin ku rave bikin ka ev mane di avaniyên sentaktîk da çawa teşe digire. Ango, pirsa sêyemîn jî ew e ka lêkerên Kurmancî li gor avaniya bûyerê çawa tên senifandin.

Metodolojîya Xebatê

Daneyên ji bo vê lêkolînê ji berhemên nivîskî yên wêjeya Kurdî ya nûjen hatin berhevkirin. Sê heb romanên ji weşanxaneyên cuda û yên piştî 2005an hatine rastkirin an jî nivîsîn, hatin bikaranîn. Ya yekemîn ji weşanên Peywendê romana bi navê *Tofan* a Hesenê Metê ye (2013); ya duyemîn ji Nûbiharê *Sîyabend û Xecê* ya Ahmet Aras (2019) e û ya dawî ji weşanên Avestayê *Meseleya Wijdanê* ya Ahmed Muxtar Caf, ku hi hêla Ziya Avci ve ji Soranî derbasî Kurmancî bûye (2016). Dane bi tenê ji van metnên nivîskî hatin girtin; daneyên bi taybetî ji devokekê nehatin hilbijartin. Hevokên ji pirtûkan hatin girtin, lêker û objeyên cûda dihewînin. Hevok li gorî pîvanên weku valans û semantîka lêkerê, cureya objeyê (rasterast, nerasterast, oblîk) û rolên semantîk hatin hilbijartin. Her avaniya lêkerê û objeyê bi kêmanî bi çend mînakan hatin temsîlkirin. Têkiliyên lêker û objeyê hatin dabeşkirin da ku di çarçoveya teoriya

Avaniya Bûyerê da ji bo nirxandinê guncav bin. Di dema analîzê da, lêker û objeya di her hevokê de û belavbûna wan li gorî rolên wan ên semantîk hatin destnîşankirin.

Bingeha teorîk a vê lêkolînê bi giranî teoriya Avaniya Bûyerê (*Event Structure*) a Levin (1999,1993) e. Levin îdîa dike ku lêker dikarin li gorî maneya xwe ya hundirîn û li gor tîpa bûyerê ya ku lêker temsîl dikin, werin dabeşkirin û ev çîn jî di encamê da, avaniyên argumanên wan, rolên argumanên wan û paternên wan ên transîtîvîteyê diyar dikin. Nêzîkatiya Levin bingeheke raveker peyda dike, nemaze ji bo têgihîştina têkiliya di navbera cureyên objeyan û cureyên lêkeran da.

Ligel vê, di çarçoveya teoriya rolên semantîk da, rolên ku obje digirin tên analîzkirin. Li vir pênaseya Givón (2001) a ji bo van rolan weku bingeh tê bikaranîn bi taybetî jî rola *datîv* a ku aîdî termînolojîya wî ye. Ew têgeh bi teoriya Levin arî me dike ku em di Kurmancî da objeyên gelek lêkeran ên ku ne bingeh-transîtîv in, rave bikin.

Giringiya Vê Xebatê

Avaniyên objeyan ên di Kurdîya Kurmancî da û têkiliya wan bi lêkeran ra di asta teorîk da bi awayekî sîstematîk heta niha nehatine lêkolînkirin. Her çend di lîteratûrê da lêkolînên berfireh li ser pênaseya wan, li ser cudahiyên wan ên semantîk û sentaktîk hebin jî, Kurmancî ku xwedî avaniya ergatîf û lêkerên kompleks e, bi avayekî têr tevlî van nîqaşan nebûye. Di vê çarçoveyê de, destnîşankirina taybetmendiyên gelemper, fonksiyonel, semantîk û strukturel yên objeyan di zimanê Kurmanciya Kurdî da dê valahiyeke giring tijî bike.

Lîteratura Xebatê

Avaniya peyvrêziyê ya zimanê Kurdî qadeke giring e. Bi taybetî di warê çêbûna hevok û risteyan û cihê wan risteyan di nav hevokan da û d şert û mercên cihguhertinê da qîmetî lêkolînê ye. Di vê qadê da lêkolîna Mikail Bülbül (2017) li ser vê mijarê sekiniye, sazbûna avahiyên frêz û risteyên di Kurdî da ji perspektîfeke rêzimanî û taybetî peyvrêzî ve vekoliye. Nemaze, bi mînakan hatiye nîşandan ka riste çawa tên çêkirin û çawa tên modifiyekirin. Lêkolîn li ser cihguhertinên wan ên mixtemel, şert û mercên van guhertinan hûr dibe. Di destpêkê da avahiyên riste û frêzên sade rave dike, lê piştre avahiyên kompleks û pêkhatî, herwiha avahîyên bi

modalan ra vedikole. Ev xebat derheqê objeyan, bi taybetî laristeyan da nêrîneke fireh ava dike lêbelê ew bi avayekî gramatîk û strukturel tên nasîn, ji hêla semantîkê ve analîzeke kûr nahewîne.

Pêkhateyên lêkerên aloz mijareke din a giring a rêzimana Kurdî ye. Haig (2002) nîşan dide ku hin lêkerên kompleks ên Kurmancî bi eşkereyî ne-transîtîv in, lê hêmanên wan ên navdêr weku objeyên nerasterast tevdigerin. Di van avaniyan da lêkereke sivik a transîtîv û hêmaneke navdêr, lêkereke yek maneyî ava dikin, lê ev obje herçend perçeyê lêkerê bixwe be jî ji ber lêkera sivik a transîtîv weku objeya rasterast tevdigere û di demên borî da dikevin avaniya ergatîf, weku mînak [*govend] girtin*. Li ser vê yekê Haig transîtîvbûna Kurmancî bi du avayan disenifine: transîtîvîteya sentaksî ku objeyeke rasterast birêve dibe û ya leksîkî/ferhengî ku herçend objeyeke rasterast birêve nebe jî weku transîtîv tevdigere ji ber lêkera sivik a transîtîv. Bi heman şiklî, Gündoğduyê (2015) avaniyên lêkerên kompleks analîz kiriye, cureyên wan senifandine û nîşan daye ku hin hêmanên navdêr ên ku rola objeya rasterast pêk tînin, bi avayekî sînordar wek objeya rasterast tevdigerin, ango bi tenê hin taybetiyên objeya rasterast hildigirin lê hinên din ji van bêtir azad tevdigerin û dişibin objeyên rasterast. Herwiha ew îdia dike ku lêkerên sivik bêtir fonksiyonên rêzimanî pêk tînin, perçeyên navdêrî hilgirê maneyê yên esil in. Lê dîsa jî hilbijartina lêkera sivik ji avaniya lêkerê bi tevahî azad nîne. Ango weku mînakên *hişyar bûn* û *hişyar kirin*ê da. Ew xebat nîşan didin ku objebûn ne tenê ji hêla xuyangê ve lê di heman demê da li gor maneya hundirîn a lêkeran ra jî têkildar e. Herwiha ew xebat li ser objeyên rasterast bi hûrgilî analîzan bikin jî ji rolên semantîk, senifandinên lêkeran ên semantîk gelekî dûr in.

Xebata Yonat (2022) li ser bikaranîna subjeyên ne-kanonîk hûr dibe, ku di devokên Kurdî yên Rojhilata Başûr da tên dîtin û subjeyên ne-kanonîk ên di helbestên Feqîyê Teyran da analîz dike. Piştî danasîna subjeyên tîpîk û kanonîk, derbasî taybetîyên subjeyên ne-kanonîk dibe. Nivîskar wan taybetîyan bi çar xalan diyar dike û piştre tetbîqî helbestên Feqîyê Teyran dike. Li gor vê subjeyên ne-kanonîk xwedî rola semantîk a tecrubekar in. Ji bilî wê, bikaranîna subjeyên ne-kanonîk di hevokên xwedîtiyê, ên bi hene-heye tên avakirin, xuya dibin. Wekî din bi avaniyên bi lêkera *vîyan*ê ra tên dîtin. Herî dawî îfadeyên îdyomatîk ên bi perçeyên laşê mirov ra eleqedar in subjeyên bi vî rengî digirin. Hatiye nîşandan ku ew hêman rêkkeftina kes û hejmarê bi pêveberê ra nîşan nadin. Ev xebat ji bo lêhûrbûna hêmaneke gramatîk giring e û

bikaranînên cuda ên rolên gramatîk nîşan dide. Lêbelê ew xebat di warekî teng û spesifîk da bicih dibe û bi tenê ji alîyekî subjeyê ra sînordar e.

Haig (2014a) destnîşan kiriye ku *hedef*ên (Goal) lokatîf bi gelemperî di Kurmancî û zimanên Neo-Aramî da piştî pêveberê tên û ev avanî bi rolên tematîk ra eleqedar e. Haig (2014a) li ser peyvrêzîya rêzimanî ya lêkeran û hêmanên *hedef* ên di Kurmancî û Neo-Aramî da lêkolîneke berawirdî dike. Di Kurdî de, bi taybetî di Kurmancî de, hêmanên *hedef* bi gelemperî piştî pêveberê tên dîtin û paterneke strukturel diafirînin. Lêkolîn nîşan dide ku ev rêzkirin bi avahiyên daçekî û têkiliyên tematîk ên di avahiya bûyerê ve girêdayî ye û herwiha ji hêla taybetmendiyên tîpolojîk ên zimên ve jî şikil digire. Ji bilî wê (Haig, 2014b) di Kurdiya Bakur (Kurmancî) û zimanên derdorê da li ser pozîsyonên peyvrêzî ya hêmanên *Hedef*, xebateke tîpolojîk û çendanî derdixe holê. Korpusa nivîsên vegotinê yên ji zaravayên Badînî, Midyat, Mûş û Erziromê hatine berhevkirin, Haig û Thiele li ser vê korpûsê dibînin ku *hedef* di navbera %79 û %94 da piştî pêveberê bicih dibin. Herwiha *hedef*ên lêkerên vegotinê (*speech*), di hin devokên da berî pêveberê bicih dibin, nemaze devokên Mûş û Erziromê da %100 wisa ye. Lêkolîn nîşan dide ku ev avanî hem di Kurdî û hem jî di devokên Neo-Aramî yên herêmê da jî hene. Bi vî avayî, pêşnîyaz dike ku ev profîla sentaktîk a hevpar ji hêla têkiliya herêmî ve hatiye avabûn. Her wiha hatiye nîqaşkirin ku Tirkî (bi taybetî devoka Erzincanê) bandor li Kurdî kiriye û Kurdî jî bandor li ser rêzimana zimanên derdorê kiriye. Ji ber vê yekê, peyvrêziya Obje-Pêveber- *Hedef* ku di Kurdî da tê dîtin ji hêla tîpolojîk ve mînakeke kêm e û divê di çarçoveya têkiliya ziman û têkiliya dîrokî da bê nirxandin. Herçend ew xebat ji hêla semantîkê, avaniya bûyerê û rolên tematîk ve gelekî giring bin jî di çarçoveyeke teng a li ser rola *hedef*ê bi tenê hatiye kirin.

Xebata herî kûr û berfireh a heta niha li ser objeyên Kurmancî hatiye kirin xebata Gündoğduyê (2018) ye. Ev lêkolîn li ser bingeha pîvanên sentaksî û semantîkî, cudahiya di navbera avaniyên arguman û têrkeran vedikole. Nivîskar pîvanên curbicur mîna valans, cihguhertin, mecbûrîbûn, wateya kontekstî û hwd bikar tîne da ku sînorên arguman û têrkeran ji hev biqetîne. Bi rêya Avaniya Bûyerê digihêje wê encamê ku objeyên daçekî ên Kurmancî di eslê xwe da Bingeh-Transîtîv nînin. Di heman demê da avaniyên daçekî da, hin hêman taybetmendiyên argumanê nîşan didin, hinên din jî

tevkariyê li wateyê dikin lê ne girêdayî lêkerê ne û di pozîsyona têrkeran da ne. Di vê çarçoveyê de, nîşan dide ku arguman û têrker ên di Kurmancî da hem di astên avanî û hem jî di asta rolên semantîkî da bi piranî cuda ne û ev cudahî amûrek giring ji bo analîzkirina avaniya bûyerê peyda dike.

Lîteratûra heyî bi perspektîfên cûrbicûr li ser têgeha objeyê rawestîyaye. Hin lêkolînan li ser pîvanên sentaksî sekinîne, hinên din jî hin rolên sematîk ên objeyan lêkolîn kirine. Lêbelê, têkiliyên obje-lêker di kurmanciya kurmancî da hîn bi awayekî sîstematîk ji perspektîfeke tevahî ve, ku hemû van hêmanan digire nav xwe, nehatiye amadekirin. Ev lêkolîn armanc dike ku bi lêkolîna berfireh a cureyên objeyan di Kurdîya Kurmancî da û têkiliyên wan ên tematîk û morfosentaksî bi lêkeran ra, vê valatiyê tijî bike. Bi vî rengî, ew ê hem tevkarî li zimannasiya teorîk û hem jî lêkolînên deskrîptîf ên li ser Kurdî bike.

Sînordarîyên Xebatê

Ev lêkolîn rêbazeke deskrîptîf bi kar tîne û tenê li ser mînakên wêjeyî yên bi navê *Tofan* a Hesenê Metê (2013), Sîyabend û Xecê ya Ahmet Aras (2019) û Meseleya Wijdanê ya Ahmed Muxtar Caf, ku hi hêla Ziya Avci ve ji Soranî derbasî Kurmancî bûye (2016), disekine. Ji ber vê yekê, daneyên ku hatine berhevkirin nûnertiya devokên din nake. Wekî din, di vê lêkolînê da tenê zaravaya Kurmancî hatiye hesibandin, zaravayên din derveyî vê xebatê mane. Ji ber ku mînakên ku hatin bikaranîn bi piranî bi serdemekê ve sînordar bûn, cihêrengiya têkiliyên lêker-objeyê di çarçoveya guherokên civakî-zimanî yên berfirehtir da nehatin nirxandin. Lêkolîn tenê li ser teoriya Avahiya Bûyerê sekinî û analîzeke berawirdî bi teoriyên din ên sentaktîk an semantîk ra nehat kirin. Di dawiyê de, hebûna lêkerên îdyomatîk ên taybetî bi lêkerên kompleks û xwezaya wan a ne-analîtîk di hin rewşan da dabeşkirina zelal a komên lêkeran dijwar kir.

1. OBJE

Di lîteratûra zimannasîyê da nîqaşeke dirêj li ser pênaseya objeyan û sînorên wan çêbûye. Lê xebatên di vê qadê da ji bo veqetîna bin-kategoriyên objeyan ên mîna objeya rasterast, objeya nerasterast, objeya oblîk û ya kûazî (quasî) zemînek ava kiriye. Ligel vê yekê, weku sereke zimannas herî zêde li ser pirsa "obje çi ye" sekinîne. Bi vî avayî Moravcsik (1978) objeyan weku Frêzên Navdêrî ên ne-agentîv û ne-datîv pênase dike; Collinge (1984, 11) pêşnîyaz dike ku frêzên navdêrî yên ku ne subje ne jî mercî (*circumstantial*) ne, dikarin weku obje bên hesibandin. Herwiha ew hêmanên hevokekê li ser dara kategoriyan nîşan dide û dibêjê parçeya ku hêrî zêde nêzî pêveberê ye obje e. Bi vî şiklî objeyan li gor avaniya pozîsyona wan pênase dike. Lêbelê bi kifşkirina objeyên nû yên zimanên din -ku bi pênaseyên derbasdar li hev nakin, ew senifandinên tradîsyonî êdî têr nekirin. Ji ber vê yekê jî meylek çêdibe ku objeyê ne tenê weku hêmaneke tematîk lê di heman demê da bi têkilîya wê ya bi lêkerê ra analîz dike. Bi taybetî jî di çarçoveya têgeha valensê, transitîvîteyê û pêkhatina argumanê (*argument realization*) da obje ji nû ve hatin nirxandin û senifandin. Bi vana, hewl hatiye dayîn ku argumanên mecbûrî yên lêkeran bên diyarkirin. Herwiha di encama wan da obje bi gelemperî weku "pozîsyonên strukturel ên ji hêla lêkerê ve lîsanskirî" hatine şayesandin. Bi van nêzîkatiyan, obje êdî ne tenê weku roleke tematîk lê di heman demê da bi pozîsyona xwe ya sentaksî jî tên fikirîn. Bi vî avayî objebûn, bi îşaretkirinên morfolojîk, rolên tematîk, bi têkiliya wan a bi lêkerê û peywirên sentaktîk; ne tenê di asteke fonksiyonel da lê di heman demê da di asteke teorîk da jî ji nû ve tên nirxandin.

Di vê pêvajoyê da, têkilîya lêker-obje xwedî roleke muhîm e ku nikare bê piştguhkirin. Ji ber vê yekê gelek zimannas berê xwe didin lêkeran. Bi vî avayî lêker, bi hejmareke pîvanan tên dabeşkirin. Pîvaneke giring ji wan, valensa pêveberan e. Valens nîşan dide ku pêveberek bi tenê serê xwe hewcedarî çend heb beşdaran e, bi gotineke din jî avaniya argumanan[1] a pêveberekê ye ku kapasîteya wê ya objeyan nîşan dide. Bi valensê tê famkirin ku, pêveberek ka bi tenê objeyekê; an zêdetir objeyan digire. Ev yek weku "valens"a pêveberê tê binavkirin (Carnie, 2013, 58). Herwiha

[1] Di vê tezê de ev têgeh weku hêmanên ku ji hêla lêkerê ve hatine lîsanskirin, tê bikaranîn.

subje gelek caran ji hêla zimannasan ve di nava van argumanan da neyê hejmartin jî; li vir ew jî weku argumanekê tê hesibandin. Weku mînak pêveberên bi yek-arguman xwedî bi tenê valensekê ne: *kenîn, gihîştin, rûniştin, revîn*. Ew arguman jî subje ye:

Ez dikenim.

Di vê mînakê da ji bo ku bûyer pêk bê subjeya *ez*ê bes e. Lê di mînaka *zeliqandin*ê da bi tenê subje dê wê weku hevokeke kêm nîşan bide:

a.*Ez dizeliqînim.

b.*Ez resim dizeliqînim.

Ji bo vê diyare ku divê subjeyek hebe ku objeyekê bi tişteke din ve bigihêjine hev:

c. Ez resim bi diwêr ve dikim.

Valens her çend ne heman be jî lê gelek caran bi têgeha transitîvîteyê ve girêdayî ye. Taybetiya transîtîvîteyê ew e ku refereyî hejmara argumanan dike ku pêveber hewcedarî ye. Her wiha taybetiya objeyê jî muhîm e ku divê ya rasterast be. Lê valens fokûsê dide ser hejmara argumanan. Ango di pêvebereke yek-valens da tu arguman ji bilî subjeyê tune ne û ew weku ne-transîtîv tên bi navkirin:

Ez dimeşim.

Lêbelê Nichols (1984, 186) lêkerên ku objeyên oblîk digirin an jî ji bilî subjeyê tu argumanan nagirin, weku ne-transîtîv bi nav dike. Ew tê vê maneyê ku ne-transîtîv dikarin xwedî objeyekê bin lê divê objeya rasterast nebe. Weku mînaka jêrîn da:

a. Ez digihêjim *malê.*

b. *Ez digihêjim.

Li vir gihîştin argumanekê mecbûrî dixwaze lê ew objeya rasterast nîne û ew taybetî *gihîştin*ê dixe kategoriya lêkerên ne-transîtîv e. Dema vegerin ser valensê, heke pêveber du argumanên zerûrî bistîne, ango ji bilî subjeyê, objeyeke rasterast birêve bibe û xwedî du-valensê be transîtîv/monotransîtîv e:

Zelalê *sêvek* xwar.

Herî dawî pêveberên ku sê argumanan digirin û xwedî sê-valens in weku dîtransîtîv (li gor teoriyên cuda weku bîtransîtîv) tên binavkirin. Ew bi gelemperî

subjeyekê, objeyeke rasterast û objeyeke nerasterast birêve dibin. Weku mîna ji bo bûyera şandinê pêk bê, divê *kesek*, *tiştekî* bide *yekî:*

Keçik *sêvê* dide *me.*

Li gor vê dikare bê gotin ku pêveber li gor argumanên ku distînin xwedî valensên cuda ne û transîtîvîte jî di nava xwe da xwedî astan e û ji van mînakan jî tê fehmkirin ku objeya rasterast dibe ku di lêkereke monotransîtîv (xwarin) an jî yeka ditransîtîv (şandin) da cih bigire. Lê objeya nerasterast bi tenê li cihê ku objeya rasterast heye, weku objeya duyemîn cih digire. Ji ber vê yekê jî hin zimannas wan weku objeya yekemîn û objeya duyemîn jî binav dikin (Nichols, 1984, 190). Jê pê ve, heke valensa pêveberekê du an jî sê be û yek ji wan kêm be ew ê bibe negramatîk ji ber vê yekê mecbûrîbûn xaleke giring e ji bo valens û transîtîvîteyê. Lewma dema ku argumanên pêveberekê tên hesibandin, bi tenê yên zerûrî tên hejmartin. Mînak, ji bo lêkera *dayîn/dan*ê, subjeyeke aktorek (*agent*), objeyeke rasterast a tema (*theme*) û objeyeke nerasterast a *hedef* (*goal*) pêwist e. Heke yek ji van argumanan *kêm* be an jî argumaneke din lê zêde be -ku bêyî avaniya ku lêker dikare saz bike, an jî rolên wanên semantîk ne guncav bin, wê demê hevok negramatîk dibe.

a) Keçikê îskan danî ser maseyê.

b) *îskan danî ser maseyê.

c) *keçikê danî ser maseyê.

d) *keçikê îskan qelem danî ser maseyê.

e) *kevir ezman bi çakûç danî.

Ji van mînakan dîyar e ku zêdetir an jî kêmtir arguman ji ya ku lêker hewce dike, hevokê dike negramatîk. Lê bêyî hejmara beşdaran taybetiyên wan ên semantîk, ango rolên tematîk[2] jî divê li gor lêkerê guncav bin. Mînaka (e)yê da, lêker ji ber rola xwe ya tematîk sînordar e û nikare tişteke ne-jîndar bigire. Ango kevir nikare bibe *aktor* û ezman nikare bibe *tema*. Herwiha perçeyên din jî li gor lêkera *danîn*ê xwedî rolên

[2] Rolên ku lêkerek destûrê didîyê.

tematîk ên şaş in. Di encamê da ji bo valens û transîtîvîteyê tabloyeke weha derdikeve hember:

Tablo 1.1. Valensa Pêveberan

Transîtîvîte	*Valens*	*Mînak*
Ne-transîtîv	1 arguman	kenîn, revîn
Transîtîv	2 arguman (yek objeya rasterast)	kuştin, şikandin
Dîtransîtîv	3 arguman (yek objeya rasterast)	dayîn, firotin

Di vê xalê da giring e ku bê gotin, lêker hin rewş an jî bûyeran kod dikin û ji hêla maneyê ve bi rola semantîkî ya beşdaran a di van bûyer û rewşan da tên karakterîzekirin. Hemû lêker xwedî komeke tîpîk a ji van beşdarên zerûrî ne. Ji bilî rolên wan ên semantîk, ew beşdar di nav laristeyê da weku subje, objeya rasterast û ya nerasterast rolên gramatîk jî digirin. Herwiha objeya rasterast weku fonksîyoneke sentaktîkî ye ku bi pêveberê ra xwedî têkilîyeke yekser e û di heman demê da jî gelek caran argumana mecbûrî ye ji bo lêkerê. Ji bo lêkerê çend arguman hewce ne û ew arguman kîjan rolan digirin mijara teoriya *Theta Roleê* ye û ev rewş, giringîya Rolên Teta (*Theta Roles*) dide ber çavan ku ew ji bo diyarkirina avaniyên sentaktîk çiqas navendî ye (Carnie, 2013, 232).

1.1. Cûreyên Objeyan

Herçend hat nîşandan ku lêker li gor taybetiyên xwe yên semantîk û sentaktîk weku objeyekê an jî du objeyan distînin ku weku objeyên rasterast, yên nerasterast, yên oblîk di hevokê xwedî bin-kategorîyan in. Herçend weku tradîsyonî, giranî li ser objeyên rasterast û yên ne rasterast bin jî nêzîkatîyên zimannasî ên modern, ne tenê ji hêla semantîkî va, di heman demê da li gor pîvanên fonksîyonî û şiklî, bi avayekî pir-alî analîz dikin. Heta niha derheqê valensa pêveberan da bi avayekî ruxalî sînorek hat xêzkirin. Ji vir pê ve, li ser çarçove û sînorên wan lihevkirineke teqez tune be jî, nîqaş û pênasêyên li ser objeyan ên di lîteratûrê da bên zanîn, dê mijarê zelaltir bike.

1.1.1. Objeya rasterast

Objeya ku herî zêde xebat li ser hatine kirin ev e. Di destpêkê da ew weku "hêmana ku ji lêkerê yekser bandorê dibîne" hatiye pênasekirin û di sînoreke teng a di navbera objeya rasterast û ya nerasterast hatiye nirxandin. Bi demê ra di nava sînorên

firehtir da hatiye analîzkirin. Li gor Sanders (1984, 222-224) obje bi gelemperî weku hêmana ku marûzî tevgera lêkerê dimîne (ango, *undergoer*) (*birîn*), tiştê ku piştî tevgerê derdikeve holê (*nivîsîn*), an jî weku tiştê ku tê pêhisîn (*dîtin*), tê îfadekirin. Herwiha li gor wî pênaseyeke alternativ jî ew e ku obje dikarin weku argumanên ne-subje ên lêkerên transîtîv bên şayesandin; fonksîyona semantîk a objeya rasterast, îfadekirina hêmana ne destpêker, ne xwedî qontrol û kêmtir çalak e. Bi gotineke din, di hevokê da tiştekî nade destpêkirin, tevgerê birêve nabe lê bixwe jê bibandor dibe û di hevokê da bi tenê serê xwe tiştekê nake, pasîv e. Ji bilî wan, di rolên *tema* (*theme*) û *muesîr* (*patient*) da xuya dibin bi piranî; lê dibe ku *wergir* (*recipient*)*, stimulus*, *çavkanî* (*source*), an jî *tecrubekar* (*experiencer*) jî bin (Valin, 2004, 60)

Di gelek zimanan de, ew weku tîpîk xwedî rewşa akûzatîf in. Herwiha di nava rolên gramatîk de, piştî subjeyê objeya rasterast xwedî hîyerarşîya herî bilind e:

SUBJE > OBJEYA RASTERAST > OBJEYA NERASTERAST > YÊN NE-TERM (NON-TERMS)

(Valin, 2004, 46)

Ew rêz tê wê maneyê ku, avaniyeke sentaktîk heke destûrê bide van beşdaran ew li gor vê rêzê bi cih dibin û objeya rasterast di rêza objeyan da weku yekemîn e. Lê herçend ku heta niha hat dîtin ji bo objeyan krîtereke sabît û gerdûnî tune ye û dibe ku li gor zimanan ew cuda bin. Herwiha Collinge (1984, 9-11) dibêje ku kategoriya objeya rasterast hêmaneke sentaksî ye ku di gelek zimanan da bi awayekî sehekî tê naskirin û pirî caran tê texmînkirin ku bi zelalî hatiye pênasekirin. Lê ev têgeh bi awayekî teorîk ewqas nehatiye damezrandin, hewce ye ku hem ji aliyên xwe yên avahî û hem jî yên semantîk ve bê ravekirin. Lê li gorî wî (1984), pîvaneke yekane tune ye ku objebûnê diyar bike; pênaseya objeyê gelek caran ji hêla kontekstê, taybetmendiyên semantîk (mînak hejmar, jîndarîbûn) ve û bi zincîra sentaksî a di nav hevokê da bandorê dibîne. Blansitt (1984, 130) jî nêrîna tradîsyonel rexne dike ya ku objeya rasterast weku "hêmana ku yekser di bin bandora lêkerê da ye" te'rîf dike. Li gor wî êdî ew nêrîn ne qebûlbar e. Di mînaka *min sêv da keçikê* da *keçik* û *sêv* her du jî ji lêkerê bandorê dibînin û guherîneke cihî û xwedîtîyê (*motion of caused possession*) pêk tê. Lê di encamê da ew jî îdia dike ku pênaseke gerdûnî û hevpar hê jî tune ye û

pênaseyeke kategoriyên gramatîk a nav-zimanî ne pêkan e. Ji bilî vê, Gil (1984) nîşan daye ku avaniya rêzimanî ya Tagalogî bi kategoriyên weku subje û obje, di wateya klasîk da li hev nakin. Di dawîyê da ew jî digihêje wê encamê ku ev têgeh ne gerdûnî ne. Kategoriyên wekî "objeya rasterast" dibe ku di hemû zimanan da bi heman awayî nexebitin; ji ber vê yekê, li gor wî divê zimannas di analîzên zimannasî de, taybetîyên xisûsî ên zimaman bidin ber çavan.

Di encamê da, meseleya pênasekirina objeyan di avahiyên zimanî da û bi kîjan pîvanan ew tên destnîşankirin, hîn jî di lîteratûra zimannasî da qadeke nakok e. Teoriyên cûda li ser objebûnê ji perspektîfên curbicur ên wekî rolên semantîk, pozîsyonên sentaktîk, nîşankirina morfolojîk û hwd disekinin; ev dibe sedema têkçûna pêşxistina pênaseyeke gerdûnî û yekane. Di vê çarçoveyê de, divê neyê ji bîrkirin ku her çend pîvanên ku di pênasekirina objeya rasterast da tên bikaranîn raveker bin jî, ew di her zimanî da bi heman rengî derbasdar nînin û sînorên wan bi zelalî nayên xêzkirin. Ji ber vê sedemê, objebûn weku diyardeyeke pir-alî tê nirxandin. Li jêr hin pîvanên ji bo diyarkirina objeya rasterast tên bikaranîn, dê bên nîşandan. Ji ber ku di beşa têkîldar a bi navê Ferqa di Navbera Têrker û Argumanan da bi hûrgilî bên nîqaşkirin, li vir bi avayekî sînordar û rûxalî werin nîşandan.

1.1.1.1. Pîvanên diyarkirina objeya rasterast

Pênasîn û destnîşankirina objeya rasterast yek ji pirsgirêkên bingehîn a di analîza rêzimanî da ye. Ji ber vê sedemê, zimannasan hin pîvanên curbicurji bo diyarkirina objeya rasterast pêşxistine da ku pêşî li tevlihevkirina objeya rasterast bi temamkerên din û bi taybetî bi avahiyên nerasterast/oblîk bigirin. Armanca van pîvan û testan ew e ku taybetmendiyên fonksîyonî û semantîk ên objeyê eşkere bikin. Hin ji pîvanên sereke yên ku ji bo destnîşankirina objeya rasterast tên bikaranîn li jêr bên nasandin. Ew pîvan bi piranî peyvrêziyê, pasîvîzekirinê, rewşê (*case*), û rolên tematîk vedihewîne. Her pîvan aliyekî cûda ya têkiliya avahîsaziyê ya di navbera obje û lêkerê da eşkere dike û dema ku bi hev ra bên hesibandin, ew îmkanê dide ku rewşa objeyê bi avayekî pêbawertir bê destnîşankirin.

1.1.1.1.1. Peyvrêzî

Yek ji awayên herî eşkere, lê giring ên ku ziman pê ji hev cuda dibin, rêza hêmanên sereke ên di hevokekê da ye. Ango, gelek ziman xwedî pozîsyoneke taybetî xwe ne ji bo hêmanên rêzimanî. Ji ber vê yekê jî gelek zimanan da pozîsyona gelemper a objeyê a di hevokekê da nîşaneyeke krîtîk a objeyên wî zimanî ye. Herwiha li gor Sanders (1984, 232), hemû cureyên objeyan xwedî pozîsyonên xisûsî ne di nava hevokê de, herçend xwedî rol an jî fonksîyonên maneyî da cuda bin jî. Bi gotineke din objeyek dibe ku *tema*, *hedef*, *wergir*, enstruman an jî hwd be lê cihê wê di zimanan da bi gelemperî diyar e.

Bo nimûne, di Îngilîzî de, subje berî pêveberê tê û objeya rasterast piştî pêveberê tê:

She broke *the glass.*
'Wê *îskan* şikand.'

Li gor Borg û Comrie (1984, 112) di zimanan da objeyên rasterast, ji ber topîkalîzasyonê, fokûsê an jî sedemên din ên pragmatîk dibe ku cih biguherînin. Ji ber vê yekê jî ew weku nîşaneyeke qebûlbar a objeyê nayê hesibandin. Ji bilî vê yekê hin zimanan da dibe ku objeya rasterast û ya nerasterast cihên hev bigirin. Ji vê ra, fenomena bi navê guherîna datîvê (*dative-shift*) mînakeke sereke ava dike:

a. John gave [a present] to the girl.
John dan.DB [yek diyarî] daçek nîşanker keçik

b. John gave the girl [a present].
John dan.DB nîşanker keçik [yek diyarî]

"John diyarîyek da keçikê"

Ji bo lêkera *dayînê* ji bilî subjeyê du beşdarên din hewce ne. Di mînaka jorîn da jî objeya rasterast *present,* di hevoka din da bi hêmana datîv cih diguherîne. Ji ber vana û mînakên di zimanên din da ew krîter ne sabît û gerdûnî ye.

1.1.1.1.2. Rewş (*case*)

Îşaretkirina morfolojîk, bi taybetî ji bo zimanên ergatîf-absolutif, nomînatîv-akusatîv da krîtereke giring e. Ew arî zimannasan dike da ku objeyan ji hev û ji hêmanên din vebiqetînin. Wek ku berê jî hatibû gotin, rewşa objeya rasterast bi

gelemperî akûzatîf e. Herwiha li gor Blansitt (1984, 139) piraniya zimanan yek ji tîpên îşaretkirinê yên jêrîn nîşan didin:

(a) Objeya rasterast û objeya nerasterast her du jî bi îşaretkirineke taybet nayên nîşandan.

(b) Objeya rasterast îşaretkirî, lê objeya nerasterast ne-îşaretkirî ye.

(c) Objeya rasterast îşaretkirî ye û objeya nerasterast xwedî îşaretkirineke cuda ye.

Bi taybetî zimanên Hind-Ewropî yên klasîk û zimanên Hind-Ewropî yên nûjen ku xwedî pergala rewşên morfolojîk in, ji bo objeya rasterast û objeya nerasterast bi rêzê bi akûzatîv û datîvê nîşan didin.

Weku mînak zimanê Maltayî xwedî seteke paşgirên akusatîv e ku bi objeya rasterast ve eleqedar e û hin qertafên datîvê hene ku teqez bi objeya rasterast ve eleqedar in (Blansitt,1984, 127-140) û ew jî arî zimannasan dike ku vî zimanî da têkilîyên gramatîk ên mîna subje û objeyan diyar bikin. Lê di zimanê İspanyolî da her çend sîstemeke hevşib hebe jî ew ne guherokeke sabît e di navbera objeya rasterast û ya nerasterast da. Gelek caran îşeratkirina ku ji bo objeya nerasterast tê bikaranîn, ji bo ya rasterast jî tê bikaranîn. Ji bilî Îspanyolî, zimanên mîna Koreyî, Keçwayî him objeya rasterast him jî ya nerasterast weku akûzatîv îşaret dikin (Valin, 2004, 59) Ew jî nîşan dide ku ji bo objeya rasterast rewş (*case*) nîşaneyeke sabît û sîstematîk a gerdûnî nîne (Blansitt, 1984, 139)

1.1.1.1.3. Pasîvîzasyon

Pasîvîzekirin pirî caran testeke giring e ku ji bo destnîşankirina objeyan jê sûd tê wergirtin. Li gor vê krîterê bi tenê objeyên rasterast dikarin pasîvîze bin:

a. Keçikê *sêv* xwar.

b. Sêv hat xwarin.

Lêbelê, cûdahiyên strukturel hene yên ku nîşan didin ku ev test jî bi tenê serê xwe ne pîvaneke têr û gerdûnî ye. Nemaze di avahiyên ditransîv da, hemû ziman di heman astê da wê îmkanê nadin. Hin ziman tenê dihêlin ku objeya rasterast (mînak, di hevoka *Ehmed pirtûk da Ayşeyê* de"pirtûk") pozîsyona subjeya pasîf bigire, hinên din

dihêlin ku objeya nerasterast (mînak, "Ayşe") jî vê yekê pêk bîne. Çend ziman, weku Îngilîzî, dikarin her du objeyan jî di pozîsyona subjeya pasîf da bi cîh bikin:

a. John gave Bill the money.
John dan.DB Bill $_{det}$ pere

b. Bill was given the money.
Bill bûn.DB dan.prf $_{det}$ pere
(*Pere hat dayîn bi Bill)

(Collinge. 1984, 12)

Ji bilî van, hin ziman hene ku dikarin objeya hevokên ne transîtîv jî pasîvîze bikin. Mînakeke berbiçav a ji Tirkî:

a. Onlar okul-a git-ti.
Ew.pirj. dibistan-$_{dat}$ reha çûnê-DB

b. Okula gid-il-di.
Dibistan-$_{dat}$ reha çûnê-daçeka pasîvê-DB

Ev cûdahî nîşan didin ku pasîvîzekirin ji hêla sînorkirinên taybetî yên zimanî ve teşe digire û ew dikare xelet be ku meriv bi tenê li pasîvîzekirinê binihêre û diyar bike ka navdêr objeya rasterast e, an na. Ji ber vê yekê, testa pasîvîzekirinê ji bo destnîşankirina rewşa objeyê tenê dikare encamên watedar bide dema ku bi pîvanên din ên avahî û semantîkî ra bê nirxandin.

1.1.1.1.4. Rolên tematîk

Bi gelemperî objeya rasterast mîna li jor jî derbas bû *tema* an jî *muesîr* e. *Tema* hêmana ku cih diguherîne û objeya lêkerên mîna *dan*, *firotin*ê ye. *Muesîr* jî hêmana ku guhertinekê derbas dibe, ji holê radibe an jî derdikeve holê wekû objeyên lêkerên *xwarin, çêkirin*, *kuştin*ê. Objeya rasterast bi gelemperî weku tîpîk xwedî van rolan in û hêmanên din nikarin van rolan bigirin. Herwiha A. J Borg û Comrie (1984, 109-126) îdia dikin ku herçend objeyeke rasterast a tîpîk *muesîr* be jî, hemû *muesîr* nakevin bin vê kategorîzasyonê. Weku mînak, gelek lêkerên ne-transîtîv hene ku subjeya wan *muesîr* e:

Cam şikî/*derî* vebû/ *weris* qetî….

Lê ew perçe nikarin weku objeya rasterast bên binavkirin. Herwiha, objeyeke rasterast a tîpîk, yek ji hêmana lêkereke xwedî du beşdar e ku xwedî rola *muesîr* e. Ango divê buyera ku lêker îfade dike xwedî du beşdaran be û yek ji van beşdaran xwedî rola *muesîr* be ku objeya rasterast ew e (Borg û Comrie, 1984, 110). Lê di vê rewşê da jî tê zanîn ku gelek lêker hene ku objeya wan ne *muesîr* e; lê dibe ku tecrubekar, *tema*, topic an jî weku stimulus be.

Gulê *pisîkê* dibîne.

Di vê mînakê da *pisîk* taybetiyên *muesîr* nîşan nade, bi gotineke din guherînekê derbas nake, cih naguherîne û nagihêje encamekê. Lê ew weku objeyeke rasterast tevdigere.

Bi vî avayî dikare bê gotin ku rolên tematîk jî gelek caran bi rolên gramatîk ve li hev nakin. Herçend *muesîr* weku taybetiyeke objeyê bê qebûlkirin jî hin mînakan da ew rewş dibe kû ne zelal be. Ango, dibe ku Frazeke Navdêrî xwedî rola tematîk a *muesîr* be lê ji hêla rola xwe ya gramatîk ve jî subje be.

1.1.2. Objeya nerasterast

Li ser objeyên nerasterast bi gelemperî pênaseyeke klîşe û sabît heye ku wan weku hêmana ku ji tevgera lêkerê bi awayekî nerasterast û neyekser bandor dibe, te'rîf dike. Lêbelê Blansitt (130), dibêje baş e ku ew pênaseyên tradîsyonî û semantîk-navendî êdî rexbet nabînin. Lê mixabin hê jî pênaseyeke alternatîf jî nehatiye pêşxistin.

Herçend pênaseyeke teqez tune be jî ji bo objeyên nerasterast ew weku krîterek e sabît e ku objeyên nerasterast di hevokên ditransîtîv da derbas dibin û cihê ku objeyeke rasterast hebe tên dîtin:

a. Zilamî *garis* firotin [wan].

b. Pîrîkê *nevî*yên xwe birin [malê].

Di mînakên jorîn da hêmanên ku di nava koşebendê da hatine dayîn beşdarên mecbûrî ên pêveberê ne lê di hevokê da objeyên rasterast (garis, nevî) jî cih digirin.

Li gor Valin (2004, 67) taybetiya esas a ji bo objeyên nerasterast hevpar ji morfosentaktîkê bêtir semantîk e. Ew bi gelemperî *wergir*, *sûdmend*, *hedef* argumanên lêkerên ditransîtîv in. Piştre wan dixe sê grûban: (1) yên weku objeyên rasterast

tevdigerin, (2) yên weku objeyên oblîk tevdigerin, mîna îngilîzî, û (3) yên kodkirineke cuda/resen distînin weku Rûsî.

Weku hat gotin hin ziman ên weku Îngilîzî ji bo objeya nerasterast avaniyeke resen û xas pêş naxînin. Heta hin zimannas têgeha objeya nerasterast ji bo zimanê îngîlîzi qebûl nakin (Valin, 2004, 68).

Ji bilî wê Givón (2001, 136-137), di pirtûka xwe da, objeyên lêkerên ne-transîtîv weku *ez diçim malê* da (hêmana *malê*) mîna objeya nerasterast pênase dike. Herwiha binbeşekê ji bo lêkerên ne-transîtîv ên bi "objeya nerasterast" vediqetîne. Li gor wî lêkerên di vê komê da subje û objeyeke nerasterast digirin, objeya nerasterast jî pirî caran bi daçekekê tê nîşankirin. Ew dikarin bi hejmareke bin-cureyên semantîk jî werin dabeş kirin, ku ew hemû di hemû zimanan da dibe ku nekevin nav heman cureya rêzimanî:

They went *to the market.* (hereketa cihî)
"Ew çûn *marketê."*

They sat *on/under/behind/in front of* the couch. (lokasyon)
"ew l*i ser/li bin/li paş/li pêşiya* qenepeyê rûniştin."

(Givon, 2001, 137)

Ew cudahîya pênaseyan herçend tevlihevî û dijwarîya pênasekirina objeyan bide ber çavan jî di pênaseya objeya nerasterast de, dikare bê gotin ku ew piranî hêmana datîv in û ew bi objeyên rasterast xuya dibin.

1.1.3. Objeya oblîk

Li gor Nichols (1984,184) xebatên dîroka zimannasiyê bi piranî li ser objeyên rasterast hatine terxankirin; objeyên oblîk ên ku bi daçekan hatine îşaretkirin, demeke dirêj weku têrker hatine ferzkirin. Bo nimûne, ji ber ku objeyên rasterast ên îngilîzî weku Frêzên Navdêrî hatine diyarkirin, objeyên oblîk ên ku di forma Frêzên Daçekî da ne, kêm bal kişandine ser xwe. Ji ber ku ew weku têrkeran hatine dîtin. Zimannas Thomas Payne (2006, 211) nominaleke ku bi hemaneke din ra ne xwedî tekilîyeke gramatîk e, weku "ne-argumanî" binav dike yan jî weku oblîk te'rîf dike ku ev yek, gotina Nichols dirastîne. Dema çavekî li lîteratûra Kurmancî bixînin, dê bê dîtin ku

heman tişt ji bo Kurmancî jî debasdar e. Di hin çavkaniyên zimannasiyê (Sheyholislami, 2018, wer. 2020, 100) da îfadeyên mîna "…lê hokerên cihî pey lêkerê dihên: emřo deçim bo bazar (îro diçim bazarê)" derbas dibin ku hê jî ferqa wan û Frêzên Hokerî bi zelalî ne diyar e.

Gelek caran ew hêman, di şuna enstrumanan da jî hatiye bikaranîn. Ji ber ku di gelek zimanan da bi daçekan, bi taybetî jî bi daçekên enstrumental tên nîşandan. Dê rast e ku meriv bi avayekî hêsan îdia bike ku enstrumanên weha bi rastî jî hêmanên oblîk ên sentaksî ne; lê objeyên oblîk, berevajî enstrumanên oblîk, beşek ji valensa pêveberan in (Blansitt, 1984, 141):

a.) Ez [bi te] henekan dikim. (objeya oblîk-argumana oblîk)

b.) Ez [bi miftehê] derî vedikim. (hêmana oblîk-hoker)

Daçeka *bi*'yê bi gelemperî Kurmancî da weku bihevrebûnê (comitative) an jî weku rola enstrumanî mîna alavekê di hevokê da cih digire. Lê di hevoka yekemîn da derveyî wan maneyan, weku parçeyeke ji lêkerê tevdigere. Dema mirov li ser maneyê wê bifikire, yekser ew ê bi zelalî neyê te'rîfkirin an jî peywireke wê ya sabît neyê dîtin. Ew yek di eslê xwe da taybetiya objeyên oblîk ên daçekî ye.

Li gor Göksel û Kerslake (2005, 128), objeyên oblîk, bi daçekekê tên nîşandan û îşaretî kes an tiştan dikin ku ew tişt an jî kes bi avayekî rasterast ji aksiyona lêkerê bibandor nabin lê parçeyeke bingehîn a wateya lêkerê ne. Nimûneyek ji Kurmancî:

Ez [ji pisîkan] ditirsim

Di vê hevokê da pisîk weku hêmaneke şênber cih nagire lê çavkaniya hesta subjeyê a weku gelemper e.

Ew bi piranî bi lêkerên ne-transîtîv ra çêdibin, mîna [ji…] *tirsîn,* [ji…] *hezkirin,* [ji…] *acizbûn,* [ji…] *nefretkirin*. Dibe ku weku Tirkî (Göksel û Kerslake, 2005, 128) an jî Kurdî bi îşaretkirinên dativ, lokatîf, ablatîv, komitatîf/enstrumanî bên nîşandan.

a. keçik gihîşt *malê.* [datîv]

b. keçik *li pisîkê* dixe. [lokatîf]

c. keçik *ji pisîkê* hez dike. [ablatîv]

d. keçik *bi me* bawer dike. [comîtatîf/enstrumanî]

a. Herkes piyanist-*e* bayıldı. [datîv]
"Kêfa herkesî ji pîyanîst ra hat."

b. Kocası *evin* rengin-*de* ısrar ediyor [lokatîf]
"Mêrê wê *di* rengê malê *da* rik dike."

c. Nermin kazadan sonra evin-*den* soğudu [ablatîv]
"Nermîn piştî qezayê ji mala xwe sar bû."

d. Serap kız kardeşi-*yle* hep dalga geçiyor [comîtatîf/ enstrumanî]
"Serap her tim tinazên xwe *bi* xwîşka xwe dike."

(Göksel û Kerslake. 2005, 128-129)

Her çiqasî ne her tim be jî ew bi gelemperî weku semantîkî bi hestan ve eleqedar in. Ango lêkerên ku objeyên oblîk dihewînin gelek caran dikevin nav sinifên semantîk û gelek caran derheqê hestan da ne (Göksel, Kerslake. 2005, 128; Zariquiey, 2017, 721). Bi vî avayî, em dikarin wan weku bivalent ne-transîtîv bi nav bikin.

1.1.4. Objeya kuazî

Quasi-obje têgeheke nû ye û di vê lîteraturê da dereng cih girtiye. Herwiha hejmara xebatên li ser wan, tilîyên destekî derbas nakin. Li gor van xebatan jî, ew bi taybetiyên xwe yên morfolojîk û sentaktîk gelekî dişibên objeyên rasterast. Lê bi hemû taybetiyên bingehîn ên objeya rasterast ra li hev nakin. Weku mînak di zimanê Kakataibû da ew bi gelemperî bi lêkerên performatîv ên mîna *strangotin* tên dîtin û vî zimanî da, weku objeya rasterast tên îşaretkirin:

Piax kana 'ë̈x ë̈në̈ cumbia upí kantan.

pi–ax	kana	'ë̈=x	ë̈në̈ cumbia upí
xwarin–subj>S	naratîv:kes 1.	kes 1=S	ev kumbiyaya bedew

kanta–a–n
stran gotin–porfekt–kes 1.

"piştî xwarinê, min ev strana bedew a kumbîyayê got."

Lêbelê pasîvîzasyona wan -ku weku yek ji taybetîyên objeya rasterast tê dîtin- gelekî sînordar e. Nikarin bi cinavkekê (mînak, *wê*) cih biguherin (*pronoun replacemen*t), ango avaniya wan a anaforîk tune ye. Ji bilî wê, avaniya wan a hevûdinî (*reciprocal*) û refleksîv tune ye. Herweha rêkkeftina bi obje-lêkerê jî nikarin çêbikin (Zariquiey, 2017). Li gel vê yekê weku hat gotin, ew di xuyangê da mîna objeyên rasterast in.

Li gor Gil (1984, 100) jî, objeyên quasî bi gelemperî bi lêkerên ne-transîtîv ra tên dîtin. Avaniya wan a anaforîk tune ye. Xuyanga wan a di hevokekê de, ji hêla pozîsyona xwe, nîşaneyên morfolojîk û têkiliya wan a bi lêkerê ve dişibin objeyên rasterast.

Di encamê da dikare bê gotin ku têgeha objeyê ne tenê ji hêla formê va, lê di heman demê da ji hêla semantîk û fonksiyonan ve jî avahiyeke tevlihev e. Cureyên wekî objeya rasterast, objeya nerasterast, objeya oblîk, objeya quasî, ku di vê beşê da hatin nîqaşkirin; bi pîvanên weku rolên tematîk, nîşankirina morfolojîk, pozîsyona sentaktîk, pasîvîzekirin hatin nirxandin. Pîvanên objeyên rasterast hatin nîqaşkirin. Lê di encamê da derket holê diyardeya objeyê di nav pergalên fonksiyonel ên yek bi yek zimanan da tên nirxandin, ne ku di formeke gerdûnî da. Di beşa jêrîn da jî ew senifandin ji bo Kurmancî çawa ye û kîjan taybetîyê ku tên behskirin ji bo Kurmancî jî derbasdar e, bê dîtin.

1.2. Di Kurmancî da Cureyên Objeyan

Di Kurmancî de, bi qasî ku di vê xebatê da hatiye tespîtkirin, objetî li gor perspektîvê ji sê an jî çar cûreyan pêk tê û hem pêveberên transîtîv hem jî yên ne-transîtîv da tê dîtin. Ew, ji obje (yan jî objeyên rasterast), objeyên nerasterast, objeyên oblîk û objeyên quasî -ku ji bo Kurmancî, bi vî rengî cara ewil li vir bên nîqaşkirin, pêk tên. Di vê beşê da ew ê ji hêla teybetîyên wan ên morfosentaktîk ve bên pênasekirin û rêzbûna wan a di hevokê da weku sentaksî li gor profîla tîpolojîk a Kurmancî bên nîşandan.

Ji van objeyan, objeyên oblîk, îşareta rewşa oblîk (*oblique case marker*) distînin û dişibin têrkeran. Objeyên rasterast ên pêveberên transîtîv li gor demê îşareta morfolojîk a akûzatîv û absolutîv digirin û hin taybetiyên xisûsî dihewînin; yên

sêyemîn objeyên nerasterast piranî piştî lêkerê tên û bi lêkerên dîtransîtîv tên dîtin; objeyên quasî jî ji gelek aliyan ve weku objeyên rasterast tevdigerin lê ew lêkerên ne-transîtîv in. Ev her çar cure obje, ji bilî taybetiyên wan ên morfosentaktîk û cihgirtina wan a di hevokê da li gor sê taybetiyan mîna obje switch-reference û rêkkeftina objeyê (*object agreement*), cihgirtina di hevokên hevûdinî (*reciprocal*) û reflexive da bên nirxandin.

1.2.1. Objeyên rasterast

Di Kurmancî da objeyên rasterast heke sedemeke pragmatîk tune be bi gelemperî berî pêveberê cih digire, SOL e. Di avaniya akusatîv da qertafên tewangê distînin û di avaniya ergatîf da di rewşa absolutîf da ne. Bi gelemperî *tema*, *muesîr* in:

a. Şîlanê mar kuşt.

b. Şîlanê xwarin ji me ra şand.

Lê ji bilî van rolan, hin lêkerên rewşê hene ku ne objeyên wan xwedî roleke diyar a serbixwe ne, ne jî subje di rola *aktor* da ye:

a. Ferhat wê dizane.

b. Jinik wê dibîne.

Ew obje ji hêla taybetiyên xwe yên hundirîn, li derveyî objeyên rasterast in û dê di beşên pêş da bên nîqaşkirin. Kurmancî da çawa ku Haig (2002) jî diyar dike objeyên rasterast xwedî hin taybetiyan in.

Yekemîn, objeyên rasterast daçekê nagirin ango, berî wan an jî piştî wan daçek nayê:

(24) a. Min cam şikand.

b. Zarok çûçikê difirîne.

Di van mînakan da lêkerên şikandin û firandin lêkerên transîtîv in û objeyên wan jî xwedî taybetiyên objeya rasterast ên gelemper in.

Taybetiya duyemîn jî ew e ku objeyên rasterast her çiqasê ji ber rewşên pragmatîk bikarin cih biguherînin jî di rewşa ne-îşaretkirî (*unmarked*) da berî pêveberê tên:

a. Min helbest nivîsîn.

b. *Min nivîsîn helbest.

a.Min sêv xwarin.

b. *Xwarin min sêv.

Taybetiya sêyemîn ew e ku objeyên rasterast di avaniya akûzatîf da ditewin heke di maneyeke cenerîk an jî cûreyî da neyê bikaranîn. Avaniya Akûzatîf ji bo Kurmancî demên niha ye:

a. Ez dîwar*î* boyax dikim.

b. Ez kinc*an* dişom.

c. Ez keçik*ê* nîşan didim.

Taybetiya çaremîn, di avaniya ergatîf da biresera rasterast rewş, kes û hejmarê li ser pêveberê nîşan dide:

a. Min dîwar boyax kir. - Ø

b. Min kinc şuşt*in.*

c. Min tu nîşan da*yî.*

Li gor diyarkirina Haig taybetiya herî dawî bi tenê objeyên rasterast dikarin bên pasîvîzekirin:

a. Dîwar hat boyaxkirin.

b. Kinc hatin şuştin.

c. Tu hatî dîtin.

d. *Li gîtarê hat xistin.

e. *Bi wê henek hat kirin.

Lê di devokan da dibe ku di avaniyên akuzatîf da objeyên oblîk ên daçekî carînan bên pasîvîzekirin mîna *heqê wî jê hat girtin*. Lê ew mijara xebateke serbixwe ye ku li vir cih nehatiye dayîn.

Weku hat dîtin di avaniya zimanê Kurmancî da objeyên rasterast bi gelemperî xwedî taybetiyên sabît in, ew xwedî rolên semantîk û pozîsyoneke gelemper in. Herwiha ew pasîvîze dibin û xwedî îşaretkirineke taybet in ji hêla rewşê va.

1.2.2. Objeyên nerasterast

Herçend hat gotin, objeyên nerasterast bi lêkerên dîtransîtîv ra tên dîtin û di Kurmancî da bi gelemperî piştî pêveberê tên. Ew cureya objeyan di Kurmancî da xwedî pozîsyoneke şid e:

a. Ew avê dişînin *bajaran.*

b. *Ew avê bajaran dişînin.

c. *Ew bajaran avê dişînin.

d. *Bajaran ew avê dişînin.

Bi gelemperî *hedef* a *wergir* (*recipient*), *sûdmend (benefactive*) an jî lokatîv in:

a. Ez avê didim *wê.* (*sûdmend*, *wergir*)

b. Ez avê dişînim malê. (lokatîv)

c. Çawa ku hat dîtin ew bi gelemperî bi pênaseya di lîteratûrê da lihev dikin û xwedî taybetmendiyên diyar in.

1.2.3. Objeyên oblîk

Berevajî objeyên rasterast, objeyên oblîk bi daçekekê tên nîşandan û ji aksiyona lêkerê rasterast bibandor nabin lê parçeyeke bingehîn a wateya lêkerê ne. Di Kurmancî da objeyên oblîk xwedî pozîsyoneke sabît in bi gelemperî û ew jî weku $S_{daç}OL$ (subje-obje-lêker) in. Ji bo Kurmancî em dikarin bibêjin ku objeyên oblik xwedî daçekên enstrumanî/komîtatîf (bi), lokatîf (li), ablatîf (ji) in.

Ez **ji** kûçikan ditirsim.

Ez **bi** keçikê dikenim.

Ez li mêrik mêze dikim.

Ew lêkerên ne-transîtîv in. Di Kurmancî da lêkerên ne-transîtîv bi gelemperî xwedî argumanekî ne û ew jî subje ne. Lê herçend di beşa berê da jî derbas bû dibe ku

hin lêkerên ne-transîtîve û xwedî du beşdaran jî hebin ku objeyên daçekî ên Kurmancî ji vê yekê ra mînak in. Lê hin pêveberên kompleks ên ne transîtîv ên Kurmancî carcaran weku ditransîtîv ango weku xwedî sê-valens tevdigerin:

*Ez henek*an *bi te* dikim. (ez, henek, te)

*Ew qirf*ên xwe *bi te* dike. (ew, qirf, te)

Ew *heqaret*ê li te dike. (ew, heqaret, te)

Ji mînakan jî diyar e ku ev cure lêkerên ku objeyên oblîk ên daçekî distînin, perçeya wan a nomînal weku objeya rasterast tevdigere (henek, qirf, heqaret) û ew perçeya nomînal cihê objeya rasterast digire, objeyê din jî weku oblîk di hevokê da bi cih dibin.

Ji bo objeyên oblîk ew giring e ku bi *têrkeran* neyên tevlihevkirin. Ew her du jî weku Frêzên Daçekî xuya dibin. Lê objeyên oblîk perçeyeke giring û mecbûrî ye ji bo lêkerê, ango di avaniya argumana lêkerê da cih digire:

Gulê li baxçeyî rûnişt. (têrker)

Gulê li min xist. (objeya oblîk)

Di vê hevoka ewil da *li baxçe* hoker e û ji hêla rola xwe ya semantîkî ve jî lokasyon e. Lê ya diduyan da bi avayekî yekser mirov nikare wê weku lokasyon binav bike û nebûna wê ji hêla konteksê ve dê şaşfemkirinekê derxe holê. Lê ya ewilîn ji hêla sentaksê ve jî weku Frêzeke Daçekî ya ne-argumanî ye û ne mecbûrî ye.

Ji bilî van, çend heb taybetîyên mîna avaniya hevûdinî (reciprocal), refleksîv ên objeyên oblîk dikarin ava bikin, ji bo parçeyên têrker ne mumkîn e:

*Gulê li xwe rûnişt.

Gulê li xwe xist.

Bi vî avayî objeyên oblik bi daçekan tên nîşandan û bi vê taybetiya xwe dişibin têrkeran. Lê wek objeyan, nikarin avaniyên hevûdinî (*reciprocal*) û refleksîv ava bikin.

1.2.4. Objeyên kuazî

Ew kom di Kurdî da avaniyeke berbelav e û objeyên lêkerên kompleks in. Lêkerên vê komê ji perçeyeke nomînal û lêkereke sivik pêk tên. Du heb avaniyên cuda

dikarin di bin vê beşê da bên nirxandin. Ya ewil koma ku objeyên xwe bi avaniya îzafeyê digirin mîna *pesndan, behskirin, bêrîkirin, qalkirin, fesadîkirin*. Ev rewşê (*case*) nîşan nadin lê di hema hema her tim avaniya îzafeyê, weku raveker-raveber ava dikin (Gündoğdu, 2018, 35). Ew herçend ne transîtîv bin jî, weku transîtîv tevdigerin û avaniyên mîna refleksîv an jî hevûdinî (*reciprocal*) dikarin çêkin:

a. Ew pesnên min didin.

b. Ew pesnên xwe didin.

c. Ew pesnên hev didin.

Herwiha testeke her tim derbasdar nebe jî bikaranîna wan a anaforîk, cihguhertina bi cinavkê pêkan e:

a. Ew pesnên [xwendekarê] didin û piştra [wê] dişînin (bikaranîna anaforîk)

Perçeya nomînal a van lêkeran ji bilî ravekereke cînavka xwedîtîyê (min, te…) an jî navdêrekê, piranî nikare bi rengdêran bê şayesandin, an jî bi hejmarên dereceyê bê hejmartin, ango ew îzafeyeke sînordar e:

*Ew pesnên baş didin.

*Ew qala mezin dikin.

Li gor Gündoğduyê (2018, 35), ew ne obje ne. Lê li gor me di Kurmancî da objebûn heta astekî weku spektrûmekê ye û ev kom, perçeya ku digirin herçend ne weku objeyeke rasterast, ya nerasterast an jî weku ya oblîk be jî bi astekê beşdarekî dixwazin. Herçend li gor lîteratûrê, ew beşdar weku obje neyên hesibandin jî di vê tezê da weku obje bên binavkirin û li ser taybetiyên wan ên semantîk û lêkerên wan bê sekinîn. Ji ber ku hin lêkerên din ên vê komê, dîsa ji lêkerên kompleks pêk tên û tu objeyeke din hewce nakin mîna *sondxwarin, nimêjkirin, bêhndan, rojîgirtin, sermagirtin* û hwd, -yên ku beşdar/hêmanekî teleb dikin bo me giring in. Lê herçend hêmaneke weku obje pêwist nebe jî, perçeya van lêkeran a nomînal dibe ku weku objeyeke rasterast tevbigere û bi avayekî gelekî sînordar dikare îzafeyê ava bike:

a. Ew *rojiya remezanê* digire.

b. Min *sermayeke giran* girtibû.

c. Ez ê *behna xwe* bidim.

(Gündoğdu, 2018, 125)

Ew herçend bikarin îzafeyê ava bikin jî hêmana ku digirin bi gelemperî bi du-sê peyvan sînordar e: **Ew behna dirêj didin*. Bi vî rengî ew mane diguhere. Ji bilî vê yekê, li gor me hêmanên lêkerên ewilîn (*mîna pesndan, behskirin, bêrîkirin…)* zêdetir taybetiya objebûnê nîşan didin û di zimanên din da jî piranî weku xwedî du valensê tevdigerîn:

a. Ich lob-e *sie*.

Ez pesindan.dema niha-şexsê yekem *wê.akûz*

b. Onu öv-üyor-um.

wê.akûz pesindan-dema niha-şexsê yekem

c. I praise *her.*

Ez pesindan-dema fireh wê

"Ez pesnê wê didim"

Di van mînakên ji zimanê Almanî, Îngilîzî û Tirkî da lêkera *pesndan*ê lêkereke xwerû ye û herwiha hêmana ku distînin li gor van zimanan weku objeya rasterast tevdigere. Lê mînakeke ji koma diduyan ku objeyekê nagirin, weku pêveberên xwedî yek-valens tên hesibandin, mîna *rojîgirtin*:

Ich fast-e.

Ez rojîgirtin.DN-1/y

Oruç tut-uyor-um.

Rojî reha girtinê-dema niha-1/y

I fast.

Ez rojîgirtin.1.2.4.5.6/y

"Ez rojî digirim"

Ji van mînakan jî diyar e ku ew her çend hemû zimanan da xwerû nebe jî hêmaneke mecbûrî teleb nake berevajî mînaka *pesindan*ê. Koma din ku wekû objeyên rasterast tevdigerin dîsa ji lêkerên kompleks pêk tên û mîna lêkerên *şûmikirin, hesûdîkirin, qirfkirin, strangotin*… netransîtîv in lê wekû objeya rasterast dema niha

da rewşa akûzatîf da ne û qertafên tewangê digirin, demên borî da jî di avaniya ergatîf da ne:

a. Ew heqaretê lê dikin.

b. Wan heqaret lê kir.

c. Ew hesûdîyan/hesûdîyê dikin.

Ji mînakan jî diyar e ku di vê rewşê da ew bi tevahî dişibin objeyên rasterast. Lê ew teqez nikarin bikaranînên anaforîk, refleksîv, hevûdinî bi cih bînin. Di beşa jêrîn da, rolên tematîk û dabeşîya wan a di zimanê Kurmancî da tên danasîn. Cihên sentaktîk ên objeyan ên ku bi van rolan ra têkildar in dê werin nîşandan. Armanc ew e ku bi awayekî sîstematîk bê eşkerekirin ka kîjan rolên tematîk bi çi avayî pozîsyon digirin, kîjan formên morfolojîk û bi kîjan rêzê xuyang dikin. Herwiha, çavdêriyên li ser avahiyên objeya quasî dê werin nîqaşkirin û sîstematîka objeyî ya Kurmancî dê bi berfirehî bê nirxandin.

1.3. Rolên Semantîk

Semantîk ji bo famkirina ferqên zimanan, avanî û hêmanên wan giring e. Ji ber ku ew maneyên bêje û avaniyên ku çêdikin li gor taybetiyên semantîk ên zimanan dikarin biguherin. Semantîk arî me dike ku ew ferq bi avayekî sîtematîk werin analîzkirin (Yonat, 2023b, 15).

Herwiha beşdarên hevokekê, pêşî li gorî rolên gramatîk (*grammatical roles*) ên ku beşdar hildigirin, weku subje, obje û objeya nerasterast ên di nav avahiya hevokê da tên pênasekirin. Ev rolên rêzimanî, nîşan didin ka beşdar çawa di avahiya sentaktîk a lêkerê da cih digirin. Lêbelê, lêker ne tenê li gorî rolên avahîsaziyê lê di heman demê da li gorî rolên semantîk jî tên pênasekirin û senifandin. Her lêker an cureyê lêkerê, bi hin beşdaran ra têkildar in. Ew beşdar ji bo rewş an çalakiya lêker dişayesîne xwedî hin rolên semantîk ên mecbûrî ne. Ev rolên semantîk (weku *aktor*, *muesîr*, *tecrubekar*) ji bo fêhmkirina wateya bûyerê giring in. Bi vî rengî, rolên rêzimanî pozîsyonên avahîsaziyê yên beşdaran di hevokê da diyar dikin; rolên semantîk jî eşkere dikin ka rolên rêzimanî çawa beşdarî wateya bûyerê an rewşê dibin. Bi gotineke din, rolên semantîk rewş an jî buyerê; rolên gramatîk jî clausê weku sentaktîkî dişayesînin (Givon, 2001, 105-106).

Herçend hat gotin, lariste, him di sentaktîkî him semantîkî li gor cureya lêkerê ava dibe û tê senifandin. Her lêker li gor hin rolên semantîk ra têkildar in. Di pênaseyên rêzimanî da ew rolên semantîk muhîm in û beşdarên bûyerê ên ku di bûyerê da xwedî peywirekî ne, bi rolên semantîk tên binavkirin.

Lê li gor Valin (2004, 23), ya giring ew e ku bê zanîn ew rolên semantîk her tim ne zelal û xwedî sînorên teqez in. Hin rolên sereke hene lê dibe ku ew jî di bin xwe da dabeşî şaxên din bin.

Wê demê dikare bê gotin têkilîyên cuda hene di navbera pêveber û argumanên wê da. Rolên gramatîk ên weku subje, obje; û rolên semantîk weku *muesîr* û *aktor*. Herwiha her pêveber xwedî hejmareke diyar a argumanan e; her yek ji van argumanan jî xwedî roleke semantîk a diyar e, ku di lîteratûrê da ew weku struktura argumanê (*argument structure*) tê binavkirin. Ji bilî wê mirov nikare bibêje ku rolên gramatîk her tim xwedî rolên sabît in (Yonat, 2023a):

Min	**tu**	**kuştî**	
kirde	obje	pêveber	sentaktîk
aktor	muesîr	pêveber	semantîk

Tu	**ji hêla min ve**	**hatî kuştin**	
kirde	hoker	pêveber	sentaktîk
muesîr	aktor	pêveber	semantîk

Ev du mînak xwedî avaniyên cuda, lê xwedî heman maneyê ne. Ji hêla rolên semantîk ve her çend subje *aktor* be jî di avaniya duyemîn da di rola *muesîr* a semantîk e.

Li gor Valîn (2004, 24), herçend sê heb rolên gramatîk (subje, objeya rasterast, objeya nerasterast) hebin jî hejmara rolên semantîk gelek in û li gor maneya lêkerê diguherin. Hin ji van ên sereke ew in: *aktor*, *tema*, *muesîr*, *çavkanî*, *enstruman*, *sûdmend (benefactive*), *lokatîf*, *asosîyatîf* û *şêwe* (*manner*). Ya ewil *aktor* (*agent*) weku

roleke tîpîk a jîndar, bûyera ku îfade dike bi daxwazî û awayekî qesdî bixwe dide destpêkirin û berpirsiyarê tevgerê ye (Valîn, 2004, 24; Yonat 2023a; Givon, 2001, 107).

Wê cîrana xwe qetl kiriye.

Ev lêker, *qetlkirin*, hewce dike ku subjeyek hebe ku vê yekê bi avayekî qesdî pêk bîne. Lê hin lêkerên din hene ku dibe ku bi qeza yan jî bi qesta subjeyê pêk bê. Weku mînak *şikestin, kuştin* qesdî be an jî ne qesdî be jî bi tevgera subjeyê weku destpêkerê bûyerê pêk tê. Lêkerên, *dan, şandin, xwarin, sorkirin, hişyarkirin* û hwd ku lêkerên transîtîv in, xwedî subjeya *aktor* in.

Muesîr, tişt an kes e ku ji ber bûyerê guherînekê derbas dike. Dibe ku jîndar yan ne jîndar be, lê ew bi qesdî bûyerê nade destpêkirin (Givon, 2001, 107). Herwiha ew di Kurmancî da bêyî daçek tên bikaranîn:

Çûk mir. (subjeya *muesîr*)

Wî *cam* şikand. (objeya *muesîr*)

Tema bi gelemperî dişibin *muesîr*an heta gelek zimannas wan ji hev venaqetînin. Lê bi gelemperî hêmana ku tê bicihkirin an jî cihê wê diguhere weku *tema* tê binavkirin. Lêkerên *avêtin, şandin, dan, birin, anîn, firotin, danîn, bicihkirin, kirin, xistin* hêmaneke di rola *tema*yê da dixwazin (Yonat, 2023a; Valin, 2004, 24). Herwiha ew jî di Kurmancî da îşaretkirineke cuda nastînin û li cihê objeya rasterast da tên bikaranîn di hevokên aktîf da:

a. Keçik *defterê* dide Şivên.

b. Lawik *kêvir* diavêje kûçik.

c. Gulê *qelem* danî ser maseyê.

Li gor Valin (2004, 24), rolên semantîk ên mîna *wergir*, lokatîv, *hedef* bi gelemperî bi *tema*yê xuya dibin ji ber ku argumanên *tema* bi gelemperî guherîneke xwedîtîyê, cihê an jî lokasyonê derbas dikin. Ji ber vê yekê bi *muesîr*an zêde xuya nabin.

Hedef (*goal*) yek ji roleke din a semantîk e. Berê tevger an jî objeyê ye, ango hin tişt ber bi wê ve hereket dikin (Yonat, 2023a). Lê dibe ku xwe bi avayekî razber jî bê bikaranîn, weku ji bo nifir, xwezî, dîayan jî *hedef* hebe. Ew rola semantîk xwedî binbeşan e. Mîna, *wergir (recipient)*, *sûdmend (benefactive*), *muxatab (*addressee), *xwedan (possessor)*, *lokatîf* û hwd.

Haig û Thiele (2014b, 2014a), di xebata xwe da nîşan dane ku *hedefên lokatîf* her tim pişt-lêker (post-verbal) in di Kurmancî da:

a. Ez diçim/têm *malê*.

b. Wî zarok şandin *Stembolê*.

c. Jinik ket *hundir.*

Herwiha lêkerên mîna *derketin, birin, anîn, danîn, kirin, xistin*… lêkerên xwedî *hedef*ên lokatîf in û *hedef*a wan a lokatîf ne jîndar e. Dema *hedef*eke jindar bigirin bi *ji…ra*yê tên nîşandan û ew jî weku *hedef*ên *sûdmend* - *wergir* tên binavkirin:

a. Ez *ji te ra* avê tînim.

b. Ez *ji wî ra* peran dişînim.

c. Ez *ji wê ra* sêvan dibim.

Herwiha Gündoğduyê (2018, 312-313) di xebata xwe da nîşan daye ku daçekê *ji…ra* (for/to) xwedî karakterekî *wergir-sûdmend* e, gelek caran di şuna daçeka *ji bo…* -ku daçekeke yekser ji bo rola *sûdmend* tê bikaranîn, dikare bê bikaranîn û dikare bi tenê bi lêkerên ergatîv ra bê dîtin. Lê dibe ku bê pirsîn gelo çima lêkera şandinê *hedef*a xwe ya jîndar berî pêveberê û bi daçekan digire lê lêkerên mîna *firotin, dan, avêtin hedef*ên xwe piştî pêveberê û bêyî daçek digirin. Gündoğdu (166) vê yekê wîsa tespît dike, dibe ku *hedef*a lêkera *şandin*ê a *ji…re* digire,weku *hedef*a *wergir* xuya bike lê bi eslê xwe xwedî taybetiyeke *sûdmend-wergir* e. Lêbelê lêkerên mîna dan, *firotin, avêtin hedef*ên xwe yên jîndar piştî pêveberê digirin ji ber ku *hedef*ên wan *wergir- xwedan* in. Ango ew ji yekî derbasî yekî din dibin û êdî aîdî wan in û ew tê wê maneyê ku Kurmancî *wergir-xwedan*an (*recipient-possessor*) piştî pêveberê û *wergir-sûdmend* jî berî pêveberê û bi daçeka *ji…re*yê nîşan didin:

a. Zilam kîloyek pembo firot pîrikê.

b. Elî qelema xwe da Gulê.

Ji bo lêkera avêtinê him *hedef*a lokatîf him jî ya *xwedan* pêkan e, ku ew her du jî piştî pêveberê tên her tim:

a. Topê bavêje min! (*xwedan*)

b. Topê bavêje erdê. (*lokatîf*)

(Gündoğdu, 166)

Ji bilî *hedef*ên *wergir* û *sûdmend ji…ra* herwiha ji bo *hedef*ên *muxatab* jî tê bikaranîn:

a. Min *ji wan ra* stranan got.

b. Ez *ji we ra* meselekî bibêjim.

(Gündoğdu, 2018, 315)

Heta niha dikare bê gotin ku daçeka *ji…ra* di Kurmancî da xwedî wan rolan e: *wergir-sûdmend* (şandin), *wergir-muxatab* (gotin), *wergir-xwedan* (dan). Herwiha *hedef*ên lokatîf piştî pêveberê ne, lê *hedef*ên bi *ji…re*yê berî pêveberê bi cih dibin.

Di Kurmancî da cureyeke *hedef*ê a din heye ku xwedî avanîyeke xasî xwe ye. Ew jî dîsa ji lêkerên kompleks ra tên dîtin û bi avaniya îzafeyê pêk tên:

a. Ew neqlî/*transferî/derbasî amedê* bû.

b. Min xwarin *valayî sênikê* kir.

c. Min *barî Amedê* kir.

d. Ez siwarî hespê bûm.

Di van mînakan da hêmana nomînal a lêkerê veqetandeka *-î*yê digire û bi *hedef*ê îzafeyê çêdike. Mînaka *siwarbûn* çend heb lêkerên din li gor devokan *hedef*ên xwe bi daçeka *li*yê jî dikarin hilbigirin: Ez li hespê siwar bûm. Lê di vê komê da hin lêkerên din hene ku *hedef*a ku digirin ne weku lokatîf e: *aşiqî […] bûn, beşdarî/tevlî […] bûn, mêzeyî […] kirin*. Ew komeke hevpar diyar nakin, ji ber vê yekê hewcedarî nîqaşekê ne.

Komeke *hedef*ên din jî ew e ku, herçend tu caran bi avayekî sîstematîk neyên behskirin jî *hedef*ên lokatîf ên ku bi grûbeke lêkerên xwedî taybetîyên hevpar tên bikaranîn û daçeka *bi…va* distînin:

a. Wê weris *bi darê ve* girê da.

b. Ehmed poster *bi diwêr ve* zeliqand.

c. Gulê broş *bi îşlîgê xwe ve* kir.

Ev lêker bi gelemperî gihandina tu tiştan nîşan didin û objeya xwe ya nerasterast bi daçeka *bi…va* yê nîşan didin. Di mînaka dawî da herçend êdî perçeyeke lêkerê be jî ew jî ji hêla semantîk ve heman rolê nîşan dide. Herçend weku *hedef*ên lokatîf ên tevger an jî hereket nebin jî *hedef*ên lokatîf in. Gelek caran jî weku sentaktîk mecbûrî ne:

a. *Ehmed poster zeliqand.

b. *Gulê broş kir.

Berî ku derbasî rolên din bin li vir giring e ku bê nîşandan hin lêker ku bi eslê xwe rasterast transîtîv nebin jî weku transîtîv tevdigerin. Lê mirov nikare subjeya wan weku *aktor* û objeya wan jî weku *muesîr* bi nav bike. Ew ê di beşa diduyan da bi hûrgilî bê niqaşkirin lê da ku li gor avaniyan jî ev rol baştir bên fem kirin hin mînak dê baş bin:

a. *Zilam* kûçikî dibîne. (rola pêhesîner [*perceiver*])

b. *Gulê* dengekî dibîhîze. (rola pêhesîner [*perceiver*])

c. *Ez* wê dizanim/fam dikim/ji bîr dikim (rola têgihîştîner. [*cognizer*])

Her çend mirov nekare objeya wan teqez bixe komeke sabît jî bi gelemperî dikarin di bin bana tecrubekar da bên bicihkirin. Subjeya wan weku pêhesîner (*perceiver)* ku bi sehekan tên hîskirin û têgihîştîner (*cognizer*) ku bi avayekî kognîtîf di rewşê da cih digirin, dikarin bên nîşandan. *Famkirin*, *jibîrkirin, ferzkirin*, dîsa dikarin weku xwedî subjeya têgihîştîner (*cognizer*) bên pênasekirin û herwiha laristeyên komplementî (*sentential complement*) jî li gor lêkerên din rehettir dikarin bigirin:

Min bihîst/ferz kir/dît/zanîbû ku ew doh hatiye.

Herçend hin ziman wan subjeya van lêkeran bi avayekî cuda ya rêzimanî nîşan bidin jî (Valîn, 2004, 26), di Kurmancî da ew îşaretkirineke cuda nastînin.

Heta niha ew rol bi gelemperî rolên semantîk ên lêker-taybetî (*verb-specific*) bûn. Ji bo rewşa rolên ku bi taybetî ji bo hin lêkeran tên bikaranîn weku Tekilîya Tematîk (*Thematîk Relation*) tê binavkirin. Herweha rolên mîna *aktor*, enstruman, pêhesîner (*perceiver*), têgihîştîner (*cognizer*), tecrubekar "têkilîyên tematîk" in.

Tablo 1.3.1. Rolên Tematîk

Rolên ku ji bo hin lêkeran spesîfîk in (*Verb Specific Semantic Roles*)		Rolên Tematîk
dan dazdan kuştin		Subjeya aktor (*agent*)
fikirîn zanîn ferzkirin	Subjeya têgihîştîner (*cognizer*)	Tecrubekar (*experiencer*) - datîv
bihîstin dîtin	Subjeya Pêhesîner (p*erceiver*) Objeya Stimulus	
hezkirin nefretkirin	Subjeya hestyar (*emoter*)	
dan (…) firotin (…) avêtin (…)	Wergir-xwedan (*recipient-possessor*)	Hedef (*goal*)
anîn(…) birin(…) çûn(…)	Lokatîf	
(pi…va) zeliqandin (pi…va) kirin (pi…va) girêdan	Lokatîf	
(ji…ra) gotin	Muxatab (*addressee*)	
(ji…ra) şandin	Wergir-sûdmend	

(ji…ra) anîn	(recipient-benefactive)	
(…) anîn (…) şandin (…) dan		Tema (*theme*)

Ji bilî vê, ew rolên semantîk ên bi gelemperî ji bo lêkerên transîtîv bûn, -lê ne hemû. Gelek rolên din ên semantîk hene ku bi piranî bi lêkerên ne-transîtîv xuya dibin. Yek ji van enstruman e. Ew beşdarê ku weku tîpîk ne jîndar e û ji hêla *aktor* ve tê bikaranîn da ku tevgerê pêk bîne (Givon, 2001, 107; Yonat, 2023a). Di Kurmancî da bi daçeka *bi*yê tên dîtin:

a. Wê mix *bi çakûç* kuta.

b. Argeş *bi miftehê* derî vekir.

Lokatîf, bi gelemperî şênber û ne jîndar in. Herwiha ku bûyer lê pêk tê (lokative state) an jî weku li jor jî hat nîşandan ku beşdar ber bi wê ve hereket dike (lokative motion) (Givon, 2001, 107). Ji *hedef*ên lokatîf ferqa wê ew e ku ew piranî ne perçeyeke mecbûrî ye ango ji bo lêkerekê spesîfîk nînin. Di Kurmancî da bi daçeka *li*yê xuya dibin:

a. Ew *li Amedê* dijî.

b. Diya min *li bexçe* rûdine.

Çavkanî (Source), ew hêman e ku kes an jî tişt jê dertên û ber bi cihekî din ve hereket dikin (Yonat, 2023a). Ji bo vê rolê her tim daçeka *ji*yê tê bikaranîn. Gîvon wan jî dixe nav koma jorîn a bi navê lokatîv lê di Kurmancî da ew daçek ne ji bo cihan e bi tenê û dibe ku kes an jî tiştek jî bibe çavkanî:

a. Kurik *ji Ehmed* 50 mîlyon dizîye.

b. Bavê wê *ji dewletê* pere digire.

Şêwe (*Manner*) şiklê ku bûyer pêk tê an jî subje wê bi çi avayî pêk tîne, îfade dike (Givon, 2001, 108):

Wê *bi dizî/ (bi) eşkere/* xwarin xwar.

Roleke din jî *asosîyatîf* (*associative)* e ku rola wê ya di bûyerê da bi *aktor*, *muesîr* an jî bi *datîv*ê hevşib e, ango bi wan ra şirîk e. Di Kurmancî da bi daçeka *bi*yê û *bi…ra*yê tê bikaranîn. *Bi…ra* bi gelemperî beşdarên jîndar digire. *Bi* dibe ku yên jîndar an jî yên ne jîndar qebûl bike:

a. Gulê *bi diya* xwe dixebite.

b. Zelal *bi min ra* tê.

Herî dawî weku li jor jî hat behskirin lêkerên kompleks ên ku objeyê bi avaniya îzafeyê digirin hene ku objeyan wan cuda ava dibe:

a. Me behsa/qala/bêrîya wê kir.

b. Me fesadîya wê kir.

c. Me alîkariya wê kir.

d. Em hînî Kurdî bûn.

Em pêşnîyaz dikin ku objeyên wan lêkerên piranî razber in û weku rola semantîk a *mijar/topîk* dikarin bên hesibandin.

Di vê beşê de, rolên semantîk ên objeyan, bi lêkerên ku wan hildigirin bi avayekî gelemper hatin lêkolînkirin. Di encama lêkolînê de, hatiye dîtin ku objeyên rasterast bi piranî rolên *muesîr* an *tema* hildigirin, lê yên weku *stimulus* jî hene. Herwiha objeyên nerasterast rolên weku *hedef* ên *wergir*, *lokatîf* û *sûdmend* digirin. Ji bilî wan, hatiye destnîşankirin ku hin lêker di têkiliyên xwe yên bi objeyên razber ra rolên taybetîtir ên weku *topîk/mijar* nîşan didin. Ev cihêrengî nîşan dide ku cureyên objeyan di Kurmancî da ne tenê ji hêla formê ve lê di heman demê da ji hêla semantîkê ve jî xwedî avahiyek dewlemend û tevlihev in.

1.4. Ferqên di Navbera Arguman û Têrkeran (Adjunct) da

Di avaniyên zimanan da têgehên mîna "subje", "objeya rasterast", "objeya oblîk" her tim kategorîyên mîna sabît û diyar tên bikar anîn. Lê zemîna teorîk a piştî van têgehan gelek caran tevlihev e û xwedî gelek nîqaşan e di lîteratûrê da. Dema parçeyek di destpêka hevokê da cih bigire ew nayê wê wateyê ku ew subje e, yan jî dema hêmanek nêzî lêkerê be dîsa ew nayê wê maneyê ku ew obje e. Herwiha, ew

hêman dibe ku di zimanên din da bi awayên gelekî cûrbicûr bên îşaretkirin û bi pênaseyên tradîsyonel ve hevgirtî nebin. Ji ber vê yekê, ji bo pênaseya hêmanên mîna "subje", "obje"; an jî ew di kîjan hevokan da mecbûrî an jî kontekstî ne diyar bikin, pêdivî bi hevveqetandinên teorîk heye. Di vê astê da, cihêtîya arguman û têrkeran a ku hêmanan ji hêla mecbûrîbûn, rolên teta, sentaktîkî û hwd. dipîvîne, weku nîqaşek di lîteratûrê cihê xwe digire.

Li gor nêrîna tradîsyonel, pêveber ji xwe û ji hin beşdarên din pêk tê. Hinek ji van beşdaran ji hêla pêveberê ve tên birêvebirin. Ew Beşdar ên ku hebûn û şiklê beşdarbûna wan a li rewşê bi hin lêkerên partikûlar ve eleqedar in weku arguman an jî Gramera Têkilîyî (*Relational Grammer)* da jî weku komplêment (*complement*) tên binavkirin; yên ku bi lêkereke taybet ve eleqedar nînin weku *têrker* tên binavkirin (Koenig û yên din, 2003, 68; Forker, 2014, 27) û ew her du xwedî taybetiyên cuda ne ji hêla sentaks û semantîkê va.

Weku mînak di hevoka *Ez sêvan bilez dixwim* da lêkera *dixwim* navdêra *sêvan* bi rêve dibe. Lê perçeya *bilez* ji hêla lêkerê ve nayê bi rêvebirin; lêkerê an jî hevokê bi tevahî modifiye dike. Ew perçe bi gelemperî hoker an jî perçeyên hokerî ne ku bi gelemperî weku têrker tên binavkirin (Matthews, 1981, 121). Parçeyên weku *sêvan* jî weku arguman tên binavkirin û li gor lîteratûrê lêkera *xwarin*ê xwedî agahiyê ye derheqê hejmar û cûreya beşdarê xwe da, ango ew di lêkerê da weku leksîkal kodkirî ne.

Ji ber xebatên curbicur ên di vê qadê da termînolojî û naverok dibe ku ji hev gelekî cuda bin. Tesniere vê ferqê bi terminolojiya *actant*an rave dike ku li gor wî ew beşdarên lêkerê ne. Ew jî objeya rasterast, objeya nerasterast û Subj ne. Hevoka jor a *Ez sêvan dixwim* subj û objeya rasterast dihewîne. Ango ew *actant* girêdayî valensa pêveberê ne. Li gor wî parçeyên din (weku *bilez*) nakevin kategoriya actantan û ew jî *circonstant* in. Ew peyv refereyî cih, şert û mercên pêvajoyê dike (Tesniere, 1959, vgz. Matthews, 1981, 122) ku em jê ra dibêjin têrker.

Li gor Quirk et al. (1972, vgz. Matthews, 1981, 122) Her du obje jî (objeya rasterast, objeya nerasterast) di temambûna pêveberê da xwedî rolekê ne. Lê hokerek xwedî roleke wîsa nîne, ew têrker e. Lê Quirk naveroka van têrkeran ji *circonstant*ên

Tesniere firehtir digire. Weku mînak *ez sêvan bilez dixwim* da *bilez* têrker e. Lê *ez sêvan datînim ser maseyê* da *ser maseyê* komplîmentekê daçekî (adverbial) ye û ew jî tê wê maneyê ku valensa pêvebera *danîn*ê him objeyekê him jî komplîmenteke cihî taleb dike.

Weku Chomsky jî Frêzên Lêkerî (Verb Phrase) û Frêzên Pêveber (*Predicate Phrase*) ji hev cuda dike ku Frêzên Pêveber di hevoka jor da hemû parçeyên ez *sêvan bilez dixwim* dihewîne(Chomsky, 1965, vgz. Matthews, 1981, 122); lê avaniya piçûktir a bi navê Frêzên Lêkerî bi tenê *sêvan dixwim* dihewîne. Vê frêzê da parçeya *sêvan* bi valensa pêveberê ve eleqedar e û li gor valensê sînordar dibe. Chomsky wê bi "*strict subcategorization* (bin-kategorîzasyona şid) "ê ku di sedsalên 1960an da pêş xistiye, rave dike. Li gor wê, hemû lêker xwedî hin subcategoriyan in û ew kategorî jî (*complement*) berê ve diyar û teqez in ji bo wê lêkerê (Matthews, 2003, 3025). Weku mînaka *ez radikevim* da lêkera raketinê bi tenê subjeyekê dixwaze. Lê dibe ku ji bo lêkereke din komplêmenteke cihî (ew *li malê* ma)*, an* jî yeka direksîyonel (ew çû malê), an jî yên pêvajo û frekans (*duration û frequency*) (ew *saetekê* didome) pêwist be. Hin ji wan dibe ku Frêza Daçekî (*Preposition Phrase*) bin û lê li gor Chomsky ew hemû di bin Frêzên Lêkerî da ne û ew dikare objeya nerasterast, hokerên çawaniyê jî bihewîne.

Piştî wan jî formulasyona Longacre (1965, vgz. Matthews, 1981, 122-123) tê ku ew vê rewşê bi du têgehan rave dike. Ew têgeh "nukleus" û "periphery" ne ku li gor wan laristeyek ji nukleusê û peripheryê pêk tê. Di mînaka *Ez her tim sêvan bilez dixwim* da *ez sêvan dixwim* nukleus e, ango mesaja aslî ew e û her *tim* û *bilez* jî peripherya hevokê ne.

Nêzîkatîyeke din jî teorîya Gramera Têkilîyî (*Relational Grammar*) ye. Li gor vê teoriyê lêker bi tenê dikare sê terman bigire: subje, objeya rasterast û objeya nerasterast. Hêmanên ji bilî vana non-terms an jî oblîk in (Matthews, 1981, 122-123). Lê ew kategorizasyon li gor kîjan krîteran çêdibe meseleyeke serbixwe ye û li ser wê nêrînên cuda hene. Di vê beşê da dê krîterên sereke û yên herî qebûlbar bên nîqaşkirin.

Zimannas hemfikir in ku *sêvan* a di hevoka *ez sêvan bi lez dixwim* da ji perçeya *bilez* cuda ye û di kategorîzasyona wê da hin krîter hene. Berî ku ew krîter bên nîşandan

divê bê zanîn ku bi gelemperî encameke wisa derdikeve holê ku ew ferq ne kategorîk e lê weku spektrûmekê ye û xwedî hin krîterên semantik û morfosentaktîk in. Her çend nikare bê gotin ku ew krîter her tim û di hemû rewşan da teqez in disa jî ew nêzikatî îmkanê dide me ku pirsên li ser ferqa wan bi awayekî esnek lê sîstematîk bibersivînin.

Herçend hat nîşandan ku hin lêker agahiyên beşdarê semantîk weku leksîkî di xwe da kod dikin û hinek jî nakin. Weku mînak di hevoka *Zelalê nan da pisîkê* da lêkera *dan*ê bi gelemperî *aktor*ekî, *tema*yekî (tişteke ku ji cihekî hereketî cihekî din dike) û *hedef* an jî *wergir*ekî dihewîne. Ango ji bo wê lêkerê hewce ye ku kesek hebe ku karê dayînê bike, tiştek hebe ku bê dayîn û dîsa kesek hebe ku ev tişt bigihêjîyê. An jî:

Gulê *îro* zarok *bi erebeyê* birin dibistanê.

Di vê hevokê da Frêzên Navdêrî *Gulê, zarok û dibistan wisa* tê bawerkirin ku beşdarên kodkirî ên lêkera *birin*ê ne, ango argumanên wê ne. Lê *îro, bi erebeyê,* Frêzên Daçekî ne ku her çend qebûleke gerdûnî nebe jî weku tîpîk têrker tên qebûlkirin. Ew bi gelemperî konteksê diyar dikin û hebûna wan girêdayî lêkerê nîne, berevajî vê girêdayî daxwaza axêver e ku dixwaze zêdetir agahîyan bide. Di heman demê ew Frêzên Daçekî dikarin bi gelek lêkerên din xuya bin.

Hin zimannas (Koenig û yên din, 2003; Matthews, 1981, 124; Forker, 2014) li ser hin krîteran disekinin ku li gor wan ew krîter ferqa arguman û têrkeran dide ber çavan. Hin ji van krîteran yên sereke ew in:

- Mecbûrîbûn an jî opsiyonel bûn
- Nependîtî (Latency)
- Bisînorbûna bi hev ra xuyabûnê (*Co-occurrence restrictions*)
- Têkilîyên Gramatîk (*Grammatical relations*)
- Dubare bûn û bêhempa bûn (*Iterability and uniqueness*)
- Sînordarbûna peyvrêzîye (*Word order restrictions*)
- Îşaretkirina morfolojîk

Ew made di nava literatûrê da bi gelemperî yên derbasdar in û bi testan hatine diyarkirin. Dîsa jî nikare bê gotin ku ew made kanonîk in. Her çend dibe ku li gor zimanan ew taybetî cuda bin jî bi gelemperî bi van mirov dikarê nêzî hemû zimanan be. Lê li gor Diana Forkerê (2014, 28) avaniya argumanên semantîk ên lêkerê gerdûnî ye ji ber ku lêkerên ku refereyî rewşeke heman dikin xwedî heman argumanên semantîk in. Weku mînak lêkera *xwarin*ê weku *yemek*a Tirkî, *essen*a Almanî, *xorden*a Farsî dikare ji bo heman rewşê bê bikaranîn û argumantên wan ên semantîk jî heman in: *aktor*, *tema*.

1.4.1. Krîtera yekem: mecbûrîbûn (obligatoriness)

Krîterek e ku zimannas gelekî li ser disekinin mecbûrîbûn e. Bingeha wê jî ew e ku arguman ji bo pêveberê ve hewce ye da ku maneya xwe temam bike. Ew hem weku semantîk hem jî carcaran weku sentaktîk mecbûrî ne. Lê têrker opsîyonel in û ji bo cih, dem, vasiteyan ango bi armanca zêdetir agahiyan dîyar bikin tên bikaranîn.

Herwiha ew jî di nava xwe da weku mecbûribûna semantîk û sentaktîk dibe du beş. Ya ewil ew argumanên semantik in ku ew da ku pêveber maneya xwe temam bike, hewce ne (Koenig û yên din, 2003, 72). Lê têrker ne hewce ne ji bo temambûna pêveberê:

Zilam ji baxçeyê xwe sêv dan me.

Di vê mînakê da bi awayekî tê hîskirin ku *sêv* parçeyekî ji lokasyonê (ji baxçeyê xwe) giringtir hemanê bûyerê ye. An jî dema yek bibêje "dixwe" ew ê pirsên "çi, kî" dê bi xwe ra bîne. Ango hevoka "dixwe" ji hêla sentaksê ve ne negramatîk e lê ji hêla maneyê ve kêm e û negramatîk e.

Ya duyem, ango sentaktîk oblg.ê da arguman ji hêla sentaksê ve pêwist e û tu caran nikare bê avêtin. Mînak, hevoka m*in pere kir çente* bêyî argumana *çente* weku **min pere kir* negramatîk e. Ango argumanên semantîk dikarin ji hêla sentaksê ve bên avêtin dema ku ji kontekstê diyar bin, lê berevajî vê argumanên ji hêla sekntaksê ve mecbûrî ne divê her tim di hevokê da xuya bin.

Lê herçend Matthews (1981, 125) dibêje argumanên kanonîk ji hêla sentaksê ve mecbûr in lê têrker opsîyonel in jî, hin caran têrker jî mecbûrî ne û dema di hevokê da

cih negirin ew ê negramatîk be. Mînak, lêkera *jiyîn*ê di maneya îkametkirinê da bê bikaranîn ew hem semantîkî hem jî sentaktîkî mecbûrî ye ku PP bistîne:

a. Ew li Amedê dijî/îkamet dike.

b. *Ew dijî/îkamet dike.

Çawa ku tê dîtin dema PP neyê bikaranîn, hevok xwedî maneya jîndarbûnê ye û di maneya qesdî da negramatîk e. Ew rewş carcaran di hin lêkeran da ji bo hokera çawanîyê û ji bo ya demê jî derbasdar e. Mînakeke Tirkî:

a. Onlar bana iyi davrandılar.
"Ew bi min ra baş tevgerîn"

b. *Onlar bana davrandı.
"Ew bi min ra tevgerîn"

a. Program bir saat sürdü.
"Bername saetekî domî"

b. *Program sürdü.
"Bername domî"

Li gor vê dikare bê gotin ku Tirkî da hin lêker bêyî Frêza Daçekî û Hokerên xwe nikarin bên bikaranîn, ango ew weku argumanan tevdigerin û teqez nikarin bên avêtin.

Çawa ku heta niha hat gotin, ew spektrûmek e û hin parçe ji hin parçeyên din ên ku weku komplîment in, zêdetir taybetiyên komplîmentan nîşan didin. Mesela, Hoker nikarin bibin subjeya hevoka pasîf û nikarin ji bo pirsa çi bibin bersiv.

1.4.2. Krîtera duyem: nependîtî (latency)

Ew krîterek e bi tevahî semantîk e (Matthews, 1981, 125). Ew bi avayekî şid bi krîtera mecbûrîbûnê ve tekîldar e. Li gor vê heke di hevokê da argumanek nehatiye gotin, hewcedarî şîroveyê ye û li gor kontekstê dibe ku bê zanîn. Jêderxistina cînavkê, (*Prodrop*) an jî objeyê (*Object drop*) an jî ne karanînan anaforayê (*null anaphora*) ji bo yekê çend mînak in. Herçend ew di hevokê aşîkar nebin jî ji hêla semantîk ve weku arguman ten hesibandin. *Koma me qezenç kiriye* herçend di vê hevokê da maç, setranç, pêşbazî… derbas nebe jî li gor konteksê tê zanîn ku objeya vê lêkerê heye û em weku semantîkî wê di hişê xwe da temam dikin. Lê heke konteks tune be ew ê teqez bê mane

be. Dema ew ji bo dem, cih, şert û mercên din binêrin ew neyên gotin jî dê mane bi tenê serê xwe temam be. Heman tişt ji bo laristeyan jî derbasdar e: Di hevoka *Min li filmekî temaşe kir dema tu çûyî da* hokera *dema tu çûyî* bê derxistin ew ê disa hevokeke serbixwe be weku *Min li filmekî temaşe kir*. Herwiha li gor Matthews (1981, 126) ew parçeyên ne mecbûrî, ango têrker gelek caran ji bo konteksê zelaltir bikin dibe ku lazim bin. Lê dema *ew mirovekî xirab e* ji hevoka *ez difikirim ku ew mirovekî xirab e* derkeve ew ê qet maneya ku armanc e, nede. Lê di avaniyên pasîf da *aktor* bi gelemperî nayê gotin:

Pisîk hat kuştin.
Muesir pêveber

Kê pisîk kuştiye ne diyar e. Li gor Forkerê (2014) wê demê *aktor* di avaniya pasîv da şîroveyê hewce nake û ew weku argumaneke semantîk nayê hesibandin, herçend di hevokeke aktîf da *aktor* be jî. Forker bi vê balê dikişîne ser serbixwebûna argumanîyê a ji avaniyê.

1.4.3. Krîtera sisêyan: bisînorbûna pevre xuyabûnê (co-occurrence restrictions)

Argumanên kanonîk bi hin pêveberan sînordar in lê têrker (*têrker (adjunct)*) berevajî vê hema hema mumkîn e ku bi hemû pêveberan bên bikaranîn (Matthews, 1981, 124–125, 127; Koenig û yên din, 2003, 72–75). Ew giring e ku bê zanîn ew krîter ji bo veqetandina obje û têrkeran pêveberan weku xala destpêkê digire ne Frêzên Navdêrî.

Weku mînak lêkera jîn/jiyînê Frêzeke lokasyonê hewce dike. Lê ji bo lêkera revîn an jî meşînê ew ne mecbûrî ye. An jî lêkera *rijandin*ê objeyeke ku maneya vê lêkerê ra lihev dike, digire.

Herweha li gor Forkerê (2014), ew krîter du-alî ye. Ya yekemîn alîyê wê yê morfosentaktîk e. Hin lêker argumanên xwe bi hin daçek, rêzeke sabît an jî rewşekê distînin. Weku mînak lêkera *jîn*ê daçeka "li"yê hewce dike. Ya duyemîn jî aliyê wê yê semantîk e. Li gor vê, lêker bi tenê dikarin argumanên ku bi maneya lêkerê li hev dikin bigirin, weku *tema*, *hedef*, *muesîr*.

1.4.4. Krîtera çaran: dubare bûn û bêhempa bûn (iterability and uniqueness)

Li gor vê krîterê, her arguman xwedî roleke teta ye û hebûna hêmaneke ku xwedî heman teta rolê ye, ne mumkun e:

*[Zelal] [Ronya] dimeşe.

Lê têrker (adjunct) wisa nînin, di avaniya pêveberekê da dikare gelek têrker hebin (Bresnan, 1982. Aktaran, Gündoğdu, 2018, 11).

Wê [îro] [li malê] sparteka xwe [saet 10an da] [gelekî baş] çêkir.

Di vê hevokê da du hokerên demê, yeka cih û yeka çawaniyê bi hev ra hatine bikaranîn. Dîsa jî ew krîter jî bi tenê serê xwe ferqeke teqez nikare xêz bike ji ber ku frêzên enstrumanî gelek caran nikarin dûbare bin:

a. *wî derî [bi miftehê] [bi kêrê] vekir.

b. wî derî [bi miftehê] vekir.

Berevajî argumanan, Frêzên İnstrumanî ya di vê hevokê da ne sentaktîki ne jî semantîkî mecbûrî ye da ku pêveber maneya xwe temam bike; ne jî pêveberê roleke semantîk daye wê. Lê dîsa jî nikarin dubare bin.

1.4.5. Krîtera pêncan: têkiliyên gramatîk (grammatical relations)

Ev krîter bi tevahî sentaktîk e û dişibê krîtera Tesniere. Li gor Gramera Têkilîyî argumanên kanonîk term in, weku Subj, Objeya Rasterast û Objeya nerasterast; lê têrker her tim non-term in, weku oblîkan. (Forker, 2014) Li gor kategoriya wan jî objeya rasterast û objeya nerasterast bi piranî frêzên navdêrî ne, hin rewşan da jî (objeya nerasterast) frêzên daçekî ne. Heman tişt ji bo têrkeran nikare bê gotin û kategoriyeke wan diyar an jî sînordar tune ye (Carnie, 2011). Herwiha ew jî ferqeke pêbawer xêz nake ku em têrker û argumanan ji hev veqetînin ji ber ku gelek caran nakokîyan nîşan dide. Çawa ku li jor jî hat nîşandan gelek hêman hene ku her çend ne Term bin jî weku arguman tevdigerin:

a. Ez li Amedê dijim.

b. *Ez dijim.

a. Ew bi min ra baş tevgerîn.

b. *Ew bi min ra tevgerîn.

1.4.6. Krîtera şeşan: sînordarbûna peyvrêzîyê (word order restrictions)

Ew krîter li ser pozîsyona arguman an jî têrkerê ya li gor pêveberê ava dibe. Li gor vê arguman nêzî pêveberê disekinin lê têrker bi gelemperî azad in ku di nava hevokê da cih bigirin.(Carnie, 2011; Forker, 2014*)*. Li vir testeke bi navê "*do so"* tê bikaranîn da ku têrker û argumanan ji hev veqetînin. Bi vê testê, *do so* cihê lêkerê û komplêmentên wê digire û weku parçeyeke yekser tevdigere, têrkeran li derve dihêle:

Robin read the book on the train, while Leslie was doing so on the bus.

[do so = reading the book; on the bus = têrker]

(Robin di trênê da pirtûk xwend, Leslieyê jî di otobûsê da [ev yek kir]

(Tiştê ku tê kirin: pirtûk xwendin; di otobûsê da = têrker)

(Culicover & Jackendoff , 2005. vgz., Gündoğdu, 2018, 14)

Ji bo Kurmancî dibe ku mînakeke hevşib wiha be:

Ronyayê li mitbaxê xwarin çêdikir, Ehmed jî li mala xwe (ev yek dikir).

Ev yek dikir=xwarin çêdikir; li mitbaxê =têrker.

Ew krîter dijwar dibe ku mirov li ser zimanên ku xwedî peyvrêzîya azad in, bikar bîne. Herwiha hin têrker jî xwedî peyvrêzîyeke şid in gelek caran:

a. Ew zû dimeşe.

b. *zû ew dimeşe.

c. *ew dimeşe zû.

Di van hevokan da hokera çawanîyê xwedî rêzeke şid e û bêyî cihê xwe yî berî pêveberê ew negramatîk dibe. Di heman demê de, dema du hokera cihî ku yek ya din dihewîne hebe dîsa xwedî rêzeke diyar e:

a. Ez li mala xwe di odeya mezin da rûdinim.

b. *Ez di odeya mezin da li mala xwe rûdinim.

b. Ehmed îro di saet 6an da spor dike.

b. *Ehmed di saet 6an da îro spor dike.

a. Dîya wê li nexweşxaneyê di odeyekê da radizê.

b. *Diya wê di odeyekê da li nexweşxaneyê radizê.

Bi van mînakan jî diyar e ku heke cihek ya din dihewîne, divê ew pêştir bê di rêzê da. Ew mînak dîsa nîşan didin ku ew krîter jî ne her tim pêbawer e.

1.4.7. Krîtera feftan: îşaretkirina morfolojîk (morphological marking)

Ew krîter xwe dispêre îdiaya ku di avabûna wan a sentaktîk da arguman xwedî kodkirineke morfolojik a sabît in; weku îşaretkirina rewşê, daçek an jî rêza wan a di laristeyê da. Ji ber ku ew di leksîkonê da berê ve dîyar in (Gündoğdu, 2018, 16).

Gulê min dibîne.

Di vê hevokê da *min* di rewşa akusatîv da ye û li şuna wê navdêra *ez* bê bikaranîn dê şaş bibe. Her wiha *min Gulê dibîne* jî dê şaş bibe ango bêyî sedemên pragmatîk xwedî peyvrêzîyeke sabît e. Ango argumanên rasteqîn him di nav lîsteya potansîyel a di lêkerê da ne; him jî ew di heman demê da avaniya zimên da, xwedî nîşaneke morfolojîk a resen in; bi gotineke din bi lêkerê xwedî têkiliyeke sabît in.

Ez sêvan dişînim bazarê

Di vê hevokê da hem *sêvan* him jî *bazarê* argumanên lêkera *şandin*ê ne û ew lêker parçeyê xwe ji hêla rolên wan ên semantîk cuda kod dike. Her çend ji hêla sedemên pragmatîk bikare cih biguherîne jî, guhertine morfolojîk dê wê negramatîk bike:

*Ez sêvan wê dişînim

Ji van mînakan diyar dibe ku arguman gelek caran nikarin cih biguherînin an jî daçeka xwe biavêjin. Lê hoker di gelek formên cuda da derdikevin pêş û morfolojîya wan ne sabît e (Forker, 2014): li, di… de, di bin…de, li ser…, di nav… da û hwd. dikarin bigirin.

Ew *yekşemê/berî yekşemê/piştî yekşemê* li vir dimînin.

Keçik *di malê da/ li ser malê/li paş malê/di hundirê malê da* dilîze.

Rakosî (2006, aktaran Gündoğdu, 2018, 16) ji ber kêmbûna wan îdia dike ku lêkerên mîna *kirin, xistin, dewisandin*, û hwd ên ku argumanên cihî distînin û ew argumanên wan *hedef* in, vê krîterê pûç nakin. Lê ji bo Kurdî dikare bê gotin ku lêkerên bi avayî qet ne kêm in û hema hema hemû weku arguman tevdigerin. Li gel vê yekê, ew gelek caran di formên cûrbicûr da dikarin xuya bin:

Min qelem danî *ser/bin/kêleka/cem* maseyê.

Min qelem kir *hundirê/bin/kêleka* çente.

Di encamê da cihêtiya arguman-têrkeran, alîkarî me dikin ku di hevokekê da em têkilîya hêmanan a bi lêkerê diyar bikin. Li gor vê, arguman hemana mecbûrî ye ku di avaniya lêkerê da cih bigire û bi valensa pêveberê tê diyarkirin. Arguman berevajî têrkeran ji hêla lêkerê ve tên hilbijartin, xwedî îşaretkirinên teta û rewşê ne. Têrker jî berevajî argumanan ji xwedîbûna kategorîya gramatîk, hejmar û peyvrêzîyeke azad in; bi agahiyên îlave ên konteksî tevkarî li hevokê dikin. Ev cihêtî ne tenê bi şiklî lê di heman demê da bi pîvanên mecbûrîbûna semantîk, (*omissibility*), bisînordarbûna bi hev re xuyabûnê û rolên teta jî dikare bê rawekirin. Bi vî avayî, ew cihêtî alîkarî me dike ku bi taybetî avaniyên lêkerî him ji hêla sentaksê ve him jî ji hêla semantîkê ve bê analîzkirin.

2. LÊKER

Kurmancî ji hêla avaniya lêkeran ve zimanekî gelekî dewlemend e û xwedî pergalên cuda ye. Lêker him di forma xwerû da him jî di avaniyên kompleks da tên dîtin (Bedirxan û Lescot 2004, 119) Da ku objeyên Kurmancî baştir bên famkirin, analîza avaniyên lêkaran bê nîqaşkirin. Haig (2002), Gündoğdu (2018; 2015) û Bedirxan û Lescot (2004) li ser avaniya lêkerên Kurmancî di çarçoveyeke fireh te xebitîne û hûrgilîyên lêkerên Kurmancî dane berçavan. Di vê beşê da jî bi alikariya xebatên wan dê ev lêker werin nasîn.

Herwiha çawa hat gotin, Kurmancî xwedî avaniyên curcicur e ji bo lêkeran. Ji bilî lêkerên xwerû, hemû lêkerdikevin koma lêkerên kompleks. Li gor vê dibe ku tabloyeke wisa derkeve hole (Gündoğdu, 2018, 2015):

- Lêkerên xwerû

Yên kompleks:

- Lêkerên bi perçeyeke navdêrî û lêkerê (Navdêr+Lêker)
- Lêkerên bi rengdêrekê û lêkerê (Rengdêr+ Lêker)
- Lêkerên bi daçekekê û lêkerê (daçek + lêker)
- Lêkerên bi pêşgir û lêkerekê (pêşgir + lêker)

Li jêr ew ê yek bi yek bên analîzkirin.

2.1. Lêkerên Xwerû

Lêkerên xwerû ji perçeyekê pêk tên û di nava xwe da weku *revîn, gerîn, meşîn, kelîn, anîn* ku bi paşgira -*în*ê diqedin; yên weku *dîtin, xwarin, kirin, ketin* bi paşgira -*in*ê diqedin, dikarin bên senifandin. Koma ewil ji bilî çend lêkerên transîtîv weku *kirîn, çinîn, nasîn, nivîsîn, anîn* hwd. bi piranî ne transîtîv in û bi paşgira -*andin*ê dikarin bibin transîtîv û bi vî avayî bibin dançêker:

a. Ew digere. (gerîn, ne-transîtîv)

b. Ew *kûçikê xwe* digerîne. (gerandin, transîtîv)

a. Av dikele. (kelîn, ne-transîtîv)

b. Ew *avê* dikelîne. (kelandin, transîtîv)

Koma diduyan ji lêkerên transîtîv weku *kuştin, xwarin* û yên ne transîtîv weku *hatin, gihaştin, çûn, man, bûn, mirin* pêk tên:

a. Ew penîr bi nên dixwe. (transîtîv)

b. Ew mêşan dikuje. (transîtîv)

c. Ew diçe. (ne transîtîv)

d. Ew digihêje. (ne transîtîv)

Kurmancî da lêkerên xwedî objeya rasterast bi gelemperî bi lêkera alîkar *dan*ê dibin dançêker (*causative*):

a. Ew sêvan dide xwarin.

b. Ew nanê xwe li firinê dide patin.

Herwiha hin lêkerên ji vê komê, ku bi *-in*ê diqedin û ne-transîtîv in, xwedî formên dançêker in lê ew di formên cuda da ne, ango lêkerên serbixwe ne:

a. Ez *dimirim.* (ne- dançêker)

b. Ez wê *dikujim.* (dançêker)

a. Ez *dikevim* malê. (ne- dançêker)

b. Ez wê *dixim* malê. (dançêker)

Di van mînakan da lêkerên ne-transîtîv ên mîna *mirin* û *ketin*ê, objeyekê nastînin û ji ber vê yekê berevajî bikaranîna lêkera arîkar a dançêker *dan*ê, bi rêya lêkerên din weku *kuştin* û *xistin*ê dibin dançêker. Ew bi vî rengî ne:

dançêker	(ne- dançêker)
Kuştin Xistin Hiştin	Mirin Ketin Mayîn/man

2.2. Lêkerên Kompleks

Lêkerên kompleks, formên pêveberê yên ji perçeyekê zêdetir pêk tên, îfade dike. Ew perçe dibe ku ji senifên rêzimanî ên cuda bin, mîna daçek, rengdêr, navdêr û hwd be. Lê herçend ew ji du an jî zêdetir perçeyan pêk bên jî, bi tenê rewşekê, aksîyonekê

an jî bûyerekê di xwe da kod dikin. Li gor Haig (2002), formasyona lêkerên kompleks, di zimanên Îranî da zêde ye ji ber ku ev ziman ji navdêran bi rêya dariştinê nikarin yekser lêkeran çêkin. Ji ber wê, bi rêya lêkerên sivik (*light verb*) ên mîna *bûn, kirin, dan, girtin, xistin*…(Gündoğdu, 2015) û bi perçeyekê, lêkerên nû derdixin holê. Di Kurmancî da gelek cureyên lêkerên kompleks hene. Li jêr dê ew bên senifandin.

2.2.1. Navdêr + lêker

Ev kom ji perçeyeke nomînal û ji lêkereke sivik pêk tên. *Biryardan, govendgirtin, temaşekirin, sondxwarin, pesndan* ji van lêkeran ra hin mînak in. Li gor Haig (2002), ew lêkerên kompleks bi giranî maneya xwe ji perçeya nomînal digirin û weku yên beşdarker (*incorporating*) û yên nebeşdarker (*non-incorporating*) dibin du beş. Li gor vê di lêkerên beşdarker da perçeya nomînal weku perçeyeke sabît a lêkerê tevdigerin û ew lêkerên transîtîv in. Weku lêkerên *dermankirin,qebûlkirin çapkirin, avdan, fahmkirin, barkirin, maçkirin, nîşandan* ku perçeya wan an nomînal tu caran daçek, qertaf nagirin an jî rewşa morfolojîk nîşan nadin. Û ev cure lêker objeya rasterast digirin:

a. Min *dar* av dan.

b. Wî *teklîfa min* qebûl kir.

a. *Ez darê avê didim.

b. *Ez darê avekê didim.

c. *Wî teklîfa min qebûleke baş kir.

Koma duyemîn, yên nebeşdarker (non-incorporating), yên ku destûrê nadin objeyeke rasterast û gelek caran perçeya wan a nomînal dikare di formên cuda da bê dîtin, nimûne bi îzafeyê, an jî bi daçekan û hwd. Ji ber ku ew cure herçend transîtîv nebin jî weku transîtîv tevdigerin û di demên borî da avaniya ergatîf nîşan didin. Ji ber vê yekê Haig îdia dike ku lêkerên beşdarker xwedî transîtîvîteya sentaktîk in; feqet lêkerên nebeşdarker xwedî transîtîvîteya leksîkî/ferhengî ne. Ango, lêkerên beşdarker di eslê xwe da xwedî objeyeke rasterast in ku ew hemû taybetiyên objeya rasterast a di Kurmancî da bicih tînin û perçeya wan lêkeran a nomînal her tim sabît e. Lê yên nebeşdarker dibe ku xwedî objeyê bin lê ew obje ne objeya rasterast e û gelek caran ji

ber lêkera xwe ya sivik weku transîtîv tevdigerin (Haig, 2002, 18); lê xwedî yek beşdarî ne, ango xwedî yek-valensê ne, ew jî subje ye:

Ew sondan dixwe.> wê sond xwar.

Ew can dide. > wê can da.

Çawa ku tê dîtin di van mînakan da objeyeke şênber û berbiçav tune ye. Nimûne, hevoka duyemîn, maneya *mirîn*ê dide ku ew lêkereke ne transîtîv e. Lê lêkera wan a sivik transîtîv e û ew di demên borî da weku transîtîv tevdigerin. Bi vî avayî Haig (2002), transîtîvîteya di Kurmancî da bi vî şiklî nîşan dide:

Tablo 2.2.1.1. Transîtîvîte

Transîtîvîte

Transîtîvîteya Ferhengî	Transîtîvîteya Sentaktîk
can dan	xwarin
sond xwarin	dan
baz dan	derman kirin
xwêdan	qebûl kirin

Li gor vê dikare bê gotin ku bi tenê lêkerên transîtîv dikarin objeya rasterast bi rê ve bibin, yên ne-transîtîv nikarin. Lêbelê, ne hemû lêkerên ku transîtîv xuya dikin, objeyekê bi rê ve dibin. Bi vî avayî, Haig (2002) lêkerên kompleks ên bi navê nebeşdarker, di nava xwe da dike sê beş:

- Lêkerên Kompleks ên daçekî (*adpositional*)
- Lêkerên Kompleks ên Xwedîtîyê (*xwedan*)
- Lêkerên Kompleks ên Têrkirî (*saturated*)

Ji van ya ewil, ên daçekî ji bilî perçeya nomînal xwedî objeyeke oblîk in ku bi daçekan ên mîna *ji, li, bi* ava dibin û bêyî van daçekan negramatîk dibin:

a. Avukat li saetê mêze kir. (Haig, 2002, 26)

b. *Avukat saetê mêze kir.

c. Em pîr ji te hez dikin. (Haig, 2002, 29)

d. *Em pir te hez dikin.

Ya duyemîn, ên xwedîtîyê, bi avaniya îzafeyê objeyên xwe digirin û pirî caran weku lêkerên transîtîv tevdigerin heke lêkera wan a sivik transîtîv be. Lêkerên mîna *behskirin, qalkirin, alîkarîkirin, zorbirin, telefonkirin* di vê komê da ne. Ew gelek caran qertafên îzafeyê yên zayendî ne, lê qertafa îzafeyê ya jenerîk -*î*yê jî distînin:

a. Bang*î* wê dike (Haig, 2002, 31)

b. Diya min telefon*î* min dike.

c. … bi çi teherî alîkar*î*ya min bikî? (Aras, 2019, 42)

Koma herî dawî a lêkerên kompleks ên nebeşdarker, lêkerên têrkirî (*saturated* in) ne. Ew lêkerên ne-transîtîv in bi eslê xwe, ango xwedî bi tenê beşdarekî ne. Ji nomînal û lêkereke sivik pêk tên. Ferqa di navbera van û lêkerên beşdarker da ew e ku ya ewil lêkerên transîtîv in û objeyeke rasterast digirin. Lê lêkerên têrkirî weku hat gotin, berevajî vê objeyên rasterast nagirin. Lêkerên mîna xwêdan, bazdan, şermkirin dikevin vê komê. Lê taybetiya wan a herî berbiçav ew e ku parçeya wan a nomînal tu caran cih naguherîne, daçek nagire an jî rewşê nîşan nade weku parçeya nomînal a lêkerên incorporating:

a. Ew havînan pir xwê dide.

b. *Ew havînan pir xwêyê dide.

Heta niha behsa lêkerên xwerû û yên kompleks ên navdêrî hat kirin. Rewşa wan a transîtîvîteyê hat nîşan dan. Berî ku derbasî lêkerên daçekî (ên ne transîtîv); yên bi pêşgir bin û yên rengdêrî bin, tabloya ku heta niha derket holê bibînin dê baştir bibe:

Tablo 2.2.1.2. Pêveberên Kompleks



2.2.2. Rengdêr + lêker

Ew kom ji rengdêrekê û ji lêkereke sivik pêk tê, nimûne, *dereng ketin, hişyar bûn/kirin, reş bûn/kirin, nexweş ketin*. Ew lêker dibe ku transîtîv û xwedî objeyeke rasterast bin:

a. Diya min *ez* hişyar kirim.

b. Ew ji me ra *kartolan* sor dike.

Piranîya lêkerên vê komê bi rêya guhertina lêkera sivik dikarin weku transîtîv an jî ne transîtîv bin:

a. Ez hişyar dibim.

b. Kartol sor dibin.

Ev rewş nîşan dide ku herçend maneya lêkerê ya esil, perçeya rengdêrî bide jî, lêkerên sivik bi temamî ji parçeya maneyê ne dûr in û li gor avaniyê û maneyê dikarin biguherin. Herwiha hemû lêkerên vê komê nikarin bi lêkera sivik *kirin*ê bibin transîtîv û bi gelemperî weku mînakên dereng ketin, nexweş ketin lêkereke cuda digirin.

2.2.3. Daçek + (navdêr) + lêker

Wek ku li jor jî hat nîşandan hin lêker xwedî parçeya nomînal in û herwiha dema objeyekê bigirin mecbûr in daçekan jî bi kar bînin, mîna *bi [...] bawerkirin, ji [...] hezkirin*. Hin lêkerên din hene ku lêker hemû ji daçekê û perçeyeke nomînal pêk tê, mîna *bi rê ketin, ji bîr kirin, pêketin, lêxistin, pêvakirin, jêkirin, destlêdan, destpêkirin* û hwd. Hin ji wan objeyên rasterast dikarin bigirin:

a. Min *lingê maseyê* pê ve kir.

b. Gulê *saeta hevdîtinê* ji bîr kiriye.

Dibe ku hin devokan da perçeya daçekî a lêkerên daçekî ku li jor hat behskirin (*pêbawerkirin, jêhezkirin*), dibe ku neyê bikaranîn. Lê ji bo vê komê ew ne pêkan e. Ji ber ku perçeyeke mecbûrî a lêkerê ne:

a. Ez dest bi dersê dikim.

b. *Ez dest dersê dikim.

c. Benîşt bi porê wê ve bûye.

d. *Benîşt porê wê bûye.

2.2.4. Pêşgir + lêker

Di Kurmancî da çend heb pêşgir hene ku taybetî ji bo hin lêkerân tên bikaranîn. *Çê-, ra-, ve-, rû-, der-, da-, hil-, ber-* hin ji van pêşgiran in:

a. Ez *ra*nabim.

b. Ez *da*tînim.

(Bedirxan û Lescot, 1976, 186)

Lêkerên mîna *hildan, hilgirtin, danîn, daketin, daxistin, rakirin, radan, vekirin, derketin, derxistin, vedan* û hwd dikevin vê komê. Ew parçe bi tevahî ne bêwate ne, ew jî ji hêla maneyê ve tevkarî li lêkerê dikin. Mînak, *der-* xwedî wê maneyê ye ku "tiştek diçe derve" û lêkerên bi pêşgira *da-* yê maneya "tiştek diçe xwarê" dide Gündoğduyê (2018, 113). Herwiha lêkerên bi pêşgira hil- jî bi gelemperî maneya "tiştek diçe jor" dide.

Di encamê da dikare bê gotin ku lêkerên di Kurmancî da weku kompleks û xwerû tên senifandin. Herwiha lêkerên kompleks bi amûrên cuda çêdibin. Perçeya ne lêkerî gelek caran hilgirê maneyê ye. Lê lêkera sivik jî piranî ne ketober û random in. Ji bilî vê her du kom jî xwedî lêkerên transîtîv û yên ne transîtîv in. Herwiha transîtîvîteya wan jî weku ya leksîkî ku xwedî objeyeke rasterast nînin û ya sentaktîk ku xwedî objeyeke rasterast in û du-valens an jî sê-valens in.

2.3. Teorîya Avanîya Bûyerê û Alîyê Semantîk ê Lêkeran

Ziman di îfadekirina bûyerên cuda da xwedî formên cuda ne. Bo nimûne, hin ziman tevger an jî istîqametan bi daçekan, bi peyvrêzîyeke cuda nîşan didin; hin zimanên din dibe ku bi tevahî formeke tevahî nû bikarbînin. An jî hin lêker argumanên xwe yên datîv bi îşaretkirineke cuda a morfolojîk nîşan bidin jî yên din dibe ku bi avayekî din vê yekê pêk bînin. Li gor Hovav û Levin (1997) û Haiden (2005) tevgera lêkerekê ya di hevokekê da, bi taybetî jî şiklê wê yê îfadekirin û şîrovekirina argumanên xwe, bi piranî bi maneya lêkerê ve girêdayî ye. Ji ber vê yekê, bi çavdêrîya tevgerên lêkeran, mirov dikare derheqê maneya wan da hin taybetiyan derxe holê. Ango li gor vê nêzîkatiyê, taybetiya leksîkal a lêkerekê ku tevgera wê ya sentaktîk diyar dike, maneya wê bixwe ye; lêker çend heb argumenan distîne an jî wan argumanan weku sentaktîki çawa îfade dike, parçeyeke muhîm a maneya lêkerê ye. Ew di çarçoveya teoriya Arguman Realization (Pêkhatina Argumanê) da di astên cuda da hatiye nîqaşkirin. Ji ber ku em bawer dikin ku Kurdî da jî gelek obje ji ber semantîk a lêkerê di formên cuda da derdikevin hember me. Di vê binbeşê da jî armanc ew ê ku vê yekê bi teoriya Avaniya Bûyerê (*Event Structure*) a di bin "*Arguman Realization* (Pêkhatina Argumanê)"ê da, bidin ber çavan.

Heta niha hat nîşandan nîşandan ku gelek lêker gelek argumanên cuda dikarin bigirin. Lê dîsa jî ew ji bo lêkerê bixwe taybet e û dibe ku ji bo lêkereke din ew ne arguman ne pêkan bin. Weku mînak lêkera *şandin*ê dikare hemû komplîmentên jêrîn bistîne:

a. Wê mektûb şand Stembolê.

b. Wê mektûb ji keçikê ra şand.

c. Wê zarok şandin hundir.

d. Wê zarok ber mi me ve şandin.

Di van mînakan da lêker komplêmentên cûrbicûr digire. Lê weku mînak lêkera *xwarin*ê dibe ku nekare ewqas komplêmentan bigire û di heman demê da yên ku ji bo vê lêkerê mumkîn in ji bo lêkera *xwarin*ê mumkîn nebin:

a. Wê xwarin xwar.

b. *Wê xwarin ber bi me ve xwar.

c. *Wê xwarin xwar hundir.

d. *Wê xwarin ji keçikê ra xwar.

Ew varyasyon bi tenê forma sentaktîk û hejmara komplêmentan a ji bo lêkerekê nîşan nadin; di heman demê da ew komplêment in ku lêkerê destûr daye wan. Lê ew ê bê dîtin ku korelasyonek di navbera maneya lêkerê û konteksta wê ya sentaktîk da heye.

Levîn (1999) û Haiden (2005) û hin kesên din li ser vê mijarê sekinîne û teyoriyek pêşxistine ku rê dide em vê cudatîyê bisenifînin. Li gor wan, Ew cudatî bêsînor nînin û bi gelemperî du-sê taybetiyên berbiçav ên van vasyasyonan hene. Ew taybetî îsbat dikin ku hin prensîbên lingûîstîc hene ku bi curcicuriya maneyên lêkerekê ve eleqedar in. Bi gotineke din, lêkerên zimanekî di nava xwe da li gor taybetîyên xwe yên semantîk koman ava dikin; lêkerên ku konseptên hevşib îfade dikin, di konteksta hevşib a sentaktîk da tên dîtin.

Herwiha Comrie (1976) jî di pirtûka xwe ya bi navê *Aspect*ê da lêker li gor hin taybetiyan senifandine: dûratîf (*durative)* ên ku bûyer ne ji nişka ve lê bi pêvajoyekî pêk tên, weku *gerîn, qanîkirin, çêkirin* û ên serest (*punctual)* ku bûyerên ji nişka ve pêk tên weku *pişkîn, ketin, şikîn*; ên telîk *(telic)* ku digihêjin encamekî weku *çêkirin, patin* û ên atelîk (*atelic)* ku dibe ku heya bêdawîtîyê bidomin her çend pêkan nebe jî û encam xaleke giring nîne weku *bazdan, gerîn, meşîn*; ên *state* ku sabît û berdewam in weku *hewandin, zanîn, bawer kirin* û ên çalakîyê (*event)* ku hereketê dihewînin û dibe ku bi demê ra biguherin. Ew kom dibe ku di hin xalan da bihevrişin lê ji hêla dem, pêvajo, encam û guherîn û hwd. ve koman çêdikin.

Haiden (2005) û Levîn (1993) ji bo zimanê İngilîzî ji dehan zêdetir kom tespît kirine. Li gor vê lêkerên rûber (*surface*), yên şikînê (*break verbs*), yên hukmkirin û birêvebirinê (*rule-govern*), lêkerên perestinê (*adore verbs*)… û hwd. Lê Lêvîn û Hovav (1997) dibêjin ku li seranserê cihanê bi eslê xwe çend heb cure lêker (*event type*) hene û hemû lêker dikevin di nav van çend heb cureya koman. Weku mînak koma lêkerên "aktivite"yê hene (*meşîn, gerîn*), yên "pêkanîn"ê (*accomplishment*) (*xwarin, kuştin*), yên "pêkhatinê/bûn"ê (*achievement*) (*reş bûn, qetîn*) û yên "rewş"ê (*state*) (*hezkirin, zanîn*) hene. Bi gotineke din hemû tevgerên me dikevin nava van koman. Ji van koman bi tenê lêkerên pêkanînê (*accomplishment*) rasterast transîtîv in. Di vê grûbê da divê kesek hebe û rewşa tiştekî bi tevgera xwe biguherîne. Lêkerên ku pêkhatinekê (achievement) îfade dikin bi gelemperî ji rewşekê derbasî rewşeke din dibin, ango guherîneke nişkava ya rewşê heye. Yên aktîvîteyê, guherînekê ne, lê bi tenê tevgerê îfade dikin. Ji bo Kurdî dibe ku tabloyeke wîsa derkeve bona van cureyan:

Tablo 2.3.1. Avaniya Lêkeran

Pêkanîn (accomplishment)	Pêkhatin (achievement)	Aktîvîte	Rewş
xwarin	ketin	gerîn	zanîn
xandin	qetîn	lîstin	hezkirin
kuştin	mirin	qêrîn	dîtin
şikandin	şikîn	strangotin	hewandin
kelandin	kelîn	danskirin	tirsîn
hişyarkirin	hişyarbûn	baz dan	bawerkirin
sorkirin	sorbûn	sporkirin	jibîrkirin

Lê Levîn û Hovav (1997), di heman demê da weku kumikeke jortir, kategorîzasyonekê din di navbera van lêkeran da çêdike; wan mîna lêkerên encamê (*result verbs*) û lêkerên şêweyê (*manner verbs*) ji hev vediqetîne. Lêkerên şêweyê nîşan didin ku ka fîil/tevger çawa pêk tê. Nimûne, lêkerên şêweyê ên hereketê (*verbs of manner of motion*) *meşîn, baz dan*, her du jî qet encamekî diyar nakin. Ya ewilîn da kesek bi gavan bi rê ve diçe û dibe ku zû bi zû an hêdî be, lê ew dîsa jî meşîn e; ya diduyan da êdî ew gav zêdetir bilez in ewqas ku em wê ji meşînê hev diqetînin û weku *bazdan* binav dikin. Di encamê da ew her du lêker jî şiklê tevgerê diyar dikin, ne encamekê. Cihê ku mirov diçe ne giring e û ne mecbûrî ye ku bê nîşandan; an jî dibe

ku tune be. *Kulîn, bezîn, lotik avêtin*, *xweholîkirin* û lêkerên mîna vana ji vî alî ve xwedî xalên hevpar û beşdarên heman in.

Herwiha lêkerên şêweyê en emîsyona dengan (*verbs of manner of sound emission*), mîna *qêrîn, çîkîn, wîqîn, xurîn, pirxîn, kuxîn, qîjîn, fîtin* ew hemû ji hev bi şiklê hilberîna deng ji hev cuda dibin lê di eslê xwe da xwedî taybetiyên hevpar in; herwiha di Kurmancî da ew lêker bi heman avayî di hevokan da cih digirin. Hoker û beşdarên ku dikarin bigirin hema hema heman in;

a. Ew bi dengekî bilind qêrî/çîkî/xurî/kuxî/qîjî …

b. Ew li derva bi dengekî bilind qêrî/çîkî/xurî/kuxî/qîjî…

Li gor Hovav û Levîn (1997, 5-6) lêkerên şêweyê zêdetir elastîk in û destûrê didin avaniyên hevokên curbicur. Ji ber ku lêkerên şêweyê da gelek xal kêm in û ew xalên kêm perçeyên mecbûrî nînin. Ji ber vê yekê jî parçeyên zêdetir ên weku bersiva pirsên *ku, çiqas, bi çi, bi kê/çi ra çawa*… dikarin azadtir lê bên zêdekirin.

a.Keçikê baz da.

b. Keçikê bi lez baz da.

c. Keçikê baz da malê

d. Keçikê ber mi erebeyê ve baz da.

e. Keçikê li parkê baz da.

f. Keçikê ji nişka ve baz da.

Lêkerên şêweyê bi vî rengî bûn. Feqet, lêkerên encamê (*result verb*) şiklê hereketê nîşan nadin lê yekser encamê diyar dikin. *Kuştin, şikîn, qetîn, qedîn* û hwd ji van lêkeran ra mînak in. Du cureyên lêkerên encamê hene: ya ewil *rewşa bi encam* (*Resulting State*) û ya diduyan jî *lokasyona bi encam* (*Resulting Location*) e (Hovav, Levîn, 1997, 5-6). Ya ewil da tiştek ji rewşekê derbasî rewşeke din dibe. Lêker encamê nîşan dide lê şêweya (manner) wê nîşan nade. *Cil ziwa bûn* di vê hevokê da cil ji rewşa şil derbasî rewşa ziwa dibin, lê li ber tavê ziwa bûn, bi makîneyê ziwa bûn an bi awayekî din nayê zanîn. An jî di hevoka *Vazo şikî* da vazo ji rewşa yek parçeyî derbasî rewşeke din dibe û êdî bi tevahî parçeyek nîne û çawa şikî ne diyar e. Herwiha lêkerên

mîna *reşkirin, germkirin, firehkirin, paqijkirin, şilkirin, qetandin, ziwakirin* bi gelemperî lêker ên *rewşa bi encam* in û nayê zanîn ka bi çi awayî derbasî wê rewşê bûne. Herwiha lêker ên *lokasyona bi encam* ê da, lêker gihîştina cihekî diyar dike. Di vana da cihê ku mirov/tişt diçe diyar e lê dîsa çawaniya wê ne diyar e: *Ew gihîşt malê* di vê hevokê da encam dîsa diyar e lê nayê zanîn ka bi meşê, bi bazdanê an bi erebeyê ye.

Li gor Levin (1999, 2) objeyên rasterast, argumanên bingeh (*core*) ên lêkerê ne û ne-îşaretkirî (unmarked) ne. Ji bilî wê argumanên lêkerên transîtîv, ango objeyên rasterast xwedî rola *muesîr* in. Lê çawa ku beşên din da jî derbas bû, ew îdia dike ku gelek lêkerên transîtîv hene ku xwedî objeyên di rolên din da bin:

a. *The engineer cracked the bridge.* (muesîr [*theme*])
"Mihendîs birr şikand."

b. The engineer destroyed the bridge. (muesîr / objeya têçûyî)
"Mihendîs pir hêrifand."

c. The engineer hit the bridge. (lokasyon; Fillmore 1970, vgz. Levîn, 1999)
"Mihendîs li pirê xist."

d. The engineer crossed the bridge. (rê [*path*])
"Mihendîs pir derbas kir."

e. The engineer reached the bridge. (hedef)
"Mihendîs gihîşt pirê."

f. The engineer left the bridge. (çavkanî)
"Mihendîs ji pirê derket."

g. The engineer saw the bridge. (stîmulus/objeya pêhesînê)
"Mihendîs pir dît."

h. The engineer hated the bridge. (stîmulus/ objeya hestê)
"Mihendîs ji birrê nefret kir."

Herwiha hin lêkerên din hene ku rewşa objeya wan naguhere û xwedî rolên *muesîr* nînin -ku ew rola prototîpîk a objeyên rasterast e- û geleke caran mirov nikare

bi hesanî rolekê ji bo wan tayin bike. Hin ji wan yên însan û yên ne însan bi dorê li jêr in:

(însan) a. *The engineer ignored the architect.*

"Mihendîs guh neda mîmar/ mîmar pişt guh kir."

b. *The engineer praised the architect.*

"Mihendîs pesnê mîmar da."

c. *The engineer greeted the architect.*

"Mihendîs silav da mîmar."

d. *The engineer supervised the architect.*

"Mihendîs serperiştiya mîmar kir."

e. *The engineer visited the architect.*

"Mihendîs mîmar ziyaret kir."

f. *The engineer followed the architect.*

"Mihendîs mîmar şopand."

(ne însan) a. *The engineer praised the bridge.*

"Mihendîs pesnê pirê da."

b. *The engineer touched the bridge.*

"Mihendîs destê xwe li pirê da"

c. *The engineer imagined the bridge.*

"Mihendîs pir xeyal kir"

d. *The engineer studied the bridge.*

"Mihendîs li ser pirê xebitî"

(Levîn, Objecthood, rp 3)

Levîn (1999, 3) dibêje mirov nikare rolên wan diyar bike ji ber ku ew objeyên lêkerên *Ne Bingeh-Transîtîv* (*non-core transitive*) in. Lêker dibe ku weku transîtîv xuya bike lê bûyera ku ew lêker îfade dike xwedî objeyeke tîpîk nebe. Lêkerên ku objeyên tîpîk digirin, xwedî kakterîzasyoneke semantîk ku tê da faîlek heye; li ser muesir tevgerekê pêk tîne û muesir ji vê tevgerê bibandor dibe. Weku mînakên *birîn,*

kuştin, şikandin ku di heman demê lêkerên Bingeh-Transîtîv (*Core Transitive*) in. Feqet, objeya lêkerên ne bingeh-transîtîv, ji vê taybetmendiyê azad in. Objeyên wan bi avayekî berbiçav bibandor nabin û guherînekê derbas nakin. Lêkerên Bingeh-Transîtîv, bin-komeke (*subset*) lêkerên transîtîv ku ji hêla semantîkê ve diyarkirî, ava dikin. Ango, di nava xwe da xwedî taybetmediyeke wateyî ne. Herwiha lêkerên ne Bingeh-Transîtîv jî bin-komeke lêkerên transîtîv ava dikin (dihin zimanan da) lê di xuyangê da ew ji karakterîzasyoneke serbixwe, net û hevgirtî ya semantîk bêpar in. Ew ne li gor taybetmendiyeke hevpar, li gor nebûna xwe ya Ne Bingeh-Transîtîv tên pênasekirin.

Bi vî avayî Levin, Hovav (1997) û Haiden (2005) hêla semantîk a lêkeran bi têkiliya objeyên wan analîz kirine û hewl dane ku semantîka lêkeran bi Avaniya Bûyerê (*event structure*) weku Maneya Struktural û Maneya Bingeh (*core meaning*) analîz bikin. Li gor vê ya yekemîn ango Maneya Struktural, refereyî avaniya struktural a lêkerên xwedî heman semantîkê dike. Di heman demê da ew nîşan dike ku ka lêkerek aîdî kîjan senifa semantîk e. Ew ji hêla sentaktîkê ve giring e. Di heman demê da, lêker di avaniya bûyerê da çawa tevdigere, kîjan argumanan distîne û kîjan rolên tematîk qebûl dike, nîşan dide. Mînakên jor ku ji bo lêkerên şêweyê en emîsyona dengan hatin nîşandan weku komekê tevdigerin û dikarin weku komekê bên nirxandin. Herwiha beşdarên ku ew digirin jî weku beşdarên strukturel tên binavkirin, herwiha ew beşdar ji bo lêkerê, da ku pêk bê, mecbûrî ne. Lê ya diduyan (*core meaning*) yekser taybetiya îdîosenkratîk a wê lêkerê bixwe îfade dike û bi tevahî bi taybetiyên navendî yê lêkerê ve eleqedar e. Bi saya maneya îdîosenkratîk, lêkerek ji ya din cuda dibe. Ango *strangotinê* ji *lorîn*ê cuda dike ku ew lêkerên heman sênifê ne. Levîn maneya îdîosenkratîk a lêkerê weku konstant (*constant*), beşdarên wan jî weku beşdarên konstant bi nav dike. Ew ji bo ku bûyer pêk bê ne mecbûrî ne lê dibe hin beşdar ku her tim bi hin lêkeran ra bên dîtin û weku strukturel tevbigerin. Herwiha Gündoğduyê (2018) nîşan daye ku objeyên oblîk ên daçekî di Kurmancî da Konstant in û lêkerên wan di eslê xwe da xwedî objeyeke rasterast nînin û objeya ku digirin guherînekê derbas nake û ev ne lêkerên Pêkanînê (*accomplishment*) ne û ne Bingeh-Transîtîv in. Herçend objeyên lêkerên Bingeh-Transîtîv weku strukturel bin, objeyên lêkerên ne Bingeh-Transîtîv an weku konstant in. Ango, konstant ew beşdar in ku ne beşek ji

avahiya bûyerê ne lê ji maneya îdîosenkratîk a lêkerê derdikevin; objeyên ku ji hêla wateya lêkerê ya leksîksal ve tên xwestin. Objeyek, bi lêkera eleqedar ve pirî caran tên bikaranîn lê di avahiya bûyerê da nayên temsîlkirin Konstant in; berevejî objeyên lêkerên *mîna kuştin*, şikîn, konstant bi gelemperî opsîyonel in, lê dibe ku di avaniyê da weku mecbûrî xuya bikin. Li gor vê, lêkera temaşekirinê dibe ku xwedî objeyekê be; lê ew obje ne strukturel e, konstant e û tu guherînan derbas nake.

Wek ku li jor hatibû nîşandan lêker ji çend koman pêk tên; li gor vê, Levin (1999) şemaya van komên lêkeran çêdike. Herwiha di zimên da cureyên van şemayan ên avaniya bûyeran sînordar in, ji ber ku cureyê bûyeran jî sînordar in. Çawa ku me li jor nîşan da weku sê çar heb in: Pêkanîn (*accomplishment*), Pêkhatin (*achievement*), Rewş (*State*), Aktîvîte (*Activity*). Herwiha çend heb şablon hene ku envantera tîpa van bûyeran (*event type*) ên mihtemel dihewînin. Bi gotineke din, hemû lêker di eslê xwe da çend heb tîp (aktîvîte, rewş…) in û ew tîp jî her yek dikare bi şablonekê bê nîşan dan.

Teoriya Avaniya Bûyerê, da ku tîpa bûyerê ya lêkeran û tevgerên wan ên gramatîk diyar bike têgeha "pêveberên prîmîtîv" weku TEVGER (*ACT*), SEDEMÎ (*CAUSATIVE*), REWŞ (*STATE*), BÛN (*BECOME*) bi kar tîne. Li vir TEVGER aktîviteyê, BÛN Pêkhatinê ango guherîna rewşê, SEDEMÎ jî Pêkanînê ango encame îfade dike.

Ew cureya bûyeran jî di nava xwe da weku Bûyera Sîmpleks (*Simplex Event*) ku ji bin-bûyerekê (*sub-event*) pêk tê; û Bûyera Kompleks (*Complex Event*) jî ji du an jî bêtir bin-bûyeran pêk tê. Bi vî rengî, lêkerên ku xwedî avaniya bûyerê ya kompleks in, transîtîv ango sedemî ne. Weku mînak *Wî kûçik kuşt.* Lêkera *kuştin*ê aktorekî û muesirekî (*undergoer*) mecbûrî dihewîne. Li gor vê, hêmanên konstant in xwedî avanîya simpleks in û di wan da SEDEMÎ û BÛN tune ye. Yên simpleks, heke obje ji hêla maneya îdîsînkratîk a lêkerê ve bê lîsanskirin, wê demê dibe ku objeyekê bigirin. Lê ew di eslê xwe da ne bingeh-transîtîv in.

Şablona Avaniya Bûyerên Simpleks

a. [x TEVGER <ŞÊWE>] (actîvîte-tevger)

(Ew dimeşin)

b. [x <REWŞ>] (rewş)

(Keçik wan nas dike)

c. [BÛN [x <REWŞ>]] (pêkhatin-bûn)

(îskan şikest)

Şavlona Avaniya Bûyerên Kompleks

[[x TEVGER<ŞÊWE> SEDEM [BÛN [y <REWŞ>]]] (pêkanîn-sedemî)

(Ez keçikê dikujim)

(Levin, 1999, 9)

Weku hat gotin, fikrê esas ew e ku şablona bûyerên sîmpleks bi tenê xwedî beşdarekî ne. Lê şablona bûyerên kompleks xwedî du (an zêdetir) beşdarên strukturel in û ew her du beşdar jî di avaniya bûyerê da kodkirî ne. Lê dikare xwedî zêdetir beşdarên konstant (*constant*) be heke hewce be.

Tablo 2.3.2. Avaniya Buyerân

Cureya Avaniyê	**Şablon**	**Tîpa Bûyerê**	**Mînak**	**Mane**
Simpleks	[x TEVDİGERE <ŞÊWE>]	Aktîvîte	Ew baz dide	tevgerîn
Simpleks	[x <REWŞ>]	Rewş	Ew dizane	Rewş
Simpleks	[DİBE [x <REWŞ>]	Pêkhatin	Bend qetî	Guherîna rewşê
Kompleks	[[x TEVDİGERE <ŞÊWE> DİBE SEDEM [BİBE [y <REWŞ>]]]	Pêkanîn	Wî îskan şikand	Guhertina Encamê

Da ku tablo zelaltir be, ev mînak dê arîkar be:

Gulê sêvê dixwe

Di lêkera xwarinê da, obje cih naguherîne ji holê radibe; ango fokûsa wê lêkerê li ser encamê ye (result-oriented) û di heman demê da ew tevger ji hêla subjeyê ve (*causativer*) pêk tê û dibe sedem obje ji holê rabe an jî guherînekê derbas bike:

[x DIBE SEDEM [y BIBE hezmkirî]]

Her wiha di rolên *aktor* (subj) û *muesîr* (obje) da du beşdarên wê yên mecbûrî hene. Di lêkerên wisa da, mane xwe dispêre guhertina hundirîn a objeyê ku bi bandora

lêkerê pêk tê. Lêkerên mîna *şikandin, birîn, xilas kirin, kuştin* û hwd. dikarin bikevin vê kategorîyê.

Tablo 2.3.3. Mînak

Lêker	**Çîna wê ya semantîk**	**Rolên Tematîk**
xwarin	Sedem-guhertina rewşê (Caused change of state)	Aktor – Muesîr
şikandin	Sedem-guhertina rewşê	Aktor – Muesîr
birîn	Sedem-guhertina rewşê	Aktor – Muesîr
xilas kirin	Sedem-guhertina rewşê	Aktor – Muesîr
kuştin	Sedem-guhertina rewşê	Aktor – Muesîr

Lê hin lêker hene ku ji bilî subjeyê du argumanên mecbûrî digirin, herçend di beşa yekemîn da hatibû behskirin, xwedî sê-valensê ne:

Gulê mektûp şand dibistanê

Li vir lêkera *şandin*ê hereketa objeyê dihewîne; dibe sedem ku ew hereket ji derekî hereketî derekî din bike (*caused motion*):

[x DIBE SEDEM [y BIÇE z]]

Ji ber vê sedemê ji ew xwedî argumanên subj, obj û *hedef*ekê ye. Rolên wan jî *aktor*, *tema* û *hedef* in. Objeya vê lêkerê ji navê ranabe lê cih diguherîne. Weku *şandin*ê hin lêkerên din hene ku di envantera xwe da, dîsa maneya xwe dispêrin guhertina cihî ya objeyê û *hedef* an jî *wergir*ekî digirin. Di van lêkeran da hêzek (subj) dibe sedem ku obje cih biguherîne (*caused motion*). Di Kurdî da lêkerên mîna, *birin, anîn, avêtin, kişandin hwd.* dikarin bikevin vê komê.

Tablo 2.3.4. Lêker û Semantîka Wan

Lêker	**rolên tematîk**	**senifa wê ya semantîk**
anîn	Aktor –Çavkanî (opsîyonel) – Tema – Hedef	Sedem- tevgera bi Hedef (caused motion)
şandin	Aktor – Tema – Hedef	Sedem- tevgera bi Hedef
kişandin	Aktor – Tema – Hedef	Sedem- tevgera bi Hedef

avêtin	Aktor – Tema – Hedef	Sedem- tevgera bi Hedef
birîn	Aktor – Tema – Hedef	Sedem- Tevgera bi Hedef

Çarçoveya teorîk a Levin û Rappaport Hovav (1997) a li ser bingeha avaniya bûyerê modeleke bihêz peyda dike ji bo dabeşkirina sîstematîk a wateyên lêkeran û ka ev wate çawa di rêzimana rûyî da tên xuyang dikin. Ev rêbaz dihêle ku em rolên tematîk (Aktor, Tema, Hedef, Tecrubekar, Çavkanî hwd.) ên lêkeran bibînin û wan ne tenê di asta semantîk de, lê di heman demê da di formên sentaktîk û morfosentaktîk da jî analîz bikin.

Di Kurmancî da, derbirîna rûyî ya van tîpên bûyeran û rolên wan ên tematîk ne tenê bi rêzimanî ve sînordar e. Ew her wiha bi rêya hin daçekan ji hêla morfosentaksê va, bi avakirina Frêzan bi parçeyên lêkerê ve tên xuyangê. Herwiha di beşên din da jî hat gotin, Kurmancî da objeyên rasterast di nava vî zimanî da xwedî rêzeke sabît in bi gelemperî. Lê lêkerên din ên ku dîsa beşdarên objeyî digirin, xwe ji lêkerên Bingeh-Transîtîv cuda ava dikin. Yek ji van jî objeyên oblîk ên daçekî bûn ku Songül Gündoğduyê (2018) li ser wan xebitîye û nîşan daye ku lêkerên wan di eslê xwe da NCTV in. Ji bilî wê ew ne sedemî lê aktîvîte an jî rewş in ji hêla tîpa bûyerê va. Ango objeyên wan ne strukturel lê konstant in.

Li gor me di Kurmancî da hemû komên lêkeran ên xwedî beşdarên objeyî, ne bingeh-transîtîv in ji bilî lêkerên xwedî objeyên rasterast ku xwedî taybetiyên gelemper in. Lê lêkerên ne-transîtîv ên Kurmancî -weku Haiden (2005) û Levin (1993) jî ji bo Îngilîzî nîşan dane, di nava xwe da koman ava dikin û ji hêla sentaksê ve jî xwedî hevparîyan in. Weku yên rewşê an jî yên aktîvîteyê koman ava dikin û objeyên wan jî li gor taybetiyên lêkerê xwedî heman rolên semantîk in. Lê lêker li gor rewşa objeyê, ya subjeyê an jî li gor rewşa ku çalakbûna subjeyê kom dibin û di vê çarçoveyê de, têgeha datîv ku bi bikaranîna Givón jî xwedî roleke mezin be ji bo diyarkirina koman û objeyên wan ên nerasterast. Em ê wê li gor têgeha *datîv* a Givón (2001) ku ji lîteratûrê bi avayekî cuda bi kar tîne û bi dabeşkirina lêkeran a Levîn, rawe bikin; bi rêbazeke obje-navendî, dê bi berfirehî bê nîqaşkirin ka objeyên nerasterast li gor rol û kontekstên xwe çawa bi rêya daçekên cuda, peyvrêzî û avayên din gramatize dibin, bi balkişandina objeyan a di avaniya bûyerê da û hem jî li ser îfadeyên sentaksî yên van avaniyan bisekinin.

2.4. Têgeha Datîv a Givon

Di teoriya zimannasî ya Givón (2001, 107) da, datîv roleke semantîk e ku di nava bûyerê da beşdareke bihiş, însan û weku tîpîk jîndar temsîl dike. Lê ew destpêkereke bi qesdî nîne û dikare xwedî rola gramatîk a subje, objeya rasterast û objeya nerasterast be:. *John* knew Mary (Subjeya Datîv)

a. *John* Mary nas dikir

b. John scared *Mary* (Objeya Rasterast a Datîv)
(John *Mary* tirsand)

c. John talked *to Mary* (Objeya Nerasterast a Datîv)
(John *bi Maryê* ra xeber da)

(Givón, 2001, 127)

Di van mînakan da ne subje, ne jî obje çalak nînin. Lê bi tenê weku beşdarên rewşê ne. Herwiha ne hemû lê yek bi avayekî cuda, ango bi daçekan hatiye avakirin. Dibe ku ew li gor zimanan jî biguhere. Herwiha *subjeyên datîv* xwedî taybetiyên Aktorekî tîpîk nîne. Ew bi gelemperî guherînekê an jî tevgereke aktîf nîşan nade. Subje bihiş e, lê ew tevgerê nade destpêkirin; ji ber vê yekê jî ew weku subjeya datîv tên binavkirin. Bi vî avayî va, li gor teoriya Levîn dibe ku weku lêkerên REWŞê bên dîtin. Herwiha objeyên wan jî bi gelemperî weku objeyên ne xwedî fonksîyona objeyên rasterast in lê ji hêla semantîk bi lêkerê ve têkîldar in û bi gelemperî ji hêla rolên xwe yên semantîk ve nikarin bi tevahî weku rolên *muesîr*, *hedef*, *tema* an hwd bên te'rîfkirin:

a. He *saw* her (subjeya datîv)
(Wî ew *dît*)

b. She *felt* no remorse (subjeya datîv)
(Wê tu poşmanî *hîs nekir/* Ew qet *poşman nebû*)

c. They *heard* the music (subjeya datîv)
(Wan mûzîk *bihîst*)

d. She *understood* the problem (subjeya datîv)
(Wê pirsgirêk *fem kir*)

(Givón, 2001, 129)

Li gor Givón, objeya wan jî weku fîzîkî naguherin ne jî guherineke derûnî û hwd. derbas dikin lê bi gelemperî razber (mûzîk, pirsgirêk, bersiv…) in. Herwiha *Objeyên datîv* xwedî pêveberên azmûnî (*experince predicates*) ne. Pêveberên wan bi gelemperî azmûneke psîkolojîk, bi taybetî rewşên derûnî, têgihîştin an hestê îfade:

a. They *insulted* her
(Wan heqaret bi wê kir)

b. She *spoils* him rotten
(Wê ew şûm kir)

c. He *amused* them
(Wî kêfa wan anî)

d. She *shocked* them
(Wê ew şok kirin)

(Givon, 2001, 129-130)

Li gor Givón objeyên datîv ji hêla mental an jî psîkolojîk ve tevlî vê avaniyê dibin. Lê herçend ew behsa binbeşên wê neke jî gelek rolên din hene ku di bin datîvê da dikarin bên hesibandin û ji bo danasîna objeyên Kurmancî xwedî roleke sereke ne. Ji van rolên semantîkî yên wekî sûdmend (*benefactive*), wergir (*recipient*), muxatab (*addressee*), tecrûbekar (*experiencer*), hestyar (*emoter*), têgihîştîner (*cognizer*) û stîmulus ji bo dabeşkirina semantîkî ya beşdarên lêkerên netransîtîv xwedî roleke sereke ne. S*ûdmend* ew kes e ku rasterast an nerasterast ji encama çalakiyekê sûd werdigire wek Alî di "Min [ji bo Alî şorbe] çêkir" da. Di lêkerên transferê da kesê ku hêmana tê transferkirin digire, *wergir* e wek "Min nameyek da [Ayşeyê]" ew gelek caran dibe ku *xwedan* (*possessor*) bin jî wekû lêkera *dan*ê da. Di lêkerên ragihandinê de *muxatab* hedefa peyamê ye wek "Min ji Mehmed re got ku...". *Tecrûbekar* kesê ku têgihîştinekê, hestekê an pêvajoyek derûnî dijî wek "[Ez] ji kulîlkan hez dikim". *Hestyar* wekî bincureyek tecrûbekar tê hesibandin, bi taybetî kesek ku rewşên hestyarî dijî wekû mînaka *hezkirin*ê da. *Têgihîştîner* beşdar e ku pêvajoyên nasnameyî yên wekî fikirîn, zanîn û bawerkirinê pêk tîne (wek "Elî dizanibû ku ev rast e"). *Stîmulus* hêmana derveyî ye ku berteka tecrûbekar dide destpêkirin wek kûçik di "Ez [ji kûçikan]

ditirsim" da. Ew rol dibe ku di hin xalan da hev bipêçin û yek bikeve bin banê yeka din. Ji bo objeyên netransîtîv ên Kurmancî ew ê bê dîtin.

Bi vî avayî têgeha objeya datîv û sûbjeya datîv giring in, nemaze di Kurmancî da ji bo têgihîştina têkiliya di navbera avahiyên argumanê û maneya lêkerê da. Herwiha di pênasekirina hin objeyên daçekî ên Kurmancî da, ew têgeheke raveker e.

2.5. Di Kurmancî da Kombûna Semantîk a Lêkerên Ne Bingeh-Transîtîv

Di Kurdî de, obje bi gelemperî bi sê-çar şêweyên cuda xuya dibin: objeyên rasterast, objeyên nerasterast, objeyên oblîk ên berî pêveberê û yên piştî pêveberê û ku di bin xwe da daçekên cuda digirin weku daçekên enstrumanî/komîtatîf (bi), lokatîf (li), ablatîf (ji) ava dibin. Herwiha herçend ji objebûnê dûr bin jî em ê li ser beşdarên objeyî ên bi îzafeyê ava dibin, bisekinin.

Cihê objeyên rasterast di hevokê de, weku berê jî hat gotin, bi gelemperî sabît e û berî pêveberê tê. Lêbelê, rewş ji bo objeyên ne rasterast guherbartir e. Pozîsyon û daçeka ku hildigirin, dibe ku li gor maneya lêkerê, li gor rewşa objeyê bixwe an jî li gor rewşa subjeyê - di bingeha xwe da li gor koma lêkerê a semantîk, cuda dibe. Ji ber vê yekê ye ku objeyên nerasterast di Kurdî da xwedî avahiyeke yek-tîp nînin; Şikl û cihê wan ji hêla kontekst û cureya lêkerê ve tê bibandorkirin:

a. Ez **ji kûçikan** ditirsim (OBL DAÇEKÎ)

b. Ez **bi qîzikê** qirfan dikim (OBL DAÇEKÎ)

c. Ez **li mêrik** mêze dikim (OBL DAÇEKÎ)

d. Ez qelemê didim **wê** (OBL DAÇEKÎ)

e. Ez **ji wê ra** dibêjim (OBL DAÇEKÎ)

f. Ez fesadî**ya wê** dikim (ÎZAFE- Pêvebera Sîplêt)

Di mînakên jorîn da ji bo tevlîbûna objeyên mîna “kûçik, qîzik, mêrik”, daçekên mîna *ji, bi, ji…ra, li* û ji bo mînaka (d) jî nivîsîna “wê” piştî pêveberê; herwiha di (f) yê da jî tevlîbûna beşdar bi avaniya îzafeyê, mecbûrî ne. Wekî din ew ê negramatîk bin. Ji bo Kurdî ew bikaranîn taybetiyên semantîk ên lêkerê û objeyê nîşan didin.

2.5.1. Objeyên daçekî yên oblîk

Kurmancî ji hêla objeyên daçekî ve gelekî dewlemend e. Ew beşdarên konstant in û herçend ku hat gotin li gor maneya lêkerê û rewşa objeyê bi daçekên cuda ava dibin.

2.5.1.1. Daçeka liyê -subjeya aktîf

Lêkerên ku objeya xwe bi *li*yê digirin xwedî subjeyên aktîf in. Ew bi gelemperî bi gotinî yan jî bi tevgerê destpêkerê bûyerê ne. Herwiha xwedî objeyên cuda ne, ango objeyên wan bi yek rolekî nikare bê te'rîfkirin an jî gelek caran tarîfa wan dijwar e. Dibe ku objeyên pêhesînê (*perception*) bin, yên datîv ên mental an jî psikolojîk bin. Herwiha dibe ku hinek pênaseya wan zor be.

a. Ez li te guhdar dikim.
b. Ez te dibihîzim

a. … demekê li derdora xwe mêze kir (Aras, 2019, r 11)
b. Ez hespan dibînim (Bedirxan, 2004, 94)

Di van mînakên cuda da her cota lêkeran (guhdar kirin- bihîstin/ mêzekirin-dîtin) di nava xwe da dişibên hev û objeyên wan jî heman in, ango stimulus in. Lê dîsa jî yekî ji wan, daçeka "li" yê girtîye, ya din jî weku objeya rasterast tevgerîyaye. Dema bi hûrgilî lê bê nihêrin, ew ê bê dîtin ku ferqa eslî a di navbera wan da bala arasteyî (directed attention) a bi hişyarî û bi daxwazî ye. Di van mînakan da lêkerên daçek sitendine *mêzekirin* û *guhdarkirin* bi awayekî bi zanebûna subjeyê pêk tên lê ji bo lêkerên *dîtin* û *bihîstin*ê bêyî ku bê armanckirin û bê-hiş ew bûyer pêk tên, heke organên subjeyê bi tendurist bin û subje wan bi zanebûnê asteng neke. Wisa ku heke dengek hebe mirov wî dengî bêyî hemdî xwe dibihîze lê mirov dengekî bi hişdarî guhdar dike. An jî heke kesek çavê xwe negire, ew ê li derdorê çi hebe bibîne; feqet li tiştekî bi taybetî dinêre an jî mêze dike.

Dema bi nêzîkatîya Levin ev lêker bên analîzkirin ew ê bê dîtin ku ji hêla maneya xwe ya hundirîn ve ew du koman ava dikin. Lêkerên daçek girtine weku AKTÎVÎTE, lê yên xwerû weku bi vî avayî dişibên lêkerên REWŞê weku *zanîn, hewîn, hîskirin, famkirin* ku objeya xwe weku ya rasterast distînin herçend Bingeh-Transîtîv nebin jî.

Û ji bo lêkerên dîtin û bihîstin:

[x <REWŞ>] y

Mêzekirin û guhdarkirin:

[x <TEVGER>] ber bi y va

Wê demê di encama vê da dikare bê gotin ku lêkerên ku objeya xwe bi daçeka *li*yê distînin, xwedî subjeyeke çalak û destpêker in. Ew rasterast bi qesd û qontrola subjeyê û bal, pêhesîn (*perception*) û sehekên subjeyê ve girêdayî ne. Bi zêdetir mînakan ew ê bê tesdîqkirin. Weku mînak yên sehek û bala subjeyê dikişînin mîna *li [obj] temaşekirin, li [obj] hûrbûn, li [obj] kolîn, li [obj] gerîn, li [obj] guhdarkirin, çav li [obj] gerandin, li [obj] mêzekirin, li [obj] niherîn*ê ku hewcedarî bal û arastebûna sehekên subjeyê ne (*object of perception)*. Lê herwiha di vê komê da hin mînakên din hene ku herçend dîsa arastebûn û çalakbûna subjeyê bihewînin jî objeyên wan ji koma ewil cuda ne:

a.Hetanî serê sibê li Siyabend geriya… (Aras, 2019, 10)

b. … bi nîv şaşmayî li min nêrî… (Caf, 2016, 28)

c. Dema ku min çavên xwe li derûdorê gerand… (Caf, 2016, 43)

d. … û li gorna ezîz temaşe kiriye (Metê, 2013, 14)

e. Ez li gotinên te guhdarî dikim (Metê, 2013, 34)

Ev mînak ji bilî bal û sehekên pêhesînê (*perceptional*) ên arasteyî, qey lêkerên arastebûna fîzîksel dihewînin û dibe ku objeya wan weku lokatîf be; ji ber ku taybetiya herî berbiçav ji bilî arastebûna fîzîkî di heman demê da temasa bi cihekî (*surface)* ye. Hin lêkerên mîna *dest li [obj] dan, dest li [obj] gerandin, li [obj] xistin, li [obj] dan* dikarin bikevin vê komê. Herçend şiklê temasê biguhere, ango bi avayekî hişk, an nerm, an şid be jî hemûyan da du an jî zêdetir tişt li hev dikevin. Herwiha weku lêkerên berî xwe ew jî sehek û bala qesdî a subjeyê dihewînin. Û ji ber ku objeyên van lêkerana konstant in, guherîna rewşê ya objeyê nayê dîtin.

Li dizgîna hespê *xist*… (Aras, 2019, 11)

Lê bi mînakên jêrîn bê ditin ku daçeka *li*yê bi tenê bi lêkerên ku arastebûna fizîkî û pêhesînî (*perceptional*) ve nayên bikaranîn. Di heman demê da arastebûna xwezîyên

sûbjeyê yên baş û yên xirab jî nîşan dide, mîna *nehlet li [obj] hanîn, nifir li [obj kirin, neyarî li [obj] kirin, li [obj] heram kirin, li [obj] jar kirin, li [obj] herimandin, ezyet li [obj] kirin* ku weku lêkerên xêrnexwaz/xirab (*malefactive*); *şîret li [obj] kirin, li [obj] helal kirin, çare li [obj] kirin, merhamet/rehm li [obj] kirin,* ku yên weku *sûdmend* hene. Di vana subje bi bilevkirin an jî arastebûna zihnî cih digire. Herwiha gelek caran rewşên razber dihewînin.

a. … li min zulm û te'dayî kirin (Aras, 2019, 12)

b. Bi rihma li bavê te be! (Aras, 2019, 35)

c. … nan û pîvazekê li min helal dikirin. (Caf, 2016, 26)

d. … li min wekî goştê segan heram be. (Caf, 2016, 37)

e. … em feqîr in merhametê li me bike! (Caf, 2016, 39)

f. Carîna min jî … nalet li wê gavê haniye… (Metê, 2013, 19)

g. Navê te li te pîroz be. ((Metê, 2013, 32)

h. … evîn li wan evîndaran herimandiye. (Metê, 2013, 36)

Objeyên van lêkeran ên ku daçeka "li"yê distînin, dişibên *hedef*an lê dîsa jî nikarin weku *hedef* bên sînordarkirin û guherîneke berbiçav derbas nakin ji ber vê yekê ne *muesîr* in. Subjeya van lêkeran her tim aktîf e. Bi sehek, bala an jî fîzikî berê xwe dide objeyê. Di heman demê da objeya van lêkeran bi avayekî klasik bandorê nabînin û objeyeke semantîk nîne. Bi avayekî zihnî, gotinî hedefa subjeyê ne.

2.5.1.2. Daçeka jiyê – subjeya datîv

Subjeya Datîv a Givón (2001) bi taybetî rewşên bêhemdîxwe, beyî armanckirî, yên hişî (kognîtîf), yên emosyonel da cih digire û ji *aktor*ê tîpîk ji dûr dikeve; ev subje bi piranî nêzî rola tecrubekar (*experiencer*) ye û hilgira hestê ye. Lê weku tematîk pêvajoyekê nade destpêkirin. Bi tenê marûzî wê rewşê dibe an jî rewşeke hundirîn tecrube dike. Di Kurmancî da lêkerên rewşê bi du avayî objeyên xwe digirin. Ya yekemîn li ber objeyê daçeka *ji*yê nîşan didin. Li gor vê jî subjeya lêkerên mîna *ji [obj] tirsîn, ji [obj]* gumankirin, *ji [obj] hezkirin, ji [obj] qayîl bûn, ji [obj] hêrsketin/bûn, ji [obj] xeyidîn, ji [obj] memnûn/razî bûn, ji [obj] xofkirin, ji [obj] poşmanbûn*

subjeyên datîv in û beşdarên xwe bi daçeka "*ji*" nîşan didin û têkiliyeke subjeya tecrubekar (*experiencer*) -objeya stimulus ava dikin:

a. Meriv ji te dikeve gumanekê… (Metê, 2013, 35)

b. Rîhê te sipî ye, Xwedê [jê] razî! (Metê, 2013, 33)

c. … ji bo mistek nokên qelandî [ji dapîra xwe] *hêrs dibe*. (Metê, 2013, 20)

d. … li aliyekî jî derew [ji rastiyê] *ditirse* (Metê, 2013, 13)

Di van mînakan da objeyên oblîk weku çavkanîyên ku hesta subjeyê diafirînin, xwe pêşkeş dikin. Bi vî avayî, lêker ne li gor arastebûnê, lê li gor temsîla rewşeke derûnî û hundirîn ava dibe. Di çarçoveya pêveberên prîmîtîv da şablona van lêkeran wîsa ye:

[x <REWŞ>] ji ber/sedemî y

Forma duyemîn a ku lêkerên REWŞê ava dikin jî avakirina objeyê bêyî daçek, bi rewşê (*case*) ye; ango weku objeya rasterast e:

a.Pêşî, bavê min ez [me'eneya wan] *nizanim*. (Caf, 2016, 52)

b. … di vê gava pêşîn de ez [çi] *difikirim*… (Metê, 2013, 15)

c. [Evê yekê] jî ez anuha *hîs dikim*… (Metê, 2013, 17)

Ferqa vê komê ji ya ewilîn ew e ku ew hestan, bi taybetî jî rewşa emosyonel a sûbjeyê îfade nakin. Dibe ku ji ber vê sedemê nekeve nav vê komê.

Herwiha hemanên ku bi daçeka "ji"yê xuya dibin, rasterast guherînekê derbas nakin. Herwiha avaniyên bi daçeka *ji*yê herçend bi lêkerên rewşê ên tecrubekar (*experiencer*)-navendî û statîk bibin cot; avaniyên bi *li*yê bi lêkerên aktiviteyê ên arasteyî û dînamîk ra kom dibin.

2.5.1.3. Daçeka biyê - Objeya Datîv

Di vê avaniyê da obje, ji hêla lêkerê ve bi avayekî rasterast ne lê bi piranî psîkolojîk an mental bibandor dibe. Tevger ji hêla subjeyê ve tê destpêkirin û arasteyî objeyê dibe. Ew arastebûn ne fîzîkî ye, çawa ku hat gotin psîkolojîk û gotinî e. Li gor modela pêveberên prîmîtîv a Levîn şablona vê komê wisa ye:

[x <TEVGER>] bi y

Weku hat gotin, tevger ji hêla subjeyê ve bi awayekî hişyarî dest pê dike. Bi vî avayî hem bi teoriya Levin hem jî ya Givón ra hevgirtî pêş dikeve.

a. Ez heqaretê bi wan dikim

b. Ew henekan/tinazan/galteyan/qirfan/yarîyan bi me dike.

Lêkerên mîna *tinaz bi [obj]kirin, qirf bi [obj] kirin, henek bi [obj] kirin, yarî bi [obj] kirin, tewz bi [obj] kirin, sivikatî bi [obj] kirin, heqaret bi [obj] kirin, tirane bi [obj] kirin, lome bi [obj] kirin, bi [obj] kenîn, galte bi [obj] kirin, bawerî bi [obj] kirin* û hwd tên bikaranîn ku li hember objeyê tevgereke derûnî dihewînin û objeya xwe bi daçeka *bi*yê îşaret dikin. Beşdarên van lêkeran di bûyerê da li şuna fizîkî, weku mental bi cih digirin.

a. … baweriya min bi van tiştan tune. (Caf, 2016, 32)

b. … meriv bi vî aqilê te bikene. … xelk ê bi te û bi tevgera te bikene. (Metê, 2013, 34)

Ji bilî van daçekên *ji….re* û *bi…ve* hene ku di beşa Rolên Sematîk da hatin nîqaşkirin. Ji ber vê yekê li vir weku kurte bê behskirin. Daçeka *bi…ve* bi gelemperî bi lêkerên pêvakirinê (attachment) ra eleqedar in. Weku *bi [obj] ve girêdan, bi [obj] ve zeliqandin, bi [obj] ve bûn, bi [obj] ve danîn, bi [obj] ve girtin*. Objeya wan dikare weku lokatîf *hedef* bê binavkirin. Ji ber ku bi gelemperî tiştek bi tişteke din a lokatîv ra temas dike.

a. … mertalek tevî qatek çek bi qaşa zîn va girêdayî ne. (Aras, 2019, 14)

b. … çûm qezake din a bi wê wilayetê ve girêdayî. (Caf, 2016, 42)

c. … lê tu radibî Ewanekî jî [pê ve] dikî. (Metê, 2013, 34)

d. … bûye benîşt û bi erdê ve zeliqiye. (Metê, 2013, 43)

Ya diduyan jî ji…re ye ku ew bi hûrgilî hat nîqaşkirin. Herçend Gündoğduyê (2018) nîşan da ew xwedî wesfeke *sûdmend* e, ango kesê ku ji tevgerê sûd werdigire bi vê tê nîşandan. Gelek caran di şuna daçeka *ji bo* da tê bikaranîn. Ji bilî lêkerên

vegotinê mîna *ji [obj] ra gotin/vegotin, ji [obj] ra stran/çîrok gotin, behskirin* xwedî rola *wergir- sûdmend* e. Di lêkerên axaftinê da jî xwedî rola *muxatab* ye:

Min rojekê *ji* axê *re* got… (Caf, 2016, 33)

Ez dixwazim tu yeka wisan ji min re çêkî! (têrker) (Caf, 2016, 30)

… ez ê ji we ra behsa tevger û gotinên …. bikim. (Metê, 2013, 49)

Ji vir pê ra, avahiyên lêkeran ên ku argumanên wan ên objeyî ne bi rêya daçekan lê bi rêya cûdahiyên rasterast di pozîsyonên wan ên rêzimanî da tên îfadekirin, dê werin vekolîn. Bi taybetî, dê li ser cureyên avahîsaziyê yên ku bi guhertina cihê objeyê di nav lêkerê da û bandora van cureyan li ser têkiliya lêker-wateyê werin nîqaşkirin. Bi vî awayî, dê bê nîşandan ku ne tenê nîşankirinên morfosentaksî çawa şikil didin avahiyên argumanan di Kurdî de, lê di heman demê da cûdahiyên rêzimanî yên peyvrêzîyê da jî li gor cureyên lêkeran diguherin.

2.5.2. Objeyên Oblîk ên Pişt-Lêkerî

Heke objeyeke rasterast cih biguherîne, cihê ku armanc e, piştî pêveberê ye û tevgerê nîşan dide. Ev bicihkirina rêzimanî, taybetmendiyeke avahîsaziya zimên e û bi lêkerên tevgerê ra diyar dibe. Di vê çarçoveyê de, argumanên *hedef* bi cihbûna rasterast piştî pêveberê, mebest û hedefa bûyerê dikirpînin:

a. Ez pirtûkê dişînim *Stembolê*

b. Ez kevir diavêjim *avê*

c. Ez zarokan tînim *malê*

Di Kurdî de, objeyên *hedef* ên lokatîf di pozîsyona piştî pêveberê di rewşa oblîk da ne. Ev rewş di lêkolîna Haig (2014b) da hatiye nîşandan. Bi taybetî, lêkerên weku çûn, gihîştin, ketin, hatin, kişîn û hwd ên ne-transîtîv ên tevgerê (*motion*); û lêkerên weku *şandin, avêtin, birin, anîn, danîn, kirin, xistin* ên Bingeh-Transîtîv, *hedef*ên xwe piştî pêveberê hildigirin û tevgera sedemî (*caused-motion*) ne:

Ez têm/diçim/digihêjim/dikevim *malê*

Ez [zarokan] dibim/tînim/dixim/dişînim *malê.*

Objeyên oblîk ên pişt-lêkerî bi gelemperî bêcan in ji mînakên jorîn jî diyar e. Lê hin lêker hene ku weku îstisna tevdigerin:

a. Ez avê didim/difiroşim *wê*

b. Ez avê diavêjim *te*.

Çawa ku xuyayê lêkerên avêtin û dan jindar in. Wek ku beşên berê da jî hat behskirin di van avahiyan da *hedef* weku xwedîtîya sedemî (*caused-possession*) formule dibe. Herwiha li gor teoriya Levîn, şablonekê ji wan ra xêz bikin ew ê wisa be:

[x DIBE SEDEM [y BIBE XWEDÎ z]], [x CAUSE [y HAVE z]]

Lê şablona ji bo *hedef*ên lokatîf ên pişt-lêkerî wisa dibe:

[x DIBE SEDEM [y BIÇE z]], [x CAUSE [y GO z]]

Herwiha ji bo *hedef*ên lêkerên ne-transîtîv jî wisa dibe:

[x TEVDIGERE] ber bi y va, [x ACT] towards y

Herwiha li gor Gündoğduyê (2018), *hedef*ên pişt-lêkerî hêmanên Bingeh, ango strukturel in.

2.5.3. Pêveberên veqetandî -beşdarên bi îzafeyê

Strukturên ku dê di vê beşê da werin vekolîn, ew in ku di Kurmancî da bi lêkerên kompleks ra tên dîtin. Li vir beşdar bi parçeya nomînal a lêkerê ra avahiyeke îzafeyê çêdikin û di navbera parçeya nomînal û lêkera sivik da cih digirin. Objeyên van lêkeran bi rolên *hedef* ra li hev dikin gelek caran. Lê piranî, ji bo wan rolek tayinkirin gelekî dijwar e. Herwiha parçeya van lêkeran ên nomînal maneya semantîk hildigire. Lê avahiya ku em li vir weku obje bi nav dikin, ne rasterast di asta kêşanê da bi lêkerê ve girêdayî ye û ne jî di avaniya bûyerê da xwediyê statuya argumana bingeh (core) e; lê belê ew hilgirê konseptekê ye ku bi rêya avaniyeke îzafeyê tên îfadekirin. Herwiha bi du avayan tê nîşandan. Ya yekemîn bi avaniya îzafeyê ya bi zayend e. Hin rehên navdêrî mînak, *behs, bal, pesn, bêrî, qal, gilî* bi gelemperî bi qertafa zayenda mê -*a* an jî ya nêr -*ê* tên nîşandan:

a. Loma ez ê … behs*a* tevger û gotinên wî cenabê mezin bikim (Metê, 2013, 49)

b. Ez pesn*ê* wê didim.

c. Ez qal*a* wê dikim.

d. Ez fesadiy*a* wê dikim.

e. … her neçe gilîy*ê* min neke. (Aras, 2019: 9)

Di van avaniyan da, obje rasterast nayê temsîlkirin, lê bi rêya avahiya izafe ya parçeya nomînal tê temsîlkirin. Herweha, parçeyên nomînal di ferhengê da gelek caran wek navdêrên serbixwe *behs, qal, fesadî* cih digirin. Ji bilî wê lêkerên jorîn ji hêla maneya xwe ya hundirîn ve gelekî dişibin hev. Beşdarê objeyî ya wan bi gelemperî *mijar* (topic) e. Ango *mijar*a tevgera gotinî ya subjeyê ne.

Koma duyemîn jî avaniyên bi paşgira îzafeyê -*î* ya bêyî zayend tên avakirin. Di van mînakan da lêkerên kompleks da hêmana nomînal paşgira -î digire û avahiyek mîna îzafe lê bêyî nîşankera zayendê diafirîne.

Wek ku tên zanîn daçek (*prepositions*) heke weku navdêreke serbixwe tevnegerin gelek caran bi qertafa -*î*yê îzafeyê ava dike, weku *li jorî/li hemberî/li dûrî/li nêzî/piştî malê*. Herwiha yên weku navdêr dikarin tevbigerin bi rêya îzafeya zayendî ava dibin, *kêleka/pêşiya/paşiya/dora/serê xênî*. Dibe ku bê nîqaşkirin ka gelo heman tişt ji bo van lêkerên kompleks jî derbas dar be. Ango perçeyên wan ên ku di zimên da nikarin weku perçeyeke serbixwe tevgerin bi daçeka -îyê xuya dibin:

a. Ez wan neql*î* Amedê dikim

d. Ez … derbasî huzura mutemed bûm… (Caf, 2016, 47)

c. … ez ê îşev bangî Xwedê bikim. (Metê, 2013, 18)

d. … palgiyên bi rûbendên nexşandî nîşan*î* min dide… (Metê, 2013, 14) (hêmanên *pêhesînê*)

Bo nimûne peyvên *neql, hîn, derbas* ji bilî van avahiyan weku paçeyeke nomînal nayên bikaranîn an jî gelek caran kêm in. Dibe ku bi hin qertafan peyv ji wan bê avakirin weku derbas weku *derbasî*, *hînî*. Lê ew ji ber ku bi tenê serê xwe zêde nayên bikaranîn. Di heman demê da ev, avaniyên bi zayenda gramatîk çênakin: *Hîna/hînê wî, *derbasa/derbasê wî, *neqla/neqlê wî. Gelek mînakên din ên ku bi vê yekê ra li

hev nakin, hene. Lêbelê zimên gelek caran bi hevşibîyan hin avaniyan pêk tîne. Dibe ku ev bikaranîn bi vê rêya berbelavbûnê derbasî perçeyên din be, ango derbasî yên ku weku navdêr tên bikaranîn, be. Mînak Ez aşiq*î* wê bûm. Lê dîsa jî ew nikare weku krîtereke ku vê cudahîyê zelal dike, bê hesibandin. Dibe ku faktorên cuda hebin. Lê ji hêla rolên objeyê va bi gelemperî wekû *mijar* (topic) û *hedefê* derdikevin hemberî me:

a. … lê dibêjin hîcret*î* alem-î frangayê kiriye. (Metê, 2013, 34) (*hedef*a lokatîf)

b. Ez *barî/transferî/derbasî/neqlî* Amedê dikim. (*hedef*a lokatîf)

c. ez *behsa/qala/bêriya/gilîyê wê* dikim. (*mijar*)

Bi gelemperî objeyên wan lêkeran weku razber in, ji bilî yên lokatîf. Herwiha cudahiya qertafan *(-î* û *-a/ê)* bi maneya lêkerê ya hundirîn ve eleqedar nîne. Rolên beşdaran ne heman in.

Heta niha dibe ku bi dehan zêdetir kom li van kategorizasyonên semantîk zêde bin. Ji ber wê ew hewcedarî xebateke kûrtir e. Lê çarçoveya teorîk a li ser dabeşkirina lêkeran a Levin, nîşan dide ku lêker dikarin ne tenê li gorî avahiyên xwe yên rêzimanî û şiklê ku argumanan digirin, lê di heman demê da li gorî naveroka xwe ya semantîk jî bi awayekî sîstematîk werin dabeşkirin. Dikare bê gotin ku di zimanê Kurdî da jî avahiyeke bi vî rengî heye. Herwiha bi vê, hat dîtin ka gramatîzasyona rolên semantîk bi daçekan û peyvrêzîyê çawa dixebite. Di Kurdî de, hin lêker rola xwe ya *hedef*an piştî pêveberê bicih dikin, hinên din jî vê rolê di pozîsyonên cuda yên rêzimanî da bi rêya daçekan an jî bi forma îzafeyê ya bi lêkerê xwe nîşan didin. Ev pirrengiya avahîsaziyê ya lêkeran nîşan dide ku ew ne tenê li gorî kategoriyên xwe yên sentaktîk, lê di heman demê da li gorî avaniya bûyerê û avaniya argumanê jî çînên xwe ava dikin. Di vê çarçoveyê de, lêkolîna cureyên lêkeran ên di Kurdî da derfetê peyda dike ku hem têkiliya lêker û wateyê, hem jî varyasyonên rêzimanî yên ku ev lêker dikarin bi awayekî sîstematîktir ava bikin, eşkere bibin.

ENCAM

Di vê lêkolînê da armanc ew bû ku rola objeyê ya di Kurmanciya Kurdî da di astên semantîk û sentaktîk da bi berfirehî bê lêkolînkirin û analîzên berfireh ên têkiliya di navbera cureyên objeyan û lêkeran, rolên wan ên semantîk û rûdanên sentaktîk ên wan di avahiyan da bên pêşkêşkirin. Bi vî avayî pênaseyên objeyan ên di lîteratûrê da û cudahiya di navbera arguman û têrkeran (*adjunct*) da di çarçoveyeke teorîk da hatin nîqaşkirin. Li gor van pênaseyan objeyên Kurmancî hatin senifandin û herwiha weku îxtimal hat nîqaşkirin ku hin cureyên objeyan ku bi pêveberên veqetandî (split predicate) tên dîtin, bikevin nav koma objeyên kuazî. Paşê jî dabeşkirina objeyan û rolên wan ên semantîk hatin analîzkirin. Di vê çarçoveyê de, hat lêkolîn ka rolên weku *tema*, *muesîr*, *hedef*, *wergir* û *tecrubekar* û hwd. çawa di komên lêkerên cûda da tên dîtin û avahiyên morfosentaktîk ên ku ew tê da çêdibin bi çi rengî ne.

Di beşa duyemîn a tezê da, lêkerên Kurmancî li gorî avaniyên xwe mîna xwerû û kompleks; transîtîv ne transîtiv, bi analîza Haig (2002) û Gündoğduyê (2015) hatin nasîn. Piştra teoriya Avaniya Bûyerê ya Levin (1999) hat nasandin û lêker li gor rolên xwe yên semantîk û maneyên xwe yên hundirîn hatin komkirin; bi bikaranîna rêbaza Avaniya Bûyerê û têgeha rola tematîk a Givón a bi navê *datîv* û cûreyên wê, lêker û objeyên Konstant hatin senifandin.

Herwiha hat îspatkirin ku lêkerên ku Bingeh-Transîtîv nînin, bi gemelmperî komên semantîk ên hevşib ava dikin û bi hilgirina objeyê jî vê cudatîyê nîşan didin. Li gor vê lêkerên derheqê hestan da ên mîna *hezkirin, nefretkirin, qayîlbûn, tirsîn* û hwd objeyên xwe bi daçeka *ji*yê digirin; xwedî objeya stîmulus û subjeya hestyar/tecrubekar in. Lêkerên ku objeya xwe bi daçeka *li*yê digirin xwedî subjeyên wekû fizîkî an jî gotinî aktîf in, bi sehek, bal û dîqeta sûbjeyê pêk tên wekû *guhdarkirin, nihêrîn, mêzekirin, temaşekirin û yên lêhûrbûn, lêgerîn, lêkolîn* û hwd. ji bilî wê ji bo lêkerên dîa û nifiran, xwezîyên xêrnexwaz û bisûd mîna *nifirlêkirin, heqaretlêkirin, lêheramkirin/jarkirin û çarelêkirin, lêhelalkirin, rahmetlêkirin, şîretlêkirin*. Sûbjeyên van lêkeran aktor e lê guherîneke berbiçav li ser objeyê nayê dîtin. Herwiha senifandina objeyên vê komê ji hêla rolên semantîk va dijwar e. Ji bilî van, dema tevgereke derûnî ji hêla objeyê va pêk bê û arasteyî objeyê be jî daçeka *bi*yê

tê bikaranîn wekû *pêbawerkirin, pêhenekkirin, pêkenîn, tinazpêkirin, qeşmerîpêkirin, yarîpêkirin*. Objeyên wan wekû datîv in û sûbje jî aktor in. Herî dawî lêkerên ku objeyên xwe bi îzafeyê digirin hene ku ew bi piranî xwedî objeyên lokatîf ên hedef (lokatîve goal) mîna *derbasî […] bûn, transferî […] bûn, siwarî […] bûn, hîcretî […] kirin* û rolên mijar (*topic*) digirin ên mîna *behsa […] kirin, qala […] kirin, hînî […] bûn, pesnên […] dan, gilîyê […] kirin*. Daçekên mîna *bi…ve* jî bi lêkerên pêvekirinê (attachment) ra eleqedar in wekû *zeliqandin, pêvekirin, pêvegirtin, pêvebûn, pêvedaliqandin* wekû lokatîf in.

Li gor vê lêker objeyên xwe bi piranî bi formên cuda ên morfosentaktîk û bi peyvrêziyeke cuda nîşan didin. Ev nûve nîşan dide ku sîstemên tradîsyonî ên ku bi rolên sabît û neguherbar dixebitin, di zimanên weku Kurdî da dibe ku têre nekin; di şuna vê da nuansên maneyî ên lêkeran berçavkirin, dê zêdetir raveker be.

Di encamê de, ev tez nîşan dide ku cureyên objeyan di zimanê Kurdî da xwedî avahiyeke pirqatî û sîstematîk in him di astên semantîk û him jî di astên rêzimanî da. Ev tez bi tenê tevkarîyê li avahiya zimannasî ya Kurdî nake, lê di heman demê da rê li ber ji nû ve nirxandina objeyan vedike; bi saya wê, têgeha objeyê ji hêla strukturel û fonksîyonî bi avayekî pirtir sîstematîk dikare li ser bê sekinîn.

ÇAVKANÎ

Aras, A. (2019). *Siyabend û Xecê*. Nûbihar (çp3).

Bedirxan, C., û Lescot, R. (2004). *Kürtçe dilbilgisi (Kurmanci)*. Stembol: Weşanên Avesta.

Blansitt Jr., E. L. (1984). Dechticaetiative and dative. In F. Plank (Ed.), *Objects: Towards a Theory of Grammatical Relations* (pp. 127–150). Academic Press.

Borg, A. J., û Comrie, B. (1984). Object diffuseness in Maltese. In F. Plank (Ed.), *Objects: Towards a Theory of Grammatical Relations* (pp. 109–126). Academic Press.

Bülbül, M. (2017). *Sazkirina Riste û Frêzan û Peyvrêziya Wan (Di Dîyalekta Jorî ya Zimanê Kurdî da- Devoka Mêrdînê)* (Teza Doxtorayê). Zaxo: Zanîngeha Zaxoyê.

Caf, A. M. (2016). *Meseleya Wijdanê* (çp2). Stembol: Weşanên Avesta.

Carnie, A. (2011). *Modern syntax: A coursebook*. Cambridge, MA: Cambridge University Press.

Carnie, A. (2013). *Syntax: A generative introduction* (3rd ed.). Malden, MA: Blackwell.

Collinge, N. E. (1984). How to discover direct objects. In F. Plank (Ed.), *Objects: Towards a Theory of Grammatical Relations* (pp. 9–28). Academic Press.

Comrie, B. (2001). *Aspect*. Cambridge: Cambridge University Press. (Original work published 1976)

Forker, D. (2014). A canonical approach to the argument/adjunct distinction. *Linguistic Discovery, 12*(2), 27–40.

Gil, D. (1984). On the notion of "direct object" in patient prominent languages. In F. Plank (Ed.), *Objects: Towards a Theory of Grammatical Relations* (pp. 87–108). Academic Press.

Givón, T. (2001). *Syntax: An introduction* (Vol. 1). Amsterdam/Philadelphia: John Benjamins Publishing Company.

Göksel, A., û Kerslake, C. (2005). *Turkish: A comprehensive grammar*. Routledge.

Gündoğdu, S. (2016a). Noun-verb complex predicates in Kurmanji: A syntactic account. In K. Bellamy, E. Karvovskaya, M. Kohlberger, û G. Saad (Eds.), *Proceedings of ConSOLE XXIII* (pp. 279–301). Leiden: Leiden University Center for Linguistics.

Gündoğdu, S. Y. (2018). *Argument-Adjunct Distinction in Kurmanji Kurdish* (Teza Doxtorayê). Stembol: Zanîngeha Boğaziçi.

Haiden, M. (2005). *Theta theory*. Berlin: Mouton de Gruyter.

Haig, G. (2002). Noun-plus-verb complex predicates in Kurmanji Kurdish: Argument sharing, argument incorporation, or what? *Sprachtypologie Und Universalienforschung, 55*(1), 15–48.

Haig, G. (2014a). VG word order in Kurdish and Neo-Aramaic: Typological and areal considerations. In G. Khan û L. Napiorkowska (Eds.), *Neo-Aramaic and its linguistic context* (pp. 407–425). New York: Gorgias Press.

Haig, G., û Thiele, H. (2014b). Post-predicate goals in Northern Kurdish and neighboring languages: A pilot study in quantitative areal linguistics. Paper presented at the 2nd Workshop on the Variation and Change in Kurdish (VCK-2), Zanîngeha Mardîn Artûklûyê, Mêrdîn, Turkiye.

Koenig, J. P., Mauner, G., û Bienvenue, B. (2003). Arguments for adjuncts. *Cognition, 89*(2), 67–103.

Kuiper, K., û Nokes, J. (2014). *Theories of syntax: Concepts and case studies*. Palgrave Macmillan.

Levin, B. (1993). *English verb classes and alternations: A preliminary investigation*. Chicago, IL: University of Chicago Press.

Levin, B. (1999). Objecthood: An event structure perspective. In S. Billings, J. Boyle, & A. Griffith (Eds.), *Proceedings of CLS 35, Vol. 1: The main session* (pp. 223–247). Chicago, IL: Chicago Linguistic Society.

Matthews, P. H. (1981). *Syntax*. Cambridge: Cambridge University Press.

Matthews, P. H. (2007). *The concise Oxford dictionary of linguistics* (2nd ed.). Oxford: Oxford University Press.

Metê, H. (2013). *Tofan* (çp3). Stembol: Weşanên Peywend.

Moravcsik, E. A. (1978). On the distribution of ergative and accusative patterns. *Lingua, 45*(3–4), 233–279. https://doi.org/10.1016/0024-3841(78)90026-8

Moravcsik, E. A. (1984). The place of direct objects among the noun phrase constituents of Hungarian. In F. Plank (Ed.), *Objects: Towards a Theory of Grammatical Relations* (pp. 55–86). Academic Press.

Nichols, J. (1984). Direct and oblique objects in Chechen-Ingush and Russian. In F. Plank (Ed.), *Objects: Towards a Theory of Grammatical Relations* (pp. 183–210). Academic Press.

Payne, T. E. (2006). *Exploring language structure: A student's guide*. Cambridge: Cambridge University Press.

Plank, F. (Ed.). (1984). *Objects: Towards a theory of grammatical relations*. London: Academic Press.

Rappaport Hovav, M., û Levin, B. (1997). Building verb meanings. In *The projection of arguments: Lexical and syntactic constraints* (pp. 97–134). CSLI Publications.

Sanders, G. (1984). Adverbials and objects. In F. Plank (Ed.), *Objects: Towards a Theory of Grammatical Relations* (pp. 221–242). Academic Press.

Sheyholislami, J. (2020). Zimanê Kurdî (M. Yonat, çev.). *Nûbihar Akademî, 4*(14), 83–106. https://doi.org/10.55253/nubihar.919979

Van Valin, R. D. (2004). *An introduction to syntax*. Cambridge: Cambridge University Press.

Yonat, M. (2022). Bikaranîna kirdeyê ne-kanonîk di berhemên Feqîyê Teyran de. In *Feqînasî: Mîrasa Feqiyê Teyran* (r. 249–267). Van: Peywend.

Yonat, M. (2023a). *Semantîks, Notên Dersê yên ne Çapkirî*. Zanîngeha Mardîn Artûklûyê.

Yonat, M. (2023b). Compositionality. In M. N. Doru & K. Gökdağ (Eds.), *Ekoller ve Kuramlar – Dil Bilimleri* (r. 15–24). Weşanên Zanîngeha Mardîn Artûklûyê.

Zariquiey, R. (2017). Objects, quasi-objects and oblique objects in Kakataibo (Panoan, Peru). *International Journal of American Linguistics, 83*(4), 719–741. https://doi.org/10.1086/693533

PÊVEK

PK: 1. Ferhengok

aktor	agent	**pêkanîn**	accomplishment
sûdmend	benefactive	**pêhisîner**	perceiver
bingeh	core	**pêkhatin**	achievement
bûn/veguherîn	become	**rewş**	state
çavkanî	source	**sedemî**	causative
hedef	goal	**stîmulus**	stimulus
hestyar	emoter	**tecrûbekar**	experiencer
înstruman	instrument	**tevger**	act
kuazî	quasi	**têgihîştîner**	cognizer
lokasyon	location	**têrker**	adjunct
mijar	topic	**xwedan**	possessor
muesîr	theme	**wergir**	recipient
muxatab	addressee		

ÖZGEÇMİŞ

KİŞİSEL BİLGİLER

Ad, Soyad: Dilan, Tayçur Güler

Uyruğu: T.C.

EĞİTİM BİLGİLERİ

Yüksek Lisans: Mardin Artuklu Üniversitesi, Kürt Dili ve Kültürü (2025)

Lisans: İstanbul 29 Mayıs Üniversitesi, Türk Dili ve Edebiyatı (2018)

YABANCI DİLİ

İngilizce, Almanca, Farsça

YAYINLAR

Hunt, P. (2023). Helbest ji bo Zarokan (D. Tayçur, çev.). *The Journal of Mesopotamian Studies, 8*(2), 239-257.

Hunt, P. (2025). Cîhana Lêkolînên Edebiyata Zarokan a ku Her Diçe Berfirehtir Dibe (D. Tayçur, çev.). *Artuklu Kurdology (18-Özel Sayı/Special Issue)*, 83-96.